

K.T.

Zanîngeha Mardîn Artukluyê

Enstîtûya Zimanên Zindî yên li Tirkiyeyê

Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî

Teza Lîsansa Bilind

MÎRSADU'L-ETFAL

(ŞAHRAHÊ KÛDEKAN)

FERHENGA MENZÛM A KURDÎ-FARISÎ

(Vekolîn-Tekst)

Ramazan Pertev

10711003

Şêwirmend

Prof. Dr. Kadri Yıldırım

Mêrdîn 2012

KT

Zanîngeha Mardîn Artukluyê

Enstîtûya Zimanên Zindî yên li Tirkîyeyê

Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî

Teza Lîsansa Bilind

MÎRSADU'L-ETFAL

(ŞAHRAHÊ KÛDEKAN)

FERHENGA MENZÛM A KURDÎ-FARISÎ

(Vekolîn-Tekst)

Ramazan Pertev

10711003

Şêwirmend

Prof. Dr. Kadri Yıldırım

Mêrdîn 2012

## JI BIRÊVEBERIYA ENSTÎTÛYA ZIMANÊN ZINDÎ YÊN LI TIRKIYEEYÊ RE

Ev xebat ji aliyê jûriya me ve di Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî de wekî teza lîsansa bilind hatiye pejirandin.

(îmza)

Serok : .....

(Unvanê Akademîk, Nav - Paşnav)

(îmza)

Endam : .....

(Unvanê Akademîk, Nav - Paşnav)

(îmza)

Endam : .....

(Unvanê Akademîk, Nav - Paşnav)

(îmza)

Endam : .....

(Unvanê Akademîk, Nav - Paşnav)

(îmza)

Endam : .....

(Unvanê Akademîk, Nav - Paşnav)

(îmze)

Pesendkirin

Ez pesend dikim ku înzayên jorîn ên endamên perwerdeyê yên navborî ne.

Îmza

.....

Unvanê Akademîk, Nav-Paşnav

Birêveberê Enstîtûyê

(Mor)

**KURTE**  
**MÎRSADU'L-ETFAL (ŞAHRAHÊ KÛDEKAN)**  
**FERHENG A MENZÛM A KURDÎ-FARISÎ**  
**Ramazan PERTEV**

Ferhengên menzûm cureyekî nezmê ne ku di edebiyata rojhilatê ya klasîk de gelek nimûneyên wê hene. Ev berhem bi piranî di pergala perwerdeyîyê ya medreseyan de ji bo ku zarokan hînî zimanên biyanî bikin dihatin amadekirin. Herçend piranî bi du zimanan bin jî awayên wan ên çend zimanî jî hene. Di edebiyata zimanên rojhilatî de, ev tradîsyoneke kevn û berbelav e. Yekem ji nimûneyên ferhengên menzûm ên duzimanî ku tê zanîn *Dustûru'l-Luğaya* Edib Natanazzi (m.1106) ye ku bi erebî-farisî ye û ji bo ku zimanê erebî hînî farisan bike hatiye amadekirin. Di nivê sedsala XII.de nivîskarê Îranî, Reşîduddîn Watwatî (m.1182) jî xebateke bi vî rengî amade kiriye. Di edebiyata Islamî de *Nisâbu's-Sibyân* a Ebû Nesr Ferâhanî (m.1221) yek ji girîngtirîn ferhengên menzûm ên erebî-farsî ye.

Li erdnîgariya Enetolyayê, yekem nimûneyên ferhengên menzûm, bi erebî-farsî bûn. Nimûneya pêşî ya ku tê zanîn *Zuhretu'l-Edeb* a Şükrullah e ku di sala 1242an de hatiye nivîsîn. Wek yekem nimûneya erebî-tirkî ya di vî warî de *Luğat-i Feriştioğlu* ya Abdullatif bîn Melek tê qebûlkirin. Wî ev berhema xwe di sala 1392an de nivîsandiye.

Di warê farsî-tirkî de yekem nimûneya vî cureyî di sala 1400an de bi navê *Tuhfe-i Husamî* ji aliyê Husam bîn Hesen ve hatiye nivîsîn. Di nav ferhengên menzûm ên farsî-tirkî de berhema ku herî tê naskirin *Tuhfe-i Vehbî* ya Sünbülzade Vehbî (m.1809-10) ye. Ev behrem di navbera salên 1798-1909an de 58 caran hatiye çapkirin. Ev yek jî girîngiya berhemên vî cureyî nîşanî me dide. Di nav ferhengên menzûm ên farsî-tirkî de yek ji berhemên ku pir tê naskirin *Tuhfe-i Şahidî* an jî *Luğat-i Şahidî* ye ku ji aliyê Şahîdî İbrahîm Dede (m.1550) ve hatiye nivîsin.

Li gor agahiyên li ber dest, di edebiyata kurdî ya klasîk de heta niha herî kêr çar ferhengên bi vî awayî hene. Ji sedsala XVII. vir de, di her sedsalê de ferhengeke menzûm a bi zimanê kurdî hatiye nivîsîn. Di edebiyata kurdî ya klasîk de tradîsyona ferhengnivîsiya menzûm ji aliyê Ehmedê Xanî, di sala 1683yan de bi *Nûbehara Biçûkan* dest pê kiriye. *Gulzar* ji aliyê İsmâîlê Bazîdî (1655-1710) hatiye nivîsîn ku bi kurdî-farisî-erebî ferhengeke sêzimanî ye. *Luxetnameyî Ehmedî* ya Şêx Marûfê Nodeyî ku kurdî(soranî)-erebî ye di sala 1790an de hatiye nivîsîn. Xeleka dawî ya vî tradîsyonê ferhenga menzûm *Mîrsadu'l-Etfal* e ku bi kurdî-farsî ye û ji aliyê Şêx Mihemed Kerbelayî ve di sala 1912an de hatiye nivîsîn.

Di vê xebatê de me di peywenda ferhengnivîsiya menzûm a kurdî de berhema Şêx Mihemed Kerbelayî ya *Mîrsadu'l-Etfalê* ji aliyên teşe û naverokê ve vekoland û piştê me teksta kurdo-erebîk latînîze kir.

Ev xebat ji destpêkek, sê beş û ferhengê pêk tê. Di destpêkê de bi awayekî giştî pênasên ferhengên menzûm, taybetiyên wan ên hevpar û giştî, di zimanên rojhilatî de tradîsyona ferhengnivîsiya menzûm û di edebiyata kurdî ya klasîk de kurtemêjûya ferhengnivîsiya menzûm hatine vekolîn.

Di beşa yekem de bi awayekî giştî agahiyên der bareyê jiyana Şêx Mihemed Kerbelayî, taybetiyên heyama wî û medreseya Aqtepeyê de hatine dayîn. Her wiha berhemên wî hatine danasîn. Di dawiya beşê de di ferhengnivîsiya menzûm a kurdî de cih û girîngiya Kerbelayî û *Mîrsadu'l-Etfalê* hatiye vekolîn.

Di beşa duyem de ji aliyên teşe, naverok û ziman ve, analîza *Mîrsadu'l-Etfalê* hatiye kirin. Ji aliyê teşeyê ve, menzûmbûna wê, li gorî beşan awayên wê yên nezmê, pergala behr, kêş, qafiyê û hin hunerên vegotinê hatine ravekirin. Ji aliyê naverokê ve, bi rêbazên pedagojîk mijarên ferhengê li ser binbeşên curbicur hatine dabeşkirin. Ji aliyê ziman ve jî, hin mijarên zimanî û rêzimanî hatine vekolîn.

Di beşa sêyem de pêşî, taybetiyên “nusxeya daner” hatine danasîn. Piştê li gor vê nusxeyê, metna kurdo-erebîk hatiye latînîzekirin. Ji bo ku xwendevan bi hêsanî bêjeyên kurdî û farsî ji hev derxin me bêjeyên kurdî **stûr**, bêjeyên farsî jî *italîk* nîşan dan. Ev awa di temamê mînakên nav teze de jî hat bikaranîn. Bêje û qertafên ku ne ji ferhengê bûn, me wekî xwe hîştin.

Di beşa encamê de piştî lêkolîn û lêgerînên me yên li ser berhemê, daneyên ku me tesbit kirin, nivîsandin.

Di dawiyê de me ferhengeke kurdî-farsî-tirkî ya sêzimanî amade kir. Bi vî awayî me xwest ku edebiyatzan û lêkolînêr bi hêsanî sûd jê wergerin. Di pêvekan de me hin belgeyên girîng ên bi mijarê ve eleqedar bi cih kirin.

## ÖZET

Manzum sözlük geleneği klasik doğu edebiyatında pek çok örneği olan bir nazım türüdür. Bunlar daha çok medrese eğitim sisteminde çocuklara yabancı dil öğretmek amacıyla hazırlanmış eserlerdir. Manzum sözlüklerin iki dilli olan şekilleri yaygın olmakla beraber, daha çok dilli olanlarına da rastlamak mümkündür. Bu tür sözlükler, klasik Doğu edebiyatında eski ve yaygın bir geleneğe sahiptirler. İki dilli manzum sözlüklerin ilk örneklerinden biri Edib Natanazzi (ö.1106) nin Arapça-Farsça olarak yazdığı *Dusturu'l-Luğa* olup, Farslara Arapça öğretmek amacıyla hazırlanmıştır. XII. yüzyılın ortalarında İranlı Reşiduddin Vatvat (ö.1182) ile başlayan bu geleneğin İslâmî edebiyattaki ilk örneklerinden biri XIII. yüzyılda Ebû Nasr Ferâhanî (ö.1221) tarafından yazılmış *Nisâbu's-Sıbyân* isimli Arapça-Farsça sözlüğüdür.

Anadolu coğrafyasında Arapça-Farsça olarak 1242 senesinde Şükrullah'ın *Zühretü'l-Edebi* ile başlayan bu geleneğin Arapça-Türkçe ilk örneği, Abdullatif bin Melek'in 1392'de hazırladığı *Lügat-i Ferišteoğlu* olarak kabul edilmektedir.

Bu türün Farsça-Türkçe ilk örneği 1400 senesinde *Tuhfe-i Husam* adıyla Husam b. Hasan tarafından yazılmış ve bu gelenek çok güçlü bir şekilde devam etmiştir. Sünbülzade Vehbi (ö.1809-1810) tarafından 1798'de Farsça-Türkçe olarak kaleme alınan *Tuhfe-i Vehbi* adlı manzum eserin 1909 senesine kadar 58 kez basılmış olması, bu geleneğin ne denli yaygın olduğunu göstermektedir. Bu tür sözlükler arasında en meşhur olanı ise, Mevlevî şeyhlerinden Şâhidî mahlasıyla tanınan Muğlalı İbrahim Dede'nin *Tuhfe-i Şâhidî*'sidir.

Elimizdeki mevcut bilgilere göre klasik Kürt edebiyatında şimdiye kadar en az dört adet manzum sözlük çalışması yapılmıştır. XVII. yüzyıldan itibaren her yüz yılda bir Kürtçe manzum sözlük hazırlanmış olduğunu görmekteyiz. Ehmedê Xanî'nin 1683 senesinde Kürtçe-Arapça olarak hazırlanmış olduğu *Nûbehara Biçûkan* ile başlayan bu gelenek, yine öğrencisi olan İsmailê Beyazidî tarafından üç-dilli (Kürtçe-Arapça-Farsça) sözlük olan *Gulzar* ile devam etmiş, bunu 1790'da Şeyh Maruf Nodeyî tarafından Kürtçe'nin Aşağı Kurmancî (Soranî) lehçesiyle yazılmış Kürtçe-Arapça *Lugatname-i Ehmedî* ile takip etmiş ve son olarak 1912 senesinde Şeyh Muhammed Kerbelayî'nin Kürtçe-Farsça hazırlanmış olduğu *Mîrsadu'l-Etfal* ile son bulmuştur. Başka bir deyişle *Mîrsadu'l-Etfal* klasik Kürt edebiyatında bu geleneğin son halkasıdır.

Bu çalışmamızda Kürt manzum sözlükçülüğü bağlamında Şeyh Muhammed Kerbelayî'nin *Mîrsadu'l-Etfal* adlı eserini, şekil ve muhteva açısından ele alarak Kürdo-Arabik olan metnini latinize ettik. Bu çalışma giriş, üç bölüm ve Kürtçe-Farsça-Türkçe olarak

hazırlanmış bir sözlükten oluşmaktadır. Giriş kısmında genel olarak manzum sözlükyazıcılığıyla ilgili tanımlamalar, bu sözlüklerin genel ve ortak özellikleri, klasik doğu edebiyatında manzum sözlük yazma geleneği ve son olarak klasik Kürt edebiyatında, manzum sözlükyazıcılığının tarihçesi ele alındı.

Birinci bölümde Şeyh Muhammed Kerbelayî'nin hayatı, döneminin özellikleri, ailesi ve Aktepe Medresesi hakkında bilgiler bulunmaktadır. Son olarak mevcut eserleri hakkında ayrıntılı bilgiler verilerek Kerbelayî ve *Mîrsadu'l-Etfal*'in Kürt edebiyatında manzum sözlükyazıcılığı geleneği içerisindeki yeri ve önemi incelendi.

İkinci bölümde şekil, muhteva ve dil açısından *Mîrsadu'l-Etfal*'in ayrıntılı bir incelemesi yapılmıştır. Şekil incelemesinde, eserin bölümlere göre nazım tarzı, kıta, bahir ve kafiye sistemi tanıtılmış, eserde tespit edilen kimi söz sanatları üzerinde durulmuştur. Muhteva açısından yapılan incelemede, sözcüklerin sıralanışındaki metodoloji anlatılmış, sözlükteki konulardan birbirleriyle bağlantılı olanlar, ilgili başlıklar altında sınıflandırılarak pedagojik yöntemlerle ele alınmıştır. Bu bölümde, son olarak Kürtçe'nin dilbilgisel özellikleri açısından incelenmiştir.

Üçüncü bölümde, öncelikle “müellif nüshasının” özellikleri ele alınmıştır. Kürdo-Arabik nüsha genel kabul gören transkripsiyon kurallarına uygun olarak, Latin harflerine çevrilmiştir. Okuyucuların kolay ayırt edebilmesi için Kürtçe sözcükler **kalın**, Farsça sözcükler de *italik* karakterlerle belirtilmiştir. Sözlük kısmından olmayan diğer kelime, ek vs. de normal düzyazı karakterleriyle gösterilmiştir.

Sonuç bölümünde, eser üzerinde yaptığımız araştırma ve incelemeler sonucunda ulaştığımız bulguları maddeler halinde verdik.

Çalışmamızın sonuna Kürtçe-Farsça-Türkçe bir sözlük ekledik. Bundaki amaç araştırmacı ve okuyucuların çalışmalarında bu sözlükten istifadelerini azamî derecede kolaylaştırmaktır. Ekler bölümüne konuyla ilgili önemli belgeleri ilave ettik.

## SUMMARY

The dictionaries written in verse are a kind of verse whose examples are full in classic eastern literature. These are mainly prepared for teaching foreign languages in madrasah educational system. Although the bilingual versions are common, the multilingual ones are more available. Such dictionaries have an old, common tradition in classic eastern literature. The first example of the bilingual dictionaries in verse is *Düstûru'l-Lüga* in written Arabic-Persian by Edib Natanazzi (d.1106). It was prepared for teaching Arabic for Persians. The first example of this tradition in Islamic literature starting with Persian Reşiduddin Vatvat (d.1182) in the middle of XII. century is the Arabic-Persian dictionary called *Nisâbu's-Sibyân*, of Ebû Nasr Ferâhanî (d. 1221).

The first example of this tradition in Anatolian geography starting with Şukrullah's *Zühretü'l-Edebi* as Arabic-Turkish in 1242 is taken as *Lügat-i Ferişteoğlu*, which Abdullatif bin Melek prepared in 1392.

The first example of Persian-Turkish of this kind was Husam b. Hasan's *Tuhfe-i Husam* which was written in 1400 and this tradition continued strongly. The fact that *Tuhfe-i Vehbi* written in Persian-Turkish in verse by Sünbülzade Vehbi (d.1809-1810) in 1798 had been printed 58 times until 1909 indicate how common this tradition is. Among this kind of dictionaries, the famous one is *Tuhfe-i Şâhidî* which was written by Ibrahim Dede of Muğla, as known Şâhidî., from Mevlevi Shaiks.

According the available information, there are at least four dictionaries in verse in classic Kurdish literature up to now. We witnessed that Kurdish dictionaries in verse have been prepared since XVII.century. This tradition starting with *Nûbehara Biçûkan*, which was prepared by Ehmedê Xanî as Kurdish-Arabic in 1683 was continued by his student, İsmailê Beyazidî who prepared the three-lingual Kurdish-Arabic-Persian and later this tradition was spread more by Shaik Maruf Nodeyi, who prepared *Lugatname-i Ehmedî*, the Kurdish-Arabic dictionary in verse in the lower Kurmanci dialect (Sorani) in 1790 and finally this tradition end with *Mîrsadu'l-Etfal* which was prepared by Sheikh Muhammed Kerbelayî in Kurdish-Persian in 1912. In other words, *Mîrsadu'l-Etfal* is the last example of this tradition in classic Kurdish literature.

In this study, we deal with Sheikh Muhammed Kerbelayî's *Mîrsadu'l-Etfal* in the context Kurdish lexicography in verse in terms of form and content and latinize it. This study consists of introduction, three chapters and index. In the introduction, we deal with the definitions regarding lexicography in verse in general, theirs general and common features,



the tradition of lexicography in verse in classic Kurdish eastern literature and finally the history of lexicography in verse in classic Kurdish literature and explore Kerbelayî and the place and importance of his *Mîrsadu'l-Etfal*' in this tradition. The first chapter contains information about the life of Sheikh Muhammad Kerbelayî and his family and Aktepe Madrasah. It also contains the detail information about the general features of his period when he lived and his works.

The second chapter includes the analysis *Mîrsadu'l-Etfal* of in detail in terms of form, content and language. In exploring of form, we treat verse type, stanza and rhyme and so on, according to the chapters, and dwell on certain figure of speeches. In exploring of content, the methodological syntax is explained and the subjects in the dictionary are classified in relation of each other. In this chapter finally the words and expression in the dictionary are examined in terms of grammatical features of Kurdish.

In the third chapter, the features of the “author’s copy” is first explained. Kurdish-Arabic copy is latinized in accordance with general accepted transcription rules. Kurdish words are written in bold type-font; Persian ones in italic ones so that the readers can read them easily. The other words, addition and so on which don’t take place in the chapter of the dictionary are shown in normal type-fonts.

In the final chapter, the fact that in the result of studying and researching, we have found the findings are given in order.

We added a trilingual dictionary in written Kurdish-Persian-Turkish at the end of our study. The aim is to help the readers and researchers benefit from these dictionaries in their studies maximally. At the appendix there are important documents in relation to the subject.

## NAVEROK

KURTE .....	III
ÖZET.....	IV
SUMMARY.....	VI
NAVEROK.....	VIII
PÊŞGOTIN.....	XII
KURTEBÊJE.....	XV

## DESTPÊK

1.Ferhengên Menzûm.....	1
1. 1. Sedemên Nivîsandina wan.....	1
1. 2. Taybetiyên Ferhengên Menzûm.....	4
1. 3. Tradîsyona Ferhengnivîsiya Menzûm di Zimanên Rojhilatî de.....	6
1. 4. Kurtemêjûya Ferhengnivîsiya Menzûm di Zimanê Kurdî de.....	7
1. 4. 1. Nûbehara Biçûkan.....	8
1. 4. 2. Gulzar.....	9
1. 4. 3. Luxetnameyî Ehmedî.....	10
1. 4. 4. Mîrsadu'l-Etfal (Şahrahê Kûdekan).....	11

## BEŞA YEKEM

### ŞÊX MIHEMED KERBELAYÎ Û BERHEMÊN WÎ

1. Agahiyên Şexsî û Malbatî .....	12
1. 1. Di Serdema wî de Rewşa Siyasî û Edebî .....	12
1. 2. Di Jiyana Civakî, Dînî û Perwerdeyê ya wê Demê de Rola Malbata Aqtepeyê....	14
1. 3. Nav û Mexlesên wî.....	16
1. 4. Jidayîkbûn û Wefata wî.....	17
1. 5. Jiyana wî ya Perwerdeyê û Dersdariya wî ya li Medreseya Aqtepeyê.....	17
1. 6. Mişextî û Vegera wî.....	18
1. 7. Ji Aliyê Hizrî ve Kerbelayî.....	19
1. 8. Rewşa wî ya Medenî.....	21
1. 9. Aliyê wî yê Edebî.....	21
2. Berhemên wî.....	22
2. 1. Dîwan.....	22

2. 2. Mîrsadu'l-Etfal (Şahrahê Kûdekan).....	24
2. 3. Di Ferhengnivîsiya Menzûm de Kerbelayî û Cihê Mîrsadu'l-Etfalê.....	28

## BEŞA DUYEM

### VEKOLÎNA MÎRSADU'L-ETFALÊ JI ALIYÊ TEŞE, NAVEROK Û ZIMAN VE

<b>1. JI ALIYÊ TEŞEYÊ VE.....</b>	<b>35</b>
1. 1. Awayên Nezmê .....	35
1. 1. 1. Mesnewî.....	35
1. 1. 2. Xezel.....	35
1. 2. Pergala Kêş, Qafiye û Redîfê.....	37
1. 2. 1. Pergala Kêşê.....	37
1. 2. 2. Pergala Qafiye û Redîfê.....	38
1. 2. 3. Di Mîrsadu'l-Etfalê de Cînas.....	40
1. 3. Li Gorî Beşan Hejmara Malik û Bêjeyan.....	43
1. 4. Di Serê Her Beşê de Destpêkirina bi Wecîzeyekê.....	44
<b>2. JI ALIYÊ NAVEROKÊ VE.....</b>	<b>46</b>
2. 1. Rêbaza Pedagojîk.....	46
2. 1. 1. Ji Giştî ber bi Taybet.....	46
2. 1. 2. Têkiliya Parçe û Bitûnê.....	47
2. 1. 3. Rêbaza Bibîrxistinê.....	47
2. 1. 4. Rêbaza Mûsikî/Rîtmîk.....	49
2. 2. Mijarên Sereke yên di Ferhengê de.....	51
2. 2. 1. Endamên Malbatê, Mirovên Nêzîk û Têgînên Civakî.....	51
2. 2. 2. Endamên Laşê Mirovan.....	51
2. 2. 3. Fîzyonomî.....	51
2. 2. 4. Xûy, Rewş, Pîşe û Taybetiyên Mirovan.....	51
2. 2. 5. Kozmolojî: Astronomî (Esmannasî)/Astrolojî (Stêrnasî).....	52
2. 2. 5. 1. Felek (Esman).....	52
2. 2. 5. 2. Stêr.....	53
2. 2. 5. 3. Gerstêrk (Seyare).....	54
2. 2. 5. 4. Birc (Çerx).....	54
2. 2. 6. Ayet û Sûre.....	55
2. 2. 7. Cih û Kesayetên Mêjûyî.....	55
2. 2. 8. Cih û Erdnîgarî.....	57

2. 2. 9. Bergeh û Alî.....	57
2. 2. 10. Flora.....	57
2. 2. 11. Faûna.....	58
2. 2. 12. Keş û Hewa.....	59
2. 2. 13. Dem.....	59
2. 2. 14. Çek û Aletên Kevnare.....	59
2. 2. 15. Kelûpel.....	59
2. 2. 16. Madenên Bingehîn.....	60
2. 2. 17. Zînet û Cilûberg.....	60
2. 2. 18. Zayend.....	60
2. 2. 19. Têgînên Leşkerî.....	60
2. 2. 20. Reng.....	61
2. 2. 21. Têgînên Mêjer û Pîvanê.....	61
2. 2. 22. Bêjeyên din.....	61
<b>3. JI ALIYÊ ZIMAN VE.....</b>	<b>62</b>
3. 1. Bêjeyên Hemwate.....	62
3. 2. Bêjeyên Dijwate.....	63
3. 3. Bêjeyên Hevdeng û Nêzdeng.....	64
3. 4. Têgînnasî (Termînolojî).....	65
3. 5. Bêjeyên Farisî yên ku bi Raveya wan ên Kurdî Hatine Dayîn.....	66
3. 6. Lêkerên Bingehî.....	67
3. 7. Rader.....	68
3. 7. 1. Raderên Xwerû.....	68
3. 7. 2. Raderên Nexwerû.....	70
3. 7. 2. 1. Raderên Darijtî.....	70
3. 7. 2. 2. Raderên Hevedudanî.....	71
3. 8. Bêje, Qertaf û Vegotinên ku Hatine Bikaranîn.....	72

## BEŞA SÊYEM

### TRANSKRÎPSIYONA MÎRSADU'L-ETFALÊ

1. 1. Taybetiyên Nusxeya Daner a Mîrsadu'l-Etfalê.....	73
1. 2. Sazkirina Metna Mîrsadu'l-Etfalê.....	74
1. 3. Metna Mîrsadu'l-Etfalê.....	76

<b>ENCAM</b> .....	115
<b>ÇAVKANÎ</b> .....	118
<b>PÊVEK</b>	
1. FERHENGGA KURDÎ-FARISÎ-TIRKÎ.....	124
2. ÇEND NIMÛNE JI NUSXEYA DANER.....	149

## PÊŞGOTIN

Ferhenga menzûm ew berheme e ku; bêjeyên zimanekî, digel bêjeyên hemwateyên xwe yê zimanekî din, bi awayekî helbestkî tên dariştin. Helbest çawa ku di edebiyatê de awayekî girîng e, her wiha ji eqaîdê heta rêzimanê di gelek warên zanistê de jî, ji bo perwerdekirinê hatiye bikaranîn.

Ferhengên menzûm bi piranî wek pirtûkên dersê hatine xwendin. Amadekirina wan wek karekî hunerî dihat dîtin. Ew ji aliyê qewareyê ve biçûk, ji aliyê bikaranînê ve pratîk û ji aliyê ezberkirinê ve hêsan in.

Di zimanên rojhilatî de tradîsyona ferhengnivîsiya menzûm gelek kevn û berbelav e. Lewra di pergala perwerdeyê ya medreseyan de ji bo zarokên ku nû dest bi xwendinê kirine telqin û ezber wek rêbazên sereke yê hîndekariyê ne. Bi taybetî ji bo hînkirina zimanê erebî ku zimanê Qur'anê ye, ev rêbaz gelek girîng in.

Ferhengên menzûm ên pêşî bi erebî bûn. Piştê ji ber ku farsî jî wek zimanê edebiyatê di medreseyan de hate hînkirin, bi vî zimanî jî berhemên bi vî cureyî hatin nivîsîn. Yekem ji nimûneyên ferhengên menzûm ên duzimanî ku tê zanîn *Dustûru'l-Luğaya* Edib Natanazzi (m.1106) ye ku bi erebî-farsî hatiye amadekirin. Her wiha di nîva sedsala XII.de nivîskarê Îranî, Reşîduddîn Watwatî (m.1182) jî xebateke bi vî rengî amade kiriye. Di edebiyata Îslamî de *Nisâbu's-Sibyân* a Ebû Nesr Ferâhanî (m.1221) yek ji girîngtirîn ferhengên menzûm ên erebî-farsî ye. Vê berhemê li ser berhemên heman cure tesîreke mezin kiriye. Li erdnîgariya Anatoliyê, yekem nimûneyên ferhengên menzûm bi erebî-farsî bûn. Nimûneya pêşî ya ku tê zanîn *Zuhretu'l-Edeb* a Şükrüllah e ku di sala 1242an de hatiye nivîsîn. *Lugat-i Feriştioğlu* ya Abdullatif bîn Melek wek yekem nimûneya erebî-tirkî ya di vî warî de tê qebûlkirin. Wî ev berhema xwe di sala 1392an de nivîsandiye.

Di warê farsî-tirkî de yekem nimûneya vî cureyî di sala 1400an de bi navê *Tuhfe-i Husamî* ji aliyê Husam bîn Hesên ve hatiye nivîsîn. Di nav ferhengên menzûm ên farsî-tirkî de berhema ku herî tê naskirin *Tuhfe-i Vehbî* ya Sünbülzade Vehbî (m.1809-10) ye. Ev berhem di navbera salên 1798-1909an de 58 caran hatiye çapkirin. Ev yek jî girîngiya berhemên wiha nîşanî me dide.

Di edebiyata kurdî ya klasîk de tradîsyona ferhengnivîsiya menzûm ji aliyê Ehmedê Xanî, di sala 1683yan de bi *Nûbehara Biçûkan* dest pê kiriye. *Gulzar* ji aliyê Îsmâîlê Bazîdî (1655-1710) ve hatiye nivîsîn ku ferhengeke sêzimanî ye. *Luxetnameyî Ehmedî* ya Şêx

Marûfê Nodeyî di sala 1790an de hatiye nivîsîn. Her wiha vê tradîsyonê piştre jî dewam kiriye.

Ev xebata me li ser ferhenga menzûm *Mîrsadu'l-Etfal* e ku bi kurdî-farsî ye û ji aliyê Şêx Mihemed Kerbelayî ve di sala 1912an de hatiye nivîsîn. Di ferhengnivîsiya menzûm a kurdî de, ev berhem a dawîn e. Xebata me, ji destpêkek, sê beş û ferhengekê pêk tê. Di destpêkê de bi awayekî giştî agahiyên der bareyê ferhengên menzûm, taybetiyên wan ên ji aliyên teşe, tertîb û naverokê, hatine dayîn. Her wiha di zimanên rojhilatî de tradîsyona ferhengnivîsiya menzûm, di edebiyata kurdî ya klasîk de kurtemêjûya ferhengnivîsiya menzûm hatine vekolîn.

Di beşa yekem de bi awayekî giştî agahiyên der bareyê jiyana Şêx Mihemed Kerbelayî, taybetiyên heyama wî û medreseya Aqtepeyê de hatine dayîn. Berhemên wî yên li ber dest, hatine danasîn. Di dawiya beşê de di ferhengnivîsiya menzûm a kurdî de cihê Kerbelayî û *Mîrsadu'l-Etfalê* hatiye vekolîn.

Di beşa duyem de ji aliyên teşe, naverok û ziman ve, analîza *Mîrsadu'l-Etfalê* hatiye kirin. Ji aliyê teşeyê ve, menzûmbûna wê, li gorî beşan awayên wê yên nezmê, pergala behr, kêş, qafiye û hin hunerên vegotinê hatine ravekirin. Ji aliyê naverokê ve, bi rêbazên pedagojîk mijarên ferhengê li ser binbeşên curbicur hatine dabeşkirin. Ji aliyê ziman ve jî, hin mijarên zimanî û rêzimanî hatine vekolîn.

Di beşa sêyem de pêşî, taybetiyên nusxeya daner hatine danasîn, piştre li gor vê nusxeyê, metna kurdo-erebîk hatiye latînîzekirin. Ji bo ku xwendevan bi hêsanî bêjeyên kurdî û farsî ji hev derxin me bêjeyên kurdî **stûr**, bêjeyên farsî jî *italîk* nîşan dan. Ev awa di temamê mînakên nav teze de jî hat bikaranîn. Bêje û qertafên ku ne ji ferhengê bûn, me wekî xwe hîştin.

Di dawiyê de me ferhengeke kurdî-farsî-tirkî amade kir. Di ferhengê de bêjeyên farsî bi her du tîpan, yanî bi tîpên latînî û erebî hatine nivîsîn. Li beramberî her bêjeyekê, numareya malika wê jî hat nivîsîn. Bi vî awayî me xwest ku lêkolînêr bi hêsanî sûd jê wergirin. Di beşa pêvekan de me çend rûpel ji nusxeya daner wek mînak dan.

Armanca me ya sereke ev e ku, ev berhema giranbiha bêtir bê nasîn û ji bo edebiyatzan û lêkolîneran bibe çavkaniyek. Bi baweriya me *Mîrsadu'l-Etfal* di nav kurdan de zêde nehatiye naskirin û hêjayiya wê baş derneketiye holê. Kerbelayî piştî vegera xwe ya ji mişextiyê, diwazdeh salên xwe yên dawîn di nav jiyaneke minzewî de derbas kirine. Mixabin digel ku di odeya xwe de timî dixwend û dinivîsand jî, ji wê demê, tu berhemeke wî nemaye. Bi vê xebatê, me xwest ku em hem wî, hem berhemên wî bidin nasîn û ji nû ve wan derxin ber ronahiya rojê.

Di dawiyê de ez dixwazim sipasiyên xwe ji şewirmendê teza min, mamoste Prof. Dr. Kadrî Yildirim re pêşkeş bikim. Min ji xebata wî ya li ser *Nûbehara Biçûkan* gelek sûd wergirt. Her wiha di nav ewçend mijûlayî û karûbarên xwe yê giran de her du mamosteyên hêja, Dr. Abdurrahman Adak û Dr. Hayrullah Acar di amadekirina tezê de gelek arikariya min kirin. Endamê juriya tezê Dr. Tahirhan Aydın jî bi xwendina tezê gelek pêşniyazên girîng kirin. Bi rastî ne ji rêbertiya wan bûya, belkî ev xebat ew ê serkeftî nebûya. Helbet divê ez Şêx Şafî (Şafî Işık) jî bi bîr bînim ku wî geh rûbirû, geh jî bi telefonê, çendîn car, hem der bareyê malbata Aqtepiyan de agahiyên girîng dan, hem jî nusxeya destxetê ya Kerbelayî bixwe da min ku demekê ez li ser bixebitim.

Eger ev xebat di warê kurdnasiyê de ji bo lêkolîner, edebiyatzan û xwendevanan bi kêr bê, ez dê gelek şad û bextewar bibim.

Ramazan PERTEV

Mêrdîn-2012



## KURTEBÊJE

- a : rûyê “a”yê ya pelê (wereq) destxetê  
amd. : amadekar  
b : rûyê “b”yê ya pelê (wereq) destxetê  
b.n. : berhema navborî  
bnr. : binêrin  
brn. : berawirdkirin  
BQ : Burhanê Qat‘î  
c. : cild  
ç. : çap  
g. : gotar  
g.n. : gotara navborî  
h.b. : heman berhem  
h.g. : heman gotar  
h.r. : heman rûpel  
j. : jimare  
k. : koçî  
m. : mirina wî/wê  
n.r. : navbera rûpelan  
r. : rûpel  
ŞŞ. : Şêx Şafî  
wd. : wekî din  
wer. : werger  
vgz. : veguhêzer  
z. : zayînî

## DESTPÊK

### 1. Ferhengên Menzûm

Herwekî tê zanîn gelek berhemên edebiyata nivîskî di bin karîgeriya dîne Îslamê û zimanê erebî, çanda Îranê û zimanê farisî de hatine nivîsîn. Ev wek edebiyata klasîk tê binavkirin. Di edebiyata klasîk de li gorî mijaran wek mesnewî, siyer, mewlûd, meqtel gelek cureyên nezmê hene. Ferhengên menzûm jî cureyek ji edebiyata klasîk in.<sup>1</sup> Lewra ji aliyê kêş û teşeyê ve girêdayî rêbaza edebiyata klasîk in. Her wiha ji ber ku bi piranî ji bo zarokan tîn nivîsîn<sup>2</sup>, ji aliyê armanc û naverokê jî di nav edebiyata zarokan de tîn hesabandin.<sup>3</sup> Yanî du aliyên ferhengên menzûm hene.

Di dirêjahiya mêjûyê de mirovan her dem hewl dane ku zimanên biyanî hîn bibin. Lewra zanebûna zimanekî biyanî ji gelek aliyan ve, destkevtineke girîng bû. Lewma gelek pispor û zana, ji bo ku hînkirina zimanekî biyanî hêsantir bikin, li gelek rê û rêbazan geriyane. Ferhenga menzûm ew e ku; bêjeyên zimanekî, digel bêjeyên hemwateyên xwe yê bi zimanekî din re bi awayekî helbestkî tîn dariştin.<sup>4</sup> Di warê edebiyatê de helbest çawa ku awayekî girîng ê edebî ye, her wiha ji bo perwerde û hîndekariyê jî, ji eqadê heta rêzimanê di gelek warên zanistê de awayên helbestê hatine bikaranîn. Ferhengên menzûm wek pirtûkên dersê hatine xwendin. Amadekirina wan wek karekî hunerî dihat dîtin û ew wek berhemên “qewareya wan biçûk, mifaya wan zêde û ezbera wan hêsan” hatine binavkirin.<sup>5</sup>

#### 1. 1. Sedemên Nivîsandina wan

Dema ku em li naveroka ferhengên menzûm ên curbicur dinêrin, em dibînin ku bi piranî ji bo heman sedeman hatine amadekirin. Ji ber vê yekê hem ji aliyê naverokê, hem ji aliyê teşeyên xwe ve, gelek dişibin hevudû. Bêguman sedema bingehîn a amadekirina ferhengên menzûm ji bo hêskirina ezberê ye. Sedemên din jî, serbestiya di rêzkirina bêjeyan de<sup>6</sup> û îtîbara di vî warê de ne.

**Hêskirina ezberê:** Ezber ew e ku, mirov bi riya dubarekirinê, tiştêkî di hişê xwe de bi cih dixe<sup>7</sup>. Her wekî tê zanîn di perwerde û hîndekariya medreseyan de ezberkirina metnên

<sup>1</sup> Agah Sırrı Levend, *Divan Edebiyatı*, Enderun Kitabevi, İstanbul, 1984, r. 636.

<sup>2</sup> Tehsîn İbrahim Doskî, “Hevpeyvîna Kovara Nûbiharê”, amd. Ayhan Gewerî, j.107, 2009, r. 69.

<sup>3</sup> Bnr. Atabey Kılıç, “Türkçe-Farsça Manzum Sözlüklerden Tuhfe-i Vehbi”, *Türkoloji Araştırmaları*, c. 2, 2007, r. 3. ; Kadri Yıldırım, *Nûbehara Biçûkan*, Weşanên Avesta, Stenbol, 2008, r. 42.

<sup>4</sup> *Türk Dili Edebiyatı Ansiklopedisi*, Dergah Yayınları, İstanbul, 1986, c. 6., r. 144.

<sup>5</sup> Ahmet Kartal, *Tuhfe-i Remzi*, Akçağ Yayınları, Ankara 2003, r. 13.

<sup>6</sup> Kadri Yıldırım, *Nûbehara Biçûkan*, Weşanên Avesta, Stenbol, 2008, r. 116.

<sup>7</sup> Paul Foulqie, *Pedagoji Sözlüğü*, Sosyal Yayınları, İstanbul, 1994, r. 71.

dersan gelek girîng e. Yanî şêweya medreseyan bi giranî li ser telqîn û ezberê ye.<sup>8</sup> Lewma ji heyama klasîk vir ve rêbazên ji bo hêsankirina ezberê hatine ceribandin û diyar kir ku ji bo vê yekê li gorî yên pexşan, metnên menzûm gelek hêsan in. Niha jî diyar e ku di hînbûna zimanekî biyanî de ezberkirina bêjeyên wî zimanî gelekî girîng e. Îro, nemaze di xwendina seretayî de ji bo fêrbûna zimanekî biyanî, temrînên ji bo ezberkirina stran û helbestan gelek tîn bikaranîn. Îro jî hinek zana vê rebazê dipejirînin. Di vî warî de gelek lêkolîn û xebat hene. Xebatên B.F. Skinner (m.1990) ku ji ekola psîkolojiya tevgerîtî (psycological behavyarist) ye, gelek ronîker in. Li gorî derûnnasê navdar Skinner di hînbûna zimanên biyanî de awayên ezber û teqlîdê gelek girîng û mifadar in.<sup>9</sup> Îro jî tê qebûlkirin ku dubarekirina awayê rîtmîk di hînkirinê de yek ji rêbazên esasî ye. Ji ber vê yekê çî erebî, çî tirkî, çî farisî û çî jî kurdî bin, em dikarin bêjin ku di temamê edebiyatên rojhilatê ên klasîk de ferhengên bi vî awayî hatine amadekirin. Em dibînin ku hin nivîskarên klasîk, bi armaneke dîdaktîk ferhengên menzûm amade kirine. Jixwe wekî Ehmedê Xanî û Mihemed Kerbelayî gelek ji wan di heman demê de xwediyê dîwanên edebî ne jî.

**Serbestiya di rêzkirina bêjeyan de:** Hêmanên qafiyê û redîfê yên ku li ser zemîna nezmê pêk tînin, ji bo ferhengên menzûm gelek girîng in. Lewma ji bo nivîskaran, awayê nivîsandina bi helbestkî ew ji rêzkirineke yeknesakî rizgar dikirin û serbestiyeke fireh dida destê wan. Mînak *Nûbehara Biçûkan* a Ehmedê Xanî û *Luxetnameyî Ehmedî* ya Şêx Marûf Nodeyî ji bo vê yekê berbiçav in. Herçend *Nûbehara Biçûkan* ji aliyê rêzkirina bêjeyên xwe, wekî ferhengeke erebî-kurdî bi navûdeng bûbe jî, em di gelek malikên wê de dibînin ku rêzkirina bêjeyên wê yên bi awayê kurdî-erebî jî ne kêr in<sup>10</sup>. Heman tiştî em di xebata Kerbelayî de jî dibînin. Wî jî wekî Xanî di xîtab û pirsan de bi temamî îbareyên kurdî yên wekî “çî, çî ye, çî ne, ..e, ..ye, ..ne, ..in, bizan, binas, her du, hersê, heme, ew jî ew û wd.” bi kar anîne. Di *Mîrsadu’l-Ûfalê* de risteyên malikan geh bi bêjeyên farisî, geh jî bi yên kurdî dest pê dikin. Di malikên 6, 7, 8 û 9an ên beşa yekem de ku lebatên laşê mirovan û têkiliyên mirovatîyê bi hev re dide hînkirin, bêjeyên farisî û kurdî wiha hatine rêzkirin:

1/6 *Kenar e kêlek, û leb lêv, û bînî poz, û çeşm e çav,*

31 *Zeban ezman, diran dindan, û sermil dûş, heval yaver,*

1/7 *Geda dervîş feqîr e, pay e dewletmend, û ling pa,*

<sup>8</sup> Kadri Yıldırım, *Mem û Zîn: Çeviri ve Kavramsal Tahlil*, Weşanên Avesta, İstanbul, 2010, r. 22.

<sup>9</sup> Mehmet Hengirmen, *Türkçe Dilbilgisi*, Engin Yayınevi, İstanbul, 2007, r. 24.

<sup>10</sup> Yıldırım, *Nûbehara Biçûkan*, r. 116.

32 **Biçûk** e *kih*, **mezin** *mih*, hem *sehî mewzûn* e, **da** *mader*,

1/8 **Refîq** e *hemreh*, û *dana* û *danişmend* e ‘**aqilmend**,

33 **Peder bav**, û *birader* çî? **bira**, û **xuşk** e hem *xaher*,

1/9 *Rox* û *sîma* û *çehre* **rû**, **gulî** *gîsû*, **birû** *ebrû*,

34 *Zen* û *hemser* çî ye? **Jin**, hem *dibên* **mêrê jinê** *şovher*,

Her wekî xuya ye, Kerbelayî geh bi bêjeya kurdî, geh bi ya farisî dest pê kiriye, wate bêjeyan bi awayekî serbest rêz kirine.

Kerbelayî di cihnan de jî pêşî du bêjeyên cuda yên kurdî an farisî nivîsandine û dûre hemwateyên wan ên bi zimanê din dane.

Mînak:

14/37 **Xerac** û **sukût** e bizan *sav* û *baj*,

264 **Xew** e *sat*, û **bêhûde** *gotin* çî? *Jaj*,

Çawa ku tê dîtin, di risteya pêşiyê ya vê malikê de, du bêjeyên kurdî *xerac* û *sukût* dane û dûre hemwateyên wan ên farisî *sav* û *baj* rêz kirine.

Mînakek jî ev e:

1/11 *Moje mojan* **bijank** in, *neğz* e **nazik**, *leğz* e **şemţandin**,

36 **Mehebbet** *mih*r, û **heb** *dane*, *sifîd* û *zerd* e **sipî** yû **zer**,

Di risteya dawiyê ya vê malikê de, pêşî bêjeyên farisî *sifîd* û *zerd* nivîsandine û piştê jî hemwateyên wan ên kurdî *sipî* û *zêr* rêz kirine.

**Giramî û nîşandana hostetiyê:** Sedemeke din a nivîsandina ferhengên menzûm, giramî û nîşandina hostetiyê ye. Wate, ji bo amadekirina xebatên wiha du taybetiyên sereke pêwîst in. Yek jê serkevîbûna di hunerên wejeyê de ye û ya duduyan jî bi awayekî kûr zanebûna her du zimanan e. Ji ber ku ked û hostetiyeye mezin dixwest, kêr nivîskar û helbestvan xebatên wiha kirine. Xebatên bi vî rengî di heman demê de nîşandana hostetiyê bû û her wiha di demeke kurt de ji bo nivîskar navdarî çêdikir. Lewra kesen ku li medreseyan

ders didîtin, hîn di emrên biçûk de xwediyê vê xebatê nas dikirin. Yanî ne pirtûkeke arîkar, berovajî vê pirtûkeke bingehîn a dersê bû. Gerçî Kerbelayî ji ber taybetiya heyama xwe giramiya ku layiqê wê bû nedît. Lewra tam di dema wî de şerê cîhanê yê yekem dest pê kiribû û dûre jî serhildana 1925an a tevgera kurdî têk çûbû. Di vê serdemê de pergala perwerdeyê ya medreseyan xera bûbû û medrese hatibûn qedexekirin. Lewma *Mîrsadu'l-Ûfal* zêde belav nebû. Lê belê Xanî bi saya *Nûbehara Biçûkan* di demeke kurt de li derdorên medreseyên kurdî baş hate naskirin. Li gorî Marûf Xeznedar, eger di hişê kurdan de Ehmedê Xanî navdartirîn helbestkar e, bêguman yek ji sedema bingehî ya vê yekê, ji ber berhema wî ya *Nûbehare* ye ku zarokên kurdan bi wê fêrî zimanê erebî dibûn. Lewra ji bo fêrkirin û tomarkirina hemû zanistên Îslamî, erebî zimanekî pêwîst bû.<sup>11</sup> Her wiha dibû ku her kes *Mem û Zînê* an *Dîwana* wî nexwendibûya, lê belê herçî ehlê medreseyê bûn, wan *Nûbehara Biçûkan* teqez dixwend. Heta piştî desthilatdariya nû ya komarê û qedexekirina medreseyan jî ev pirtûk di nav destên seyda û feqiyên kurdan de geriya û digel ewçend zor, zehmetî û xetereyan jî, vê pirtûkê fonksiyona xwe bi awayekî baş bi cih anî û hîn jî tîne.<sup>12</sup>

## 1. 2. Taybetiyên Ferhengên Menzûm

Di temamê edebiyatên klasîk ên rojhilatê de, em dibînin ku ferhengên menzûm digel hin cudayiyên biçûk, ji gelek aliyan ve xwedî taybetiyên hevpar in. Yanî herçî nivîskarê ku ferhengeke menzûm amade kiribe, ji berhemên beriya xwe istifade kiriye û li gorî rê û rêbazeke hevpar berhema xwe nivîsandiyê. Ferhengên menzûm dema ku ji aliyê taybetiyên xwe yên teşeyî, tertîbî û naverokî ve werin vekolîn, ev yek bêtir xuya dibe.

Di edebiyata klasîk de ji bo menzûmeyên dirêj awayê mesnewî tê bikaranîn. Lewra pergala qafiyeyê ya mesnewiyê ji bo vê yekê gelek guncan e. Di mesnewiyê de ne tenê her du risteyên malika pêşî, di hemû malikan de her du riste di nav xwe de bi qafiyê ne. Her wiha gelek caran, mesnewî bi qalibên erûzê yê kurt tene nivîsîn.<sup>13</sup> Lewma ev taybetî di amadekirina ferhengên menzûm de gelek bi kêr tîne.

Bi awayekî giştî ferhengên menzûm ji van beşan pêk tîne:

### Dîbace

Dîbace beşa destpêkê ye ku bi “*hemdele*” û “*selwele*”yê dest pê dikan. Ev beş bi piranî bi awayê mesnewiyê tene nivîsîn. Di dîbaceyan de piştî hemd, selat û selamê, der bareyê

<sup>11</sup> Marûf Xeznedar, *Mêjûyî Edebî Kurdî*, c.1., Hewlêr, 2001, r. 68-69.

<sup>12</sup> Yıldırım, *Nûbehara Biçûkan*, r. 41.

<sup>13</sup> Haluk İpekten, *Eski Türk Edebiyatı Nazım Şekilleri ve Aruz*, Dergah Yayınları, İstanbul, 2002, r. 59.

nîvîskar de agahiyên kurt tên dayîn. Sedema nivîsandinê, taybetiyên tertîbî, navê berhemê, tarîxa nivîsandinê û her wiha pend û şîretên der bareyê girîngî û mifayên hînbûna ziman de tên dayîn.<sup>14</sup>

### **Beşa ferhengê**

Di ferhengên menzûm de beşa bingehîn ev e. Di vê beşê de, bêje û hemwateyên wan ên bi zimanê din gelek caran li gorî mijarên diyar tên rêzkirin. Ev beş bi piranî bi awayê xezelê tên nivîsîn. Di ferhengên menzûm de beşên ferhengê di wateya “perçe” an “bir” de wekî “qit‘e” tên binavkirin û hejmara malikên her qit‘eyeke wan ji hev cuda ne. Sernavên qit‘eyan, bi hevokeke erebî an farisî tên nivîsîn ku digel rêza qit‘eyê, behr û kêşa wan tên nîşandan. Carinan jî bi awayê malikek an risteyeke erebî an farisî di qit‘eyan de taybetiyên bêjeyan tên nîşandan û bi heman kêşê tên hûnandin.<sup>15</sup>

### **Xatîme**

Ev, beşa dawî ye û bi piranî bi awayê mesnewiyê tên nivîsîn. Di vê beşê de hêvî û diayên nivîskar hene; hin nivîskar vê beşê wek temrîn jî bi kar tînin. Di xatîmeyên ferhengan de li gorî hesabê ebcêdê tarîxa nivîsandina berhemê tên diyarkirin.<sup>16</sup>

Ferhengên menzûm ji bo hêsankirina xwendin û ezberkirinê xwediyê hin taybetiyên hevpar in. Taybetiyên wan ên hevpar ên ji aliyê tertîbî ve bi vî awayî ne:

1. Malikên ku bi heman behr û kêşê, tên nivîsîn, bi sernavê “qit‘e” ji hev tên cudakirin.
2. Malikên wan ên teqtiyê tên nivîsîn.
3. Tertîba her qit‘eyekê ji yê din cuda ye.
4. Di qit‘eya pêşî de têgînên dînî tên nezmkirin.
5. Bêjeyên biyanî û hemwateyên wan tên numarekirin.
6. Hejmara bêjeyên wan, di navbera 500 û 3000an de ne.<sup>17</sup>

Di ferhengên menzûm de bêje bi piranî ji cureyên nav û hevalnavan pêk tên. Her wiha lêker bi awayên xwe yê raderî, dema borî û dema niha ve tên nîşandan. Lêkerên bi awayê raderî, gelek caran di nav qit‘eyên cuda de tên nivîsîn. Di ferhengên menzûm de têgînên dînî, tesewifî, mezmûnên edebî jî derbas dibin. Hinek nivîskaran di malikên dawîn ên qit‘eyan de hunerên edebî digel mînakên nîşan dane.

<sup>14</sup> Yusuf Öz, *Tarih Boyunca Farişça-Türkçe Sözlükler* (Teza doktorayê ya neçapkirî), Ankara Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü, Ankara 1996, r. 62.; vgz. Ahmet Kartal, h.b., r. 23.

<sup>15</sup> Öz, h.b., vgz. Kartal, h.b., r. 23.

<sup>16</sup> Zehra Gümüş, “Klasik Türk Edebiyatında Manzum Sözlük Şerhleri”, *Türkoloji Çalışmaları*, c. 2, 2007, r. 3.

<sup>17</sup> Öz, b.n., vgz., Kartal, r. 24.

### 1. 3. Tradîsyona Ferhengnivîsiya Menzûm di Zimanên Rojhilatî de

Di zimanên rojhilatê yên erebî, farisî, tirkî, kurdî, peştûyî, hîndûyî, keşmîrî û wd. de em rastî ferhengên çend zimanî yên menzûm tîn. Ev yek jî nîşan dide ku, di nav edebiyata rojhilatê de ferhengnivîsiya menzûm tradîsyoneke kevn û berbelav e. Yekem ji nimûneyên ferhengên menzûm ên duzimanî ku tê zanîn *Dusturu'l-Luğaya* Edîb Natanazzî (m. 1106) ye ku bi erebî-farisî hatiye amadekirin.<sup>18</sup> Her wiha di nîva sedsala XII.de nivîskarê Îranî, Reşiduddîn Watwatî (m. 1182) jî xebateke bi vî rengî amade kiriye.<sup>19</sup> Ferhenga menzûm a erebî-farisî *Nisâbu's-Sibyân* a Bedruddîn Ebû Mes'ud bîn Ebî Bekr el-Nesr Ferâhanî (m. 1221), yek ji girîngtirîn nimûneya vî tradîsyonê ye.<sup>20</sup> Vê berhemê, li ser berhemên din ên vî cureyî tesîreke mezin kiriye. Mînaeke balkêş jî ev e ku, helbestvanekî bi navê Yusuf, bi sernavê *Nisab-i Şeşzeban*, ferhengeke menzûm a bi tirkî-erebî-farisî-peştûyî-hîndûyî-keşmîrî nivîsandiye ku çawa jî sernavê wê jî diyar e, ev ferhengeke şeşzimanî ye.<sup>21</sup> Zimanzanê ereb, Îbn Mu'tî (m. 1231) du ferhengên pexşanî yên erebî, yek jê "*el-Cemhere*" ya Îbn Dureyd (m. 933), ya din jî "*es-Sihah*" a Îsmâil bîn Hammad el-Cewherî bû ku bi awayekî menzûm ji nû ve nivîsand û bi vî awayî ezberkirina wan hêsan kir.<sup>22</sup>

Di nîva sedsala XIII. de bi navê *Zuhretu'l-Edeb* ferhengeke menzûm a erebî-farisî ji aliyê Şükrüllah ve hatiye nivîsîn û jê şûnde ev adet li Enadolê belav bûye. Di sala 1392an de Îbnu Melek bi navê *Luğat-î Ferîşteoğlu* ferhengeke menzûm a erebî-tirkî amade kiriye.

Yekem ferhenga menzûm a farisî-tirkî ya bi navê *Tuhfe-î Husamî* di sala 1400an de ji aliyê Husam b. Hesên ve hatiye nivîsîn.<sup>23</sup> Di nav ferhengên menzûm ên farisî-tirkî de yek ji berhemên ku pir tê naskirin *Tuhfe-i Şahidî* an jî *Luğat-i Şahidî* ye ku ji aliyê Şahidî Îbrahîm Dede (m.1550) ve hatiye nivîsîn.<sup>24</sup>

Di vî warî de berhemek bi navûdeng û berbelav jî *Tuhfe-i Vehbî* ya Sünbülzade Vehbî (m.1809-10) ye. Ev berhem di navbera salên 1798-1909an de 58 caran hatiye çapkirin.<sup>25</sup> Bi qasî ku hatiye tesbîtkirin li Enadolê heta niha 32 ferhengên menzûm ên bi farisî-tirkî hene.<sup>26</sup>

<sup>18</sup> Perihan Ölker, "Klasik Edebiyatımızda Manzum Lügat Geleneği ve Mahmûdiye", *Türkoloji Çalışmaları*, c.4, 2009, r. 874.

<sup>19</sup> Yıldırım, *Nûbehara Biçûkan*, r. 117.

<sup>20</sup> Kartal, h.b., r. 19.

<sup>21</sup> Ahmet Karaismailoğlu, "Manzum Sözlüklerimizden Tuhfe-i Remzi", *Milli Kültür*, j.74, Ankara, 1990, r. 60.

<sup>22</sup> Yıldırım, h.r.

<sup>23</sup> Ahmet Çelik, *Tanzimattan Günümüze Türkiye'de Farişça Öğretimi* (Teza doktorayê ya neçapkirî), İstanbul Üniversitesi, Sosyal Bilimler Enstitüsü, İstanbul, 2005, r. 241.

<sup>24</sup> Atabey KILIÇ. "Klasik Türk Edebiyatında Manzum Sözlük Yazma Geleneği ve Türkçe-Arapça Sözlüklerimizden Sûbha-i Sıbyan". *Sosyal Bilimler Enstitüsü Dergisi*, j. 20, 2006, r. 67.

<sup>25</sup> Kartal, b.n., r. 14.

<sup>26</sup> H.b., r. 24.

Her wiha di sala 1635an de bi navê *Makbul-i Arîf* ferhengeke menzûm bi bosnayî-tirkî ji aliyê Ûskûyê Bosnayî û di sala 1850yan de bi navê *Miftahu'l-Lîsan* ferhengeke fransizî-tirkî jî ji aliyê Yusuf Halis Efendi ve hatine amadekirin.<sup>27</sup> Bi zimanên rûmî û ermenkî jî ferhengên menzûm hene.<sup>28</sup> Yanî bi zimanên rojavayî jî xebatên wiha çêbûne.

#### 1. 4. Kurtemêjûya Ferhengnivîsiya Menzûm di Zimanê Kurdî de

Herwekî li jorê jî hat gotin, di edebiyata klasîk de cureyên nezmê hene. Ferhengên menzûm jî yek ji van cureyan e. Di edebiyata kurdî de bi qasî ku em dizanin bi vî cureyî 4 ferhengên menzûm hatine nivîsîn.<sup>29</sup> Bi vî awayî em dibînin ku edebiyata kurdî jî, ev tradîsyon şopandiye.

##### 1. 4. 1. Nûbehara Biçûkan

Yekem ferhenga menzûm a duzimanî ku em pê dizanin *Nûbehara Biçûkan* a Ehmedê Xanî ye ku di sala 1683yan de hatiye nivîsîn. Ev ferhenga menzûm a kurdî-erebî her wiha wek ferhenga kurdî ya pêşî jî tê qebûlkirin.<sup>30</sup> Berhem ji pêşgotineke kurt û ji 13 qit'eyan pêk tê. Tê de 220 malik û nêzikî 1000 bêjeyên erebî û hemwateyên wan ên kurdî hene. Cara pêşî di sala 1794an de digel ferhenga kurdî-erebî ya Yusuf Ziyaeddîn Paşa ya bi navê *El-Hediyyetu'l Hemîdiyye fi'l luxeti'l-Kurdiyye* li Stenbolê hatiye çapkirin. Cara duyem di sala 1908an de ji aliyê Lecog ve di nav xebata "*Tekstên Kurdî*" de li Berlînê hatiye weşandin.<sup>31</sup>

<sup>27</sup> H.b., r. 21.

<sup>28</sup> Levend, b.n, r. 636.

<sup>29</sup> Perwîz Cihanî, *Ferhenga Nûbehar*, Weşanên Ferheng û Edeba Kurdî, Ormiye, 1367, r. 18. vgz. Emîn Ebdulqadir, *Hozan û Şanogeriya Zarokan di Edebî Kurdî da*, Çapxana Hecî Haşim, Hewlêr, 2006, r. 31. Cihanî di vê pirtûka xwe de behsa ferhengê bi kurdî-tirkî dike. Li gorî wî her çend nav û nivîskar ne diyar bin jî di nava gel de hin malikên manzûm ên ji vê ferhengê hene. Mînak wiha dane:

Gel gel **were**, git git **here**  
Qapî **der** e, êşek **ker** e

Saman **ka** ye, ot **giya** ye  
Qoyun **mihî**, okuz **ga** ye

Qurût **keşk** e, tuluğ **meşk** e  
Siçan **mişk** e, qurû **hişk** e

Yuk **bar** e, îlan **mar** e  
Ağac **dar** e, soyuğ **sar** e

Kêçî **bizin** e, arwad **jin** e

<sup>30</sup> Yıldırım, *Nûbehara Biçûkan*, r. 10. *Nûbehar* hîn jî di medreseyan kurdan de ji bo hînkirina zimanê erebî wek pirtûkeke dersê tê xwendin. Yanî di mêjûya perwerdeyê ya tirkî de ji bo hînkirina zimanê farisî, girîngiya *Tuhfe-i Vehbî* ya Sünbülzade Vehbî çî be, di mêjûya perwerdeyê ya kurdî de jî ji bo hînkirina zimanê erebî, girîngiya *Nûbehara Biçûkan* a Ehmedê Xanî heman tişt e.

<sup>31</sup> Yıldırım, h.b., r. 73.



Piştire gelek carên din jî hatiye çapkirin. Di sala 1985an de Elî Fetah Dizeyî di gotara xwe ya bi sernavê *Newbuharî Xanî û Ehmedîyî Şêx Marûfî Nodeyî-Lêkolînewe û Berawirdkirdin* de agahiyên berfireh der bareyê *Nûbeharê* de dane û bi *Luxetnameyî Ehmedî* re berawird kiriye.<sup>32</sup> Ehmed Hîlmî Qoxî di xebata xwe ya bi navê *Gulzara Hemûkan* de şerha wê kiriye û digel metnê wê ya bi tîpên erebî li Diyarbekirê çap kiriye.<sup>33</sup> Qoxî bi şerheke kurdî, yekoyek raveya bêjeyên *Nûbeharê* kiriye û di dawiya pirtûkê de temamê bêjeyên kurdî û erebî, digel numareyên wan ên malikan wekî pêrîst amade kiriye. Ev pirtûk di sala 2004an de wek çapa sêyem, ji aliyê weşanên Îhsan ve hatiye çapkirin.<sup>34</sup> *Nûbehara Biçûkan* bi tîpên latînî di sala 1986an de ji aliyê Zeynelabîdîn Kaya (Zinar) ve li Stockholmê hatiye çapkirin.<sup>35</sup> Di dawiya vê çapê de metna kurdo-erebîk jî heye. Ev metin, li ber her du nusxeyên çapa 1903an a li Stenbolê û ya bi destnivîsa Mele Mihemedê Wanî ya li Berlînê çapbûyî, hatiye amadekirin. Heman metin îcar di sala 1992yan de bes bi tîpên latînî ji aliyê Weşanên Fîratê ve hatiye çapkirin.<sup>36</sup> Di sala 2010an de Tehsîn Îbrahîm Doskî, *Nûbehara Biçûkan a Xanî û Mîrsadu'l-Etfal* a Kerbelayî, digel pêşgotineke kurt, bi hev re çap kirin.<sup>37</sup> Van salên dawî Kadri Yıldırım hem di “Sempozyûma Ehmedê Xanî ya Navneteweyî”<sup>38</sup> de li ser vê mijarê teblîxeke berfireh pêşkeş kir, hem jî di çarçoveya xebatên “Kuliyata Ehmedê Xanî” de, di pirtûka xwe ya bi navê *Nûbehara Biçûkan* de bi awayekî berfireh analîz û wergera wê ya bi tirkî kiriye. Yıldırım, di xebata xwe de digel berawirdkirina nusxeya Zinarî û ya Qoxî, bêtir xebata Qoxî ji xwe re kiriye binema.<sup>39</sup> Ev xebat, ji gelek aliyên ve girîngî û qîmeta *Nûbeharê* derdixe holê û xalên ku heta wê gavê bala gelek lêkolîner û akademîsyanan nekişandibûn tîne rojevê.

#### 1. 4. 2. Gulzar

Di tarîxa edebiyata kurdî de ferhenga menzûm a duyem, di sedsala XVIII. de ji aliyê şagirdê Ehmedê Xanî, Îsmâîlê Bazîdî (1655-1710) ve hatiye nivîsîn. Di *Îslam Ansîklopedisiyê* de di bin maddeya “Kürtler” de hatiye nivîsîn ku, Îsmâîlê Bazîdî, şagirdê Ehmedê Xanî ye, ji bilî çend helbest û xezelan, wî ferhengokeke bi sêzimanî ya kurmancî-erebî-farisî

<sup>32</sup> Ebdurrezaq Bîmar, “Serincek le Ferhengokî Honrawey Ehmedî”, *Govarî Korî Zanyarî Iraq Destey Kurd*, j. 18-19, Bexda 1988, r. 62.

<sup>33</sup> Ehmed Hîlmî Koxî, *Gulzara Hemûkan*, Weşanên Sûrê, Diyarbekir, 1991.

<sup>34</sup> Ehmed Hîlmî Koxî, *Gulzara Hemûkan*, Weşanên Îhsan, Stenbol, 2004.

<sup>35</sup> Zeynelabîdîn Zinar, *Nûbar*, Weşanên Roja Nû, Stockholm, 1986.

<sup>36</sup> Zeynelabîdîn Zinar, *Nûbar*, Weşanên Fîrat, Stenbol, 1992. Lê belê Zinarî di vê çapê de ev agahî guhartine û tarîxa çapa Stenbolê kiriye 1906 û tarîxa çapa Mele Mihemedê Wanî jî kiriye 1887.

<sup>37</sup> Tehsîn Îbrahîm Doskî, *Du Ferhengên Vehandî Nûbihar û Mîrsadu'l-Etfal*, Çapxaneya Spîrêz, Hewlêr, 2010.

<sup>38</sup> Sempozyûma Ehmedê Xanî ya Navneteweyî, 2008, Diyarbekir, Weşanên Şaredariya mezin a Diyarbekirê, r. 35-57.

<sup>39</sup> Yıldırım, *Nûbehara Biçûkan*, r. 12.

nivîsandiye.<sup>40</sup> Der bareyê *Gulzarê* de mixabin agahiyên tekûz û berfireh li ber destê me nînin. Li gorî agahiyên ku li ber dest in, taybetiyên *Gulzarê* bi vî awayî ne:

- 1) Ferhengeke kurdî-erebî-farisî ya bi sêzimanî ye,
- 2) Di medreseyên kurdî de wek pirtûkeke dersê hatiye xwendin
- 3) Bi giranî devoka Hekarî û Bazîdê bi kar aniye.

Hin mînak ji bêjeyên vê ferhengê ev in:

*Axaftin, axiftin, êwergeh, êwerîn, pizdan, guhan, bijwîn, bêdadî, bêwecî, pişk, cirrenix, çekme, xanîmal, daberistin, dirav, mezaxtin, suba, solbend, qlopanik, qîvar, lêb, lêbandin, lêbok*<sup>41</sup>

Qanatê Kurdo,<sup>42</sup> Marûf Xeznedar,<sup>43</sup> Reşîd Findî,<sup>44</sup> Kemal Burkay,<sup>45</sup> Kadrî Yıldırım<sup>46</sup> û çend lêkolînerên din, herçend behsa wê dikin jî der bareyê naveroka wê de em zêde tişt nizanin. Yanî derbarê menzûmbûn an nîvmenzûmbûna wê de jî agahiyeke piştrastkirî nîn e.

#### 1. 4. 3. Luxetnameyî Ehmedî

*Luxetnameyî Ehmedî* piştî bi sedsalî ya *Nûbeharê* yanî di sala 1790an de ji aliyê Şêx Marûf Nodeyî (1753-1837) ve hatiye nivîsîn. Ferheng bi kurdî(soranî)-erebî ye. Destxeta vê ferhengê ya ku ji aliyê Nodeyî ve hatiye nivîsîn, li ba neviyê wî Şêx Mehmûd hatiye parastin. Ev berhem, bi navê “*Ehmedî-Kitêbî Luxetî Kurdî û Tatî(erebî)*” ji aliyê Seyîd Huseyn Huznî el-Huseynî Mukriyanî di sala 1926an de li Rewandizê hatiye çapkirin. Çapeke wê li Mehabadê bi navê “*Kitêbî Luxetnameyî Ehmedî Kurdî û Arewî*” li pirtûkxaneya Seyîdyan heye, lê tarîxa çapê li ser nîn e. Çapeke din ya bê tarîx jî ev e: “*el-‘Imali’l-Kamîle lî Şeyx Me‘rûf Nodehî el-Berzencî el- Kurdî el-Ehmedîye fî Tercemetî’l-Kelîmati’l-Erebîyye bi’l-Kurdiyye*”: Dîrase we Tehqîq Mehmûd Ehmed Muhemmed, Şêx Babe Elî Qeredaxî, Şêx Muhemmed Emer Qeredaxî. Çapeke wê, di sala 1936an de li Bexdayê ji aliyê mamoste Hîdayetullah Huseynî ve hatiye kirin. Li gorî Bîmarî ku li ser vê berhemê xebateke baş kiriye, ji ber ku Huseynî bi pêşkeşiyê berfireh agahdarî der bareyê destxetê û rastkirina wê de dane, çapa herî baş û tekûz ev e. Her wiha wî gelek kêmasiyên berhemê jî, ji aliyê rastnivîsa erebî ve rast kirine. Çapeke wê ya Kerkûkê ji aliyê Mihemed Emîn Esrî, çapeke wê jî ji aliyê

<sup>40</sup> Vlademir Minorsky, “Kürtler”, *İslam Ansiklopedisi*, c. 6, MEB Yayınları, Eskişehir, 1997, r. 114.

<sup>41</sup> Reşîd Findî, “Pêvaçûnek li ser Zaravesaziyê di Zimanê Kurdî de”, *Ekadîmî: Kovarî Korî Zanyarî Kurdîstan*, vgz. K.Yıldırım, “Dîroka zimanê kurdî ya nivîskî û perwerdeyî ya di konseptê medreseyê de”, *Kovara Zend*, j. 9, 2006, r. 17.

<sup>42</sup> Qanatê Kurdo. *Tarîxa Edebiyata Kurdî*. Weşanên Lîs, Diyarbekir, 2010, r. 13-14.

<sup>43</sup> Marûf Xeznedar. *Mêjûy Edebî Kurdî*, c.1, Hewlêr, 2001.

<sup>44</sup> Findî, h.g., r. 76.

<sup>45</sup> Kemal Burkay, *Kürtler ve Kürdistan*, Deng Yayınları, Stenbol, 1992, c.1, r. 207.

<sup>46</sup> Yıldırım, b.n., r. 17.

Gîwî Mukriyanî ve hatine kirin. Dûre Mamoste Hembûrî di sala 1936an de li Bexdayê bi navê “*Kitêbî Ehmedî*” li Çapxaneyaya Furatê ew çap kiriye.<sup>47</sup> Her wiha Jemal Nebez, behsa çapeke wê ya Silêmanî ya li Çapxaneyaya Jiyana dike ku di sala 1935an de wek çapa duyem derbas dibe.<sup>48</sup>

Di van salên dawî de lêkolîner Mehmûd Ehmed Muhemmed, metna ferhengê bi navê “*Şêx Marîfî Nodî, Kitêbî Ehmedî*”, li Silêmanî çap kiriye. Wî di vê xebatê de berhem ji nû ve sax kiriye, pêşgotinek nivîsandiyê û wêne li ser zêde kirine. Muhemmed behsa gelek destnivîsên vê berhemê dike. Wî ji van destnivîsan çar berhem esas girtine<sup>49</sup>:

1) Nusxeya Mela Xalîdî Sofî. Mustensîx, melayê Mizgefta Daroxa ya li Silêmaniyê bûye. Mêjûya nivîsandina nusxeyê 29ê Rebû’l-Ewwelê sala 1300ê koçî (1881z) ye.

2) Nusxeya Kitêbxaneyaya Ewqafê ya Merkezî li Silêmanî.

3) Nusxeya li ba Mamoste Mela Rehîmê Perxî.

4) Nusxeya Mamoste Şêx Mihemedê Qeredaxî. Mêjûya nivîsandina nusxeyê sala 1355ê koçî li Helebçeyê ye.

#### **1. 4. 4. Mîrsadu’l-Etfal (Şahrahê Kûdekan)**

Ev berhem ku mijara teza me ye di sala 1912an de li gundê Aqtepeyê yê girêdayî bajarê Diyarbekirê, ji aliyê Şêx Mihemed Kerbelayî bi kurdî-farisî hatiye nivîsîn. Em dê di beşa duyem û sêyem de agahiyên berfireh der bareyê vê berhemê de bidin.

---

<sup>47</sup> Ji bo van agahiyan bnr. Ebdurrezaq Bîmar, “Serincek le Ferhengokî Honrawey Ehmedî”, *Govarî Korî Zanyarî Iraq* “Destey Kurd”, j.18.-19. Bexda, 1988, n.r. 55-114.

<sup>48</sup> Jemal Nebez, *Kurd (Dîrok û Kultura wan)*, wer. Ergîn Opengîn, Weşanên Avesta, Stenbol, 2007, r. 58.

<sup>49</sup> Mehmûd Ehmed Muhemmed, *Şêx Marîfî Nodî Kitêbî Ehmedî*. ç.4., Kitêbxaneyaya Aram, Silêmanî, 2011, r.16-17

**BEŞA YEKEM**  
**MIHEMED KERBELAYÎ Û BERHEMÊN WÎ**

**1. Agahiyên Şexsî û Malbatî**

**1. 1. Di Serdema wî de Rewşa Siyasî û Edebî**

Heyama ku Mihemed Kerbelayî tê de bû, yanî di serê sedsala XXan de, li herêma alozî û guherînên mezin pêk dihatin. Heyama ciwaniya wî ya pêşî rastî dema padişahiya Ewdilhemîdê Duyem (1876-1908) tê. Wê demê em dizanin ku tesîra cemiyeta “Îttihat û Terakki”yê li ser rêveberiya dewleta Osmanî zêde bûbû. Ji ber têkçûnên şerên li derve û tevlihevî û aloziyên li hundirê welat, wê demê buhraneke mezin di nav împaratoriye de rû dabû. Fikrên serdest ên wê demê “Osmanîparêzî, Îslamparêzî, Tirkîtiparêzî û Rojavaparêzî” bûn. Di sala 1908an de padişah Ewdilhemîd ji bo parastina yekitiya împaratoriye cara duyem Meşrûtiyet îlan kiribû. Kerbelayî jî ketiye bin karîgeriya vê rewşê û ev siyaseta Siltan Ewdilhemîd parastiye û pesnê wî daye. Di *Dîwana* xwe de di malikên yekem û duyem ên beşa 15an de wiha gotiye:

Mujde ez Yaqûbê dil, Yûsûf ji zindan hate der  
Şemsê hurriyet veda, alem munewwer ser te ser

Şehriyare behr û berr, Ebdulhemîd Xanê mezin

Bexşî hurriyet ji bo me, madena durr û gewher

Herwekî tê zanîn diruşmeyên navdar ên wê demê “ji bo herkesî hurriyet, musawat, uxuwet û edalet” bûn. Kerbelayî di malikên 11 û 12. ên beşa 15an de piştgirîdana xwe ya vê yekê wiha aniye zimên:

Ger uxûwwet ger musawat û edalet, hurriyet  
Rahê şer'ê heqq e, tefrîqê qilûban bû keder

Çendî elfazê ziyabexşê 'etayê feyzê te  
Kurdewarî gote sin eltafê te bê zor û zer

Malikên li jêr jî bi ihtimaleke pir mezin behsa şerê cîhanî ya yekem (1909-1913) dike, lewra tê de behsa çekên şerî yên nûjen dike.

Di beşa 36. ê dîwanê de wiha gotiye:

Çi erd e, ev çi iqlîm in, çi şah in ev çi bajar in  
Çi bab in, ev çi mîhrab in, sema ne ev çi etwar in

Çi leşker e, ev çi ceng e, ev çi girtin, ev çi berdan e  
Çi setrenc in, çi zar in, cuz qeder ev nerdê mexmûrî

Nîşan e, dûrebîn e, xurdebîn e ya telesqob e  
Telafûn e, gerafûn e, telixraf e, bêtel û çob e

Kef e, mewc e, durr e derya, çi papûr û çi jiblîn e,  
Çi teht-ul behr e yekser ateş e dergirdî mexmûrî

Împaratoriya Osmanî têk çûbû û ji dêlva wê, komarek li ser fehm û rêgeza netewîtiya tirkî ava bûbû. Nemaze piştî têkçûna serîhildana 1925an rewşa kurdan xerabtir bûbû. Li temamê Tirkiyeyê û her wiha li Kurdistanê jî tekya û medrese hatibûn qedexekirin û tu derfeta xwendin û nivîsandina bi zimanê kurdî nema bû. Medreseya Aqtepeyê ku hem ji aliyê dînî û hem jî ji aliyê edebiyata kurdî ve gelek pêşketî bû, bûbû armanca rejîma nû. Lewra di nav pergala nû de bi tu awayî cihê wê nebû. Di vî warî de Şêx Şafî wiha dibêje:

“Tiştê tê gotin, wê demê gelek kitêbên malbata me yan hatine şewitandin, yan hatine wendakirin. Şêxên me hatine sirgûnkirin û dest danîne ser hemû tiştên wan. Şêx Muhemed Nûr, li gundê Erxenî yê li Tilxûzurê dima. Şêx Muhemed Nûr hatiye girtin. Dûre kurê wî yê mezin Şêx Mihemed Sidîq jî hatiye girtin. Dibe ku di girtina wan de dest danîbin ser kitêbên wan jî.”<sup>50</sup>

Kerbelayî piştî veqerî xwe ya welêt, nema çûbû Aqtepeyê. Malbat her yek bi aliyekî de belav bûbûn. Şêx Eskerî berê xwe dabû Erxeniyê, Şêx Hesîb jî çûbû hêla Pîran (Dicle) û Gelê (Eğil).

## **1. 2. Di Jiyana Civakî, Dînî û Perwerdeyê ya wê Demê de Rola Malbata Aqtepeyê**

Medreseyên Kurdistanê di warên civakî, dînî, siyasî û perwerdeyê de li ser gelên herêmên xwe karîgeriyên mezin kirine. Medreseya Aqtepeyê jî yek ji van medreseyan e ku li gundê Aqtepeyê (Aktepe) hatiye avakirin. Gundê Aqtepeyê niha girêdayiyê navçeya Çinarê ya li ser bajarê Diyarbekirê ye. Beriya ku Çinar bibe navçe, Aqtepe girêdayî navçeya Bismilê bû. Aqtepe ji Diyarbekir 50, ji Mêrdînê jî 65 km dûr e. Li ser rîya Diyarbekir û Mêrdînê nêzikî 13 kîlometre di hundir de ye. Bi erdnîgariya xwe di navbera navçeyên Çinar û Bismilê de ye.

Damezrenê medreseya Aqtepeyê Şêx Hesên (m. 1863) bi eslê xwe ji herêma Hekariyê ye. Navê bavê wî Îsheq, navê bapîrê wî Siwar e. Bi navên Rukiye û Çaxê Nebat du keçên wî, bi navên Evdîrehman, Mihemed Can, Mihemed Nûr û Mihemed Sîrac çar kurên wî hene.<sup>51</sup> Malbata Şêx Hesên ji ber bûyerên wê demê koçî herêma Xerzan kirine. Şêx Hesên li gundê Hawêl a Koxê (Baykan) hatiye dinyayê ku nêzî Weysel Qeranî ye. Ew demekê li gundê Koxê maye. Li cem kesayetên navdar ên wekî Mela Xelîlê Sêrtî (m.1843) û Şêx Salihê Sîpkî (m.1852) perwerdeya xwe ya dînî temam kiriye û bûye yek ji xelîfeyê Şêx Salihê Sîpkî<sup>52</sup>. Şêx Salih ku wê demê navbera wî û padîşah Ebdulmecîd gelek baş bûye, nameyek ji padîşah re şandiye û tê de behsa xelîfeyê xwe Şêx Hesênê Nûranî jî kiriye. Li ser daxwaza şêxê wî, bi fermana Ebdulmecîd Xan, li gundê Aqtepeyê 52 parsel erd jê re tê hîbekirin û tê wezîfedarkirin ji bo avakirina tekya û medreseyekê li vî gundî. Piştî vê biryarê, dora 1850yan

<sup>50</sup> Hevdîtina bi Şêx Şafî re. Şêx Şafî Işîk neviyê Şêx Mihemed Şewketê kurê Şêx Evdîrehman Aqtepeyî yê. Navê bavê wî Neqşibendî ye. Neqşibendî biraziyê Kerbelayî ye ku di *Mîrsadu'l-Etfalê* de navê wî derbas dibe. Niha wek mezinê malbatê ye û li Aqtepeyê rûdine.

<sup>51</sup> M.Şefîk Korkusuz, *Tezkîre-i Meşayih-i Amid*, c.I-II, Kent Yayınları, İstanbul, 2004, r. 250-251.

<sup>52</sup> Tehsîn Îbrahîm Doskî, “Şêxên Neqşibendî û Bedîrxan Beg” *Kovara Nûbihar*, j.117, 2012, r. 18.

ew jî hatiye li gundê Aqtepeyê bi cih bûne.<sup>53</sup> Ji wê şûnde malbata Şêx Hesên li vir tekya û medreseyekê ava dikin ku dûre bi navê medreseya Aqtepeyê an jî Aktepe Sübyan Mektebî<sup>54</sup>, yanî Xwendingeha Zarokan a Aqtepeyê bi navûdeng dibe.

Piştî wefata Şêx Hesên, kurê wî Şêx Evdîrehman (m.1907) rêveberiya medreseyê kiriye. Şêx Evdîrehman di warê zanistiyên dînî û edebiyata kurdî de gelek serkevtî bû. Wek *Rewdu'n-Neîm* bi dehan berhem li pey xwe hîştine.<sup>55</sup> Bi navên Mihemed Şewket, Mihemed Kerbelayî û Mihemed Eskerî sê kurên wî û bi navên Rukiye, Şahê Nebat û Pîrozxanê jî sê keçên wî çêbûne. Şêx Evdîrehman çar caran zewiciye. Navê diya Mihemed Kerbelayî, Rebîa Xanim e. Ew ji diya xwe tenê ye.<sup>56</sup>

Li pey wefata Şêx Evdîrehman, Şêx Kerbelayî miderisiya medreseyê dike. Piştî têkçûna tevgera kurdî ya 1925an (Serhildana Şêx Seîd), gişê wan hatine mişextkirin û tu kesek li medreseyê nemaye. Kurê Şêx Sîrac, Şêx Fehmî û pismamê wî Şêx Hesîb li Diyarbekirê; kurê Şêx Mihemed Nûr, Şêx Sidîq li Erxeniyê; kurê Şêx Evdîrehman, Şêx Eskerî li Bîrsînê û Şêx Kerbelayî jî li Çuliyê cihwar bûne. Piştî ku malbat bi vî awayî li hev belav dibe, Medresa Aqtepeyê jî tê girtin. Ji xwe wê demê medrese jî tên qedexekirin.

Li gund niha xerabeyê medreseyê, gorên Şêx Hesênê Nûranî, Şêx Evdîrehmanê Aqtepeyî û hin endamên malbatê hene. Her wiha tê gotin ku di nexweşiya webayê de nêzîkî 80 şagirtên medreseyê jiyana xwe ji dest dane û ew li wir hatine veşartin.<sup>57</sup>

Wek saziyeke perwerdeyî du aliyên medreseya Aqtepeyê hene. Aliyê yekem ew e ku, di nav sîstema perwerdeya Osmanîyan de statûya wê “Mekteba Subyan”e. Her wekî tê zanîn di nav sîstema perwerdeyê ya dewleta Osmanî de ji bo zarokên keç û kur ên 5-6 salî “sabî” digotin û xwendingehên wan jî wek “Mekteb-i Sibyan” yanî “Xwendingeha Zarokan” bi nav dikirin. Mektebên Sibyan bi piranî li kêleka mizgeftan bûn û ji odeyeke mezin pêk dihatin. Gelek caran ji aliyê giregirên dewletê an jî kesên dewlemend ve dihatin lêkirin û mesrefên wan jî ji aliyê gel ve dihat pêşwazîkirin.<sup>58</sup> Li wir xwendin pêşî bi alfabeyê dest pê dikir û dersên wek Qur’an, tecwîd, exlaqa olî, serf û nehw dihatin xwendin.

Aliyê duyem jî di nav sîstema perwerdeyê ya kurdî de wek medreseya Aqtepeyê ye. Medreseya Aqtepeyê ji aliyê tesewîfî ve girêdayî dergahê Basretê ye. Damezrenêrê medreseyê Şêx Hesên, xelîfetî ji Şêx Salihê Sîpkî girtiye. Bi riya vî dergahî digêhe Mewlana

<sup>53</sup> Korkusuz, h.b., r. 250.

<sup>54</sup> ŞŞ.

<sup>55</sup> Murat Özeydîm, *Şeyh Abdurrahman Aktepe: Hayatı, Eserleri ve Görüşleri*, Cihan Yayınları, İstanbul 2009, n.r. 93-100.

<sup>56</sup> ŞŞ.

<sup>57</sup> ŞŞ.

<sup>58</sup> Yahya Akyüz, *Türk Eğitim Tarihi*, Kültür Koleji Yayınları, İstanbul, 1994, r. 72.

Xalidê Şehrezorî.<sup>59</sup> Medreseya Aqtepeyê wek zanîngeheke wê demê bû. Di nav hiyerarşiya medreseyên kurdî de di demeke kurt de bi navûdeng bûbû.<sup>60</sup> Her wiha di dema xwe de di nav sînorên Diyarbekirê de jî baş dihat naskirin.<sup>61</sup> Gelek kesayetên navdar ên herêmê li medreseya Aqtepeyê perwerde dîtine û îcazet girtine. Şêx Hesên, li pey xwe gelek xelîfe hîştine.<sup>62</sup>

Endamên malbata Aqtepeyê bi tevahî, xizmeteke mezin ji ziman û edebiyata kurdî re kirine. Bi dehan berhemên hêja ji aliyê wan ve hatine nivîsîn. Medreseya Aqtepeyê, di edebiyata kurdî de bûye ekolek. Şêx Evdîrehman, Şêx Mihemed Can (1858-1910), Şêx Mihemed Sîrac (1863-1909), Şêx Mihemed Kerbelayî (1885-1939), Şêx Hesîbê Aqtepî (1884-1947), Şêx Eskerî (1898-1952) her yek ji wan di warê ziman û edebiyata kurdî de berhemên hêja nivîsandine.

Medreseya Aqtepeyê û malbata Aqtepiyan tesîreke mezin li ser gelê herêmê kirine. Ev tesîr hîn jî berdewam e. Her sal 20ê Gulanê di roja dayîkbûna Şêx Evdîrehman de bi hezaran murîd û hezkirîyên wî tîr ser gora wî û mîhrîcanê saz dikin.

### 1. 3. Nav û Mexlesên wî

Navê helbestkar Mihemed Kerbelayî Bedruddîn e.<sup>63</sup> Herwekî tê zanîn, wek adetêkî klasîk a edebiyata Rojhilatî, helbestkar ji bo ku diyar bikin berhem aidê wan e, carina di serî de û carina jî di dawiya berhemên xwe de ji nav û mexlesên xwe, yek jê an jî her duyan pêkve bi kar anîne. Heta niha me wek *Kerbelayî*, *Kerbûbelayî* û *Bedrî*, sê mexlesên nivîskar tesbit kirine. Wî di helbestên xwe de wekî mexles, bi piranî *Kerbelayî* bi kar aniye. Di dîwana xwe de hin caran mexlesa *Kerbûbelayî* jî bi kar aniye. Mînak, mexlesa *Kerbelayî* wiha bi kar aniye:

Eşîmê Kerbelayî hûn rica kin

Ji bin barê guneh wî wariha kin<sup>64</sup>

Xudaya! Kerbelayî dilkebîb e

Ji vê yarê nekî wî bêneşîbe<sup>65</sup>

<sup>59</sup> Abdurrahman Adak, “Malbata Zebariyan û Basreta Paytexta Neqşebendiyan”, *Kovara Nûbihar*, j.107, 2009, n.r. 27-32.

<sup>60</sup> Müfît Yüksel, *Kürdistanda Değişim Süreci*, Sor Yayıncılık, Ankara, 1996, r. 68.

<sup>61</sup> *Rêbera Geştê ya Amedê*. Weşanên Çandê ya Şaredariya Bajarê Mezin a Amedê, 2011, r.136-137.

<sup>62</sup> Korkusuz, b.n., r. 253.

<sup>63</sup> Bnr: *Mîrsadu'l-Etfal*, r. 41.

<sup>64</sup> Kerbelayî, *Mîrsadu'l-Etfal*, r.41. Bnr. malika 24. a beşa destpêkê.

<sup>65</sup> h.b., malika 19. a beşa 15an.



Ilahî! Mustemendê Kerbelayî  
Riha kî ez gem û renc û belayî<sup>66</sup>

Di *Dîwanê* de mexlesa Kerbûbelayî wiha bi kar aniye:

Şod bende û dermandeyê tu Kerbûbelayî  
Gewher xebera tacê sera bendepenaha<sup>67</sup>

Di *Mîrsadu'l-Etfalê* de em hew carekê rastî mexlesa Bedrî jî tên. Mînak, mexlesa Bedrî wiha bi kar aniye:

Ilahî! **Bedriyê** bêtab û taqet  
Nekî bê yar der dunya û axret<sup>68</sup>

#### 1. 4. Jidayîkbûn û Wefata wî

Li gorî agahiyên li ber dest, Muhemmed Kerbelayî di sala 1885an de li gundê Aqtepeyê yê Çinarê ya li ser Diyarbekirê, ji dayik bûye. Li gorî qeyden şecereya sadaretê ya dewleta Osmanî jî heman tarîx piştrast dibe.<sup>69</sup> Di meha pêşî ya sala 1939an de li gundê Çuliyê (Tavşantepe) ku li tenîştaya nehiyeya Palûkê ya nêzî Diyarbekirê ye, koça xwe ya dawî kiriye.<sup>70</sup>

#### 1. 5. Jiyana wî ya Perwerdeyê û Dersdariya wî ya li Medreseya Aqtepeyê

Kerbelayî zarokiya xwe li Aqtepeyê derbas kiriye. Di heft saliya xwe de bi xwendina Qur'anê dest bi perwerdeya xwe kiriye. Wî perwerdeya xwe li medreseya Aqtepeyê li cem bavê xwe temam kiriye. Zimanê erebî, farisî û pirtûkên dînî xwendine. Hînî zimanê tirkî jî bûye. Bi rastî di warê jiyana wî ya perwerdeyê de wekî din agahî li ber destên me nîn in. Piştî mirina bavê xwe, wî li medreseya Aqtepeyê dersdarî kiriye. Li gorî Özeydîn, wî piştî mirina mamê xwe Şêx Mihemed Can dest bi dersdariya medreseya Aqtepeyê kiriye.<sup>71</sup> Her çiqas Özeydîn wiha bêje jî ev agahî ne rast e. Lewra Şêx Mihemed Can, çil roj beriya birayê xwe yê

<sup>66</sup> h.b., malika 26. a beşa 15an.

<sup>67</sup> Kerbelayî, *Dîwan*, beşa 3.

<sup>68</sup> Kerbelayî, *Mîrsadu'l-Etfal*, malika 14. a beşa 15an.

<sup>69</sup> Belgeya Dewleta Osmanî di pêvekê de ye. Şêx Şafî jî heman agahiyê da.

<sup>70</sup> *Bernameya Ziman û Wêje*, 28.11.2010, saat: 22.30, TRT6, amd. Kadri Yıldırım, Abdurrahman Adak

<sup>71</sup> Özeydîn, b.n., r. 175-176.

mezin Şêx Evdirehman çûye li ser dilovaniya xwe.<sup>72</sup> Ji xwe Özeydin di heman pirtûka xwe de, vê agahiyê jî piştrast dike. Yanî li gorî Özeydin jî Şêx Mihemed Can, di 17-18 Sibata 1910an de wefat kiriye.<sup>73</sup> Bi vî awayî ew di her du agahiyên xwe de dikeve nav nakokiyê. Her wiha tu agahî li ber destê me nîne ku Şêx Evdirehman, di saxiya xwe de dersdariyê sipartibe birayê xwe Mihemed Can. Lewma agahiya rast ev e ku, dersdariya Şêx Kerbelayî ne piştî wefata mamê xwe Şêx Mihemed Can e, lê belê piştî wefata bavê xwe Şêx Evdirehmanê Aqtepeyê ye. Wî dersdariya xwe ya li medreseya Aqtepeyê heta bûyera Şêx Seîd a 1925an dewam kiriye. Yanî em dikarin bêjin ku wî nêzîkî 15 salan, li wir dersdarî kiriye.

### 1. 6. Mişextî û Vegera wî

Mihemed Kerbelayî piştî têkçûna tevgera kurdî ya 1925an bi angaştî ku peywendiya wî bi serhildanê re heye, ji Aqtepeyê hatiye mişextkirin bo bajarê Uşaqê ya li rojavayê Tirkiyeyê. Dûre ew birine bajarê Edenê. Piştî du salan yanî di sala 1927an de destûr dane ku vegere welêt. Di dîwana wî de li ser vê yekê wiha hatiye nivîsîn;

“Rojekê Mihemed Kerbelayî çû ber çemê Ceyhanê. Rehayiya xwe û hevalan ji yexsîrî ji Xwedayê Teala daxwaz kir û erzîhala xwe nivîsand, avête çem. Di eynê wê şevê de ji Enqereyê bi têlbirûskê efûya wan derket û herkes hatin mala xwe. Ew sal 1346ê Hîcrî, 1927ê Mîladî bû. Mihemed Kerbelayî ji neyîstanê dageriya hate gundê Çuliyê, bi malitî rûnişt.”<sup>74</sup>

Piştî vegerê, Kerbelayî nema çû Aqtepeyê û li gundê Çuliyê bi cih bû. Lewra ji berê de têkiliya malbatê bi gundê Çuliyê re hebû. Têkiliya Thomasê Çuliyî bi Şêx Evdirehman re nîşana vê yekê ye. Tê gotin ku hîn di dema bavê wî de fileyek bi navê Thomas li Çuliyê hebû û gelek car ew û Şêx Evdirehman dihatin cem hev û wan der bareyê mijarên dînî de niqaş dikirin. Tê riwayetkirin ku piştî wefata Şêx Evdirehman, Thomas wiha gotiye: “*Me ji Şêx Evdirehman ewqas hez dikir ku eger ew bimana, li Mêrdîn û Diyarbekirê yek file nedima; ew tev bawerî bi wî dianîn û bawer dikim wê tev bibûna misilman.*”<sup>75</sup>

Dibe ku ji wê demê ve têkilî û hatûçûna Şêx Kerbelayî jî bi wî gundî re çêbûbe û ji ber ku nêzî Diyarbekirê jî bû lewma li wir bi cih bûbe. Li wir, wî dev ji dersdariyê berda û ji bilî hin pirtûkên pirtûkxaneya medresê, tiştek bi xwe re nebîr, heqê xwe di nav xwişk û birayên xwe de parve kir. Der bareyê jiyana wî ya Çuliyê de, Şêx Şafî van agahiyan dide:

<sup>72</sup> ŞŞ.

<sup>73</sup> Özeydin, b.n., r. 227.

<sup>74</sup> Diljar Zeynelabidîn, *Dîwana Kerbelayî*, Diyarbekir, 1980. Ev nivîs ji aliyê Abdurrahman Adak ve hatiye latînzekirin. Bnr. Abdurrahman Adak, Kovara Nûbihar, j. 47, 1997.

<sup>75</sup> ŞŞ.

“Piştî veşerê rewşa wî her bi xerabiyê diçe. Şêx Kerbelayî dinivîsîne; lê ew piştî neflikirinê çî nivîsandiye diçirîne. Di odeyekî tarî de şev û roj ew û qelema xwe tena serê xwe ne. Dixwîne, dinivîsîne û dûra diçirîne. Ev nimune bi xwe jî dikare rewşa wê demê ji me re eşkere bike. Şêx Kerbelayî, piştî sirgûniyê têkiliyê xwe bi însanan dibire û di odeyekî reş û tarî de dijî. Di oda wî de tenê şibakeyekî biçûk hebûye. Min oda wî dît. Odeyekî dûr û dirêj bû û her du aliyê odê tije kitêb bûn. Masayekî erdê hebû û der û dora wî jî kitêb tijîbûn. Duwê û hibûr û kaxizê wî di çekmeceyên masê de bûn. Ji ber tevgera Şêx Seîdê Pîranî hatiye sirgûnkirin. Ji xwe çî elaqe wî û tevgerî bi hev re tûnebû. Belku hin pêwendî di navbera wan û Şêx Seîd de çêbûye; lê tevgera Şêx Seîd hê negihaştibû hêla Axtepeyê, hatiye temirandin. Her çiqas tevgera Şêx Seîd negihaştibe hêla başûrê Diyarbekirê jî, hukûmet hemû şêxan û hin şexsiyetên kurd şandiye sirgûniyê. Ji malbata Şêx Hesên jî hinek mezinê me hatine girtin û Kerbelayî jî hatiye sirgûnkirin. Şêx Kerbelayî, ewilî dibin Uşakê, ji wir jî tînin Edeneyê û veşerê xwe de jî naye Aqtepeyê, li Çuliyê dimîne. Eger çî mesele ye, em jî baş pê nizanin. Lê wê demê hema çî nivîsandiye, teva çirandiye. Piştî sirgûniya xwe, hema dinivîsîne û diçirîne...”<sup>76</sup>

### 1. 7. Ji Aliyê Hizrî ve Kerbelayî

Şêx Mihemed Kerbelayî, wekî malbata xwe ji mezheba îmamê Şafiî, li ser eqîdeya îmamê Eş'arî û ji terîqeta Neqşibendî ye.<sup>77</sup> Sîlsîleya wî ya terîqê bi vî awayî ye: Şêx Evdîrehman, Şêx Hesênê Nûranî, Şêx Salihê Sîpkî, Şêx Xalidê Cizîrî û Mewlana Xalidê Şehrezorî. Ew, mirovekî zana û rewşenbîr bû. Li gorî wî ji bo baweriyê tam û exlaqekî baş sê tişt pêwîst in; guhdarîkirina dustûrên dînî, fêrbûna zanistê û hezkirina Xwedê û mirovan. Nemaze di *Mîrsadu'l-Etfalê* de gelek gotinên wî yê wecîz li ser rêya başî, qencî û exlaqê pak hene;

Ku sê ne rahê qencî tu lez ke bê teweqquf

Yekî rahê şerî'et, 'ilim ya dî teşewwuf

Insan niye ê daîma bit tabî'ê keyf û surûr

Herçî ku insan be mudam dê bit ji keyfa nefsê dûr<sup>78</sup>

Wî jî wek bavê xwe li ser bûyera Kerbelayê gelek riste honandine. Di helbesteke xwe de wiha dibêje:

<sup>76</sup> ŞŞ.

<sup>77</sup> Şêx Mihemed Kerbelayî, *Dîwana Kerbelayî*, amd. Osman Akdağ-Kerem Soylu, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol, 2002, r. 7.

<sup>78</sup> Kerbelayî, *Mîrsadu'l-Etfal*, beşa 7an.

Destê teqdîrê ezel der m'eredê qal û bela  
Xil'etî ehmer dida cundan xakê Kerbela

Der ciwarê, erşê heq fushet serayê şeh Husên  
Zerê sûrx e, yek nemet eywanê xakê Kerbela

Name û mexber, qelem l'el û ifada xu nevşan  
Tên tewatûr fetwe ê şeyxanê xakê Kerbela

Der muherrem her sene dar û ber û ax û nebat  
Xwûn dibarînin, ev e nîşanî xakê Kerbela

Sed hezar l'enet dibêjin ser Yezîd û tabî' an  
Behrê wan mezlûmê meqtûlanê xakê Kerbela<sup>79</sup>

Diyar e ku hezkirina ehlê beytê û xemgîniya bûyera Kerbelayê tesîreke mezin li ser malbatê kiriye. Şêx Evdîrehman li ser bûyera Kerbelayê mersiye nivîsandiye.<sup>80</sup> Lewma navê kurekî xwe kiriye “Kerbelayî”, navê yê din jî kiriye “Eskerî”.

Di gelek helbestên Kerbelayî de hezkirina welat û zimanê kurdî li pêş in. Di destpêka dîwana xwe de wiha dibêje:

Ger çî ereb e, tirk e, şahê ecem e emma  
Zanim ku bi kurdmançî sikka xwe li şî' rê da

Minnet ji Xudayê ra sed şukir ji ba xûwê ra  
Gul hinde siyehrûyê sed 'etir bi namê da

Meydan ji medhê xalî dî Kerbelayî halî  
Barî ji fezîletha messahe bi mûrê da<sup>81</sup>

<sup>79</sup> O.Akdağ-K.Soylu, b.n., r. 7.

<sup>80</sup> Şêx Ebdurehman Aqtepi, *Dîwana Ruhi*, amd. Zeynelabidîn Amedî, Diyarbekir, 1982.

<sup>81</sup> Kerbelayî, *Dîwan*, malikên 55-57.

Peywendiya wî bi malê dunyayê re tunebû. Di 25 saliya xwe de dema ku bavê xwe wenda kir, digel israra xwişk û birayên xwe wî para xwe ya mal û milkên mayî negirt û ji bilî pirtûkan hemû di nav wan de parê kirin. Xwarina wî gelek kêmbû, ji malê dernediket, lê belê ji mêvanan jî pir hez dikir. Tenê wî çar çêlek hebûn û ew dabûn gundiyeke ji bo xwedî bike û bi xêra wan aboriya xwe dikir. Pir dixwend û pir jî dinivîsand. Peyveke wî yê wecîz ev e ku dibêje: “*Ez sindoqeke devgirtî hatim û devgirtî çûm*”.<sup>82</sup>

### 1. 8. Rewşa wî ya Medenî

Kerbelayî qet nezewiciye. Heta, gotineke wî jî heye; dibêje:

“*Însan, şêrê berdayî ye. Dizewice dibe şêrê girêdayî. Şêrê girêdayî jî çi qîmet lê namîne.*”<sup>83</sup>

Yek ji sedema nezewicandina wî jî ev e ku, wî xwe bi ilmê ve girêdaye. Ji ber vê yekê nexwestiye jiyana xwe bi yekî din re parve bike. Ji ber ku nezewiciye, li dû xwe tu zarok nehîştine. Her wiha ji ber ku tenê maye li dû xwe tu xelîfe jî nehîştine.

### 1.9. Aliyê wî yê Edebî

Ziman û awayê Kerbelayî dikeve çarçoveya edebiyata klasîk. Berhemên wî yên li ber dest, li gorî awa û cureyên edebiyata klasîk hatine nivîsîn. Kerbelayî berhemên xwe bi kurdî nivîsandine. Lê belê di nav helbestên wî de, hin malik û risteyên bi zimanê erebî, farisî û tirkî jî hene.

Kerbelayî, dîwanek nivîsandiye. Di mêjûya edebiyata kurdî ya klasîk de nemaze di warê ferhengnivîsiya menzûm de ji çar kesan yek e. Ji berhemên wî xuya dibin ku ew gelek di bin karigeriya Melayê Cizîrî, Ehmedê Xanî, Mewlana Xalidê Şehrezorî û bavê xwe Evdîrehman Aqtepeyî de maye.

Digel ku di heyama wî de berhemên kurdî yên nûjen dest pê kiribin jî, der bareyê pêwendiya wî ya bi edebiyata nûjen re tu nîşane li ber destê me nîn in. Jixwe dema em li kovar û weşanên wê demê dinêrin di wan de qet behsa Kerbelayî jî nehatiye kirin. Di weşanên wê demê yên wekî *Kurdistan, Kürd Teavûn ve Teraki Gazetesi, Rojî Kurd, Hetawî Kurd, Yekbûn, Jîn* û *Hawarê* de, bi nav û mexlesên wî, em rastî tu nivîs, helbest an gotarên wî nayên. Di kovara *Kürd Teavûn ve Terakki Gazetesi* de di beşa “*Muhaberat-i Aleniye*” de agahiyek heye ku dibêje Şêx Evdîrehmanê Aqtepeyî bi zimanê kurdî pirtûkeke dîrokê

<sup>82</sup> bnr. Korkusuz, b.n., r. 48. û Akdağ-Soylu, b.n., r. 10.

<sup>83</sup> ŞŞ.

dinivîse.<sup>84</sup> Her wiha di kovara *Hawarê* (1934-1942) de, Herekol Ezîzan (Celadet Alî Bedirxan) di nivîsarek bi sernavê “Klasîkên me, an Şahir û Edîben me yê Kevin” de behsa bavê wî Evdirehmanê Aqtepeyî û berhema wî ya *Rewdu'n-Neîmê* kiriye<sup>85</sup>. Lê belê behsa Kerbelayî nekiriye. Her wiha kesên wek Sidiq Borekeyî Sefîzade<sup>86</sup>, Alaadîn Sucadî<sup>87</sup>, Qanatê Kurdo<sup>88</sup>, Marûf Xeznedar<sup>89</sup> jî di berhemên xwe de behsa wî nekirine. Di xebatên vê dawiyê yê ku ji aliyê kesên wekî Feqî Huseyn Sağniç<sup>90</sup>, Mehmed Uzun<sup>91</sup>, Selîm Temo<sup>92</sup> de agahiyên der bareyê wî de hene. Ev yek bixwe xaleke balkêş e û sedema vê yekê jî bi rastî bi awayekî zelal nayê zanîn. Jiber ku dema mirov li berhemên Kerbelayî dinêre û sedema mişextkirina wî jî li meydanê ye, hingê neagahdarbûna wî ya ji derdorên zana, edebiyatzan, siyasetmedar û çalakgerên kurdan, ihtimaleke lawaz xuya dike.

## 2. Berhemên wî

Heta niha me du berhemên Kerbelayî tesbît kirine. Kerbelayî berhemdariya xwe ya di dema xortaniya xwe de dewam nekiriye. Diyar e ku salên mişextbûnê, tesîreke gelek xerab li ser wî çêkiriye. Du salên wî yê li derveyê welat ew gelek êşandiyê. Şêx Kerbelayî, piştî mişextiyê, têkiliya xwe bi insanen re biriye û di odeyekî reş û tarî de jiyaye. Tê gotin ku wî çî dinivîsandin hema tenê carekê dixwendin û diçirandin diavêtin. Heta Şêx Eskeriyê birayê wî gelek hewl daye ku hin ji wan hilîne lê ev yek nekariye pêk bîne.<sup>93</sup> Li gorî agahiyên li ber dest, wî pêşî *Mîrsadu'l-Etfalê* û piştî *Diwanê* nivîsandine. Lê belê ji ber ku *Mîrsadu'l-Etfal* mijara teza me ye, em ê pêşî *Diwanê* û piştî wê *Mîrsadu'l-Etfalê* bidin nasîn.

### 2. 1. Dîwan

Kerbelayî helbestvanekî xwedî dîwan e. Tarîxa nivîsandina dîwana wî tam ne diyar e, lê belê li gorî Şêx Şafî, wî *Mîrsadu'l-Etfal* û *Dîwanê* li pey hev nivîsandine. Li gorî çavkaniyên li ber dest, bi ihtimaleke xurt sala 1333k/1914z<sup>94</sup> e. *Dîwana Kerbelayî* cara pêşî bi tîpên erebî di sala 1980yan de li Diyarbekirê ji aliyê Diljar Zeynelabidîn ve digel pêşgotineke

<sup>84</sup> Kürd Teavün ve Terakki Gazetesi (Rojnameya Hevkarî û Pêşketina Kurdan), j. 6., İstanbul, 1909, r. 27.

<sup>85</sup> Hawar, j. 33, Şam, 1941, r. 15.

<sup>86</sup> Sidiq Borekeyî Sefîzade, *Mêjûyî Wêjeyî Kurdî*, Tebrîz, 1951.

<sup>87</sup> Eladin Secadî, *Mêjûyî Wêjeyî Kurdî*, Çapxaney Mearîf, Bexda, 1952.

<sup>88</sup> Qanatê Kurdo, *Tarîxa Edebiyata Kurdî*, Weşanên Lîs, Diyarbekir, 2010.

<sup>89</sup> Marûf Xeznedar, *Mêjûyî Edebî Kurdî*, Hewlêr, 2001.

<sup>90</sup> Feqî Huseyin Sağniç, *Dîroka Wêjeya Kurdî*, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, 2002, n.r. 491-493.

<sup>91</sup> Mehmed Uzun, *Antolojiya Edebiyata Kurdî*, Weşanên Aram, Stenbol, 2003, r. 91.

<sup>92</sup> Selim Temo, *Kürt Şiir Antolojisi*, Agora Yayınevi, İstanbul, 2007, c. I, r. 616; c. II, r. 1461.

<sup>93</sup> ŞŞ.

<sup>94</sup> Zeynelabidîn Zinar, *Mîrsadu'l-Etfal*, r. 8.

kurt hatiye çapkirin.<sup>95</sup> Li gorî beyana Zeynelabidîn, wî di xebata xwe de nusxeya daner esas girtiye.<sup>96</sup> Ev pêşgotin ji aliyê Abdurrahman Adak ve di sala 1997an de hatiye latînîzekirin.<sup>97</sup> Li gorî vê pêşgotinê jî, tarîxa nivîsandina *Dîwanê* sala 1914 ye. Piştî Osman Akdağ û Kerem Soylu digel latînîzekirinê, ferhengok li dawîya wê zêde kirine û bi vî awayî di sala 2002yan de ji aliyê Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê hatiye çapkirin<sup>98</sup>. Kerem Soylu, di *Kovara Zendê* de gotarek jî li ser wê nivîsandiye.<sup>99</sup> Her wiha wek beşekê, di nav *Dîwana Camî* de, ku ji aliyê Ehmed Hilmî Qoxî ve hatiye amadekirin, di sala 2004an de ji aliyê Weşanên Îhsanê bi tîpên erebî li Stenbolê hatiye çapkirin.<sup>100</sup>

*Dîwan* bi awayekî serkevî bi kêşa erûzê hatiye nivîsîn. Kerbelayî di dîwana xwe de bi piranî wek awayên nezmê, cureyên xezel û qesîdeyê bi kar anîne. Li nik wê, awayên nezmê yên wekî mulemme, muxemmes û texmîs jî hatine bikaranîn. Di dîwanê de destpêkek bi awayê qesîde, 39 beş bi sernavê “Goftarî Kerbelayî”, sê texmîsên wî li ser xezelên Mewlana Xalid, texmîseke wî li ser xezela Melayê Cizîrî û nameyeke wî ya hîcwî ya bi tirkî hene. Helbestên wî bi piranî bi kurdî ne û wek helbestkarên kurdan ên berê xwe, bi giranî devoka Botî bi kar anîye. Beşên 3, 11, 12, 13, 14, 17, 18, 20, 25, 28, 33 û 39an xwerû bi farisî ne. Beşên 11, 18, 20 û 25 muxemmes in. Beşa 39an mersiyyek li ser şîna Mihemed Şewketê kekê xwe ye. Beşa 22yan mulemme ye, risteyek jê bi kurdî, ya dî jî bi erebî ye.

Ji aliyê naverokê ve, di *Dîwanê* de mijarên wekî tesewuf, evîna mîstîk û metaforîk, kesayetên navdar, bûyerên tarîxî, siyasî û civakî, rewşa wî ya taybet, şîn û rexne hene.

Di edebiyata kurdî ya klasîk de dîwana Kerbelayî mînakeke berbiçav e. Wî, zimanekî wecîz û alegorîk bi kar anîye. Kerbelayî, helbestên xwe, bi hunerên edebî yên wekî mecaz, teşbîh, îstîiare û telmîhê ve xemilandine. Di helbestên wî de wekî cureyên edebî, tewhîd, munacaat, pendname û hîcwiye hatine bikaranîn.

## 2. 2. Mîrsadu'l-Etfal

*Mîrsadu'l-Etfal* wekî ku di qeyda wê ya ketebeyê de jî diyar dibe, di sala 1331/1912yan de li Medreseya Aqtepeyê hatiye nivîsîn. Nusxeya kurdo-erebîk a ku bi destê Şêx Mihemed Kerbelayî hatiye nivîsîn, gihaştîye roja me û li cem biraziyê wî Şêx Şafî tê

<sup>95</sup> Hevdîtina bi Mela Zeynelabidîn (Zeynelabidîn Çîçek) re, Diyarbekir, 13.07.2012.

<sup>96</sup> Mela Zeynelabidîn, heman hevdîtîn.

<sup>97</sup> Bnr. “Mihemed Kerbelayî”, *Kovara Nûbihar*, j. 47, r. 17-18.

<sup>98</sup> Şêx Mihemed Kerbelayî, *Dîwana Kerbelayî*, amd. Osman Akdağ-Kerem Soylu, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, 2002.

<sup>99</sup> Kerem Soylu, “Şêx Mihemed Kerbelayî”, *Kovara Zend*, j. 8, 2005. n.r. 58-60.

<sup>100</sup> Ehmed Hilmî Koxî, *Dîwana Camî*, Îhsan Yayınları, İstanbul, 2004.

parastin. Destxet bi temami 42 rûpel e. Em dê di beşa sêyem de taybetiyên destxetê bidin nasîn.

Du navên vê berhemê hene. Yek jê *Mîrsadu'l-Etfal* û yê din jî *Şahrahê Kûdekan* e. *Mîrsad* (مرصاد) bêjeyeke erebî ye û wateya wê “cihê çavdêriyê” ye. Etfal (اطفال) jî bêjeyeke erebî ye û pirjimara tiftl (طفل)ê yanî zarokê ye. Her du bi hev re tên wateya “cihê çavnêriya zarokan” an jî “nêrîngeha zarokan”. Di çapa Mele Zeynelabîdîn de li berga pêşî ya pirtûkê wiha nivîsandiye: “*Haza kîtabû Mîrsadu'l-Etfal ew Şahrahê Kûdekan*”.<sup>101</sup> *Şahrahê Kûdekan* ravekek bi farisî ye. *Şahrah* bi kurdî “riya mezin”e. *Kûdekan* pirjimara *kûdekê* ye û wateya wê “zarok”e. Her du bi hev re tê wateya “riya mezin a zarokan”. Lê belê di nusxeya daner de, di nav serlewheya rûpela pêşî de ev îbare jê çûye û baş nayê xwendin.

*Mîrsadu'l-Etfal* ji aliyê Diljar Zeynelabîdîn (Mele Zeynelabîdînê kurê Mele Remezan), bi tîpên erebî ji nû ve hatiye nivîsîn û di sala 1980yan de li Diyarbekirê hatiye çapkirin<sup>102</sup>. Li gorî agahiyên ku Mele Zeynelabîdîn da me, wî li ber destxeta daner îstînsax kiriye.<sup>103</sup> Mele Zeynelabîdîn rûpelên destxetê ji nû ve bi numare kirine. Her wiha wî numareyên bêjeyên kurdî û farisî, ji nû ve rêz kirine. Lê belê di navbera nusxeya destxetê û ya Mele Zeynelabîdîn de hin cudahî xuya dikin. Di nivîsandina hin bêjeyan de şaşî û kêmasî hene. Ji ber ku hin bêje, kêma û bi şaşî hatine nivîsîn, di raveyên têbiniyan de jî hin şaşî çê bûne.

Di sala 1988an de, Zeynelabîdîn Zinar (Kaya), nusxeya Mele Zeynelabîdîn a kurdo-erebîk veguhast bi bal tîpên latînî ve û li Stockholmê çap kir<sup>104</sup>. Zinar li dawiya pirtûkê, ferhengok jî amade kiriye. Her wiha wî wêneyeke Mihemed Kerbelayî jî xistiye rûpela pêşî ya vê çapê. Temami pirtûka Zinarî 75 rûpel in. Ji ber ku Zinar, nusxeya Mele Zeynelabîdîn esas girtiye, di latînzekirin û ravekirina hin bêjeyan de, heman şaşî û kêmasî dewam kirine.

Di *Kovara Kurmancî* de ferhengokek ji hin bêjeyên *Mîrsadu'l-Etfalê* hatiye weşandin.<sup>105</sup>

Di sala 2010an de Tehsîn Îbrahîm Doskî, bi navê *Du ferhengê Vehandî: Nûbehar û Mîrsadu'l-Etfal*, bi alfabeya erebî ya kurdiya başûr, ew ji nû ve çap kir.<sup>106</sup> Doskî jî di vê xebatê de nusxeya Mele Zeynelabîdîn esas girtiye.<sup>107</sup>

<sup>101</sup> Kurdiya wê ev e: “ev pirtûk *Mîrsadu'l-Etfal* e, ew riya mezin a zarokan e”.

<sup>102</sup> Diljar Zeynelabîdîn, *Mîrsadu'l-Etfal weyaxud Şahrahê Godekan*, Diyarbekir, 1980, bi tîpên erebî.

<sup>103</sup> Mele Zeynelabîdîn, heman hevdiin.

<sup>104</sup> Zeynelabîdîn Zinar, *Mîrsadu'l-Etfal Etfal (Amadegeha Zarokan)*, Weşanên Jîna Nû, Stockholm, 1988.

<sup>105</sup> Zeynelabîdîn Zinar, “Ferhengoka *Mîrsadu'l-Etfalê* ya Şêx Mihemed Kerbelayî”, *Kovara Kurmancî*, j. 11, Parîs, 1992.

<sup>106</sup> Tehsîn Îbrahîm Doskî, *Du Ferhengên Vehandî Nûbihar û Mîrsadu'l-Etfal*, Çapxaneya Spîrêz, Hewlêr, 2010.

<sup>107</sup> Doskî, h.b., r. 50.



Me di vê xebatê de nusxeya kurdo-erebîk a daner esas girt. Dema ku me ev nusxe transkrîbe dikir, nusxeyên Mele Zeynelabîdîn, Zeynelabîdîn Zinar û Tehsîn Îbrahîm Doskî jî di ber çava re derbas kirin.

Digel berawirdkirina nusxeya daner, çend mînak ji hin kêmasî û cudahiyên her du nusxeyên navborî, li jêr hatine rêzkerin:

Malik	Nusxeya Daner*	Nusxeya MZA**	Nusxeya Latîni ZZ***
28	داور و شیدز	داور شیدز	werşeydez
29	مهر و روژ	مهر و روژ	nîne, yanî nehatiye nivîsîn
29	خوژر	خور	xûr
35	راهر و	راهور	rahwer
35	پیشوا	پیشوار	pîşîwar
39	مهتر	مهتر	mîhter
47	دفعه	دفع	def <sup>c</sup>
68	قواص	قواص	agahiyên têbiniyê şaş in
87	پیغاله	پیغاله	peyxale
87	پیغاره	پیغاره	peyfare
123	تغار	تغار	tefar
161	ضفضع	ضفضع	dexdex
173	جھی ژۆر	جھی روژ	cihê jor
248	چغامه	چغامه	çefame

*Mîrsadu'l-Etfal*, ferhengeke menzûm a kurdî-farisî ye. Ji destpêkek û 15 beşan (qit'e) pêk tê. Beşa dawiyê berovajî yên berê xwe bi sernav e û sernavê wê *Metlebu'l-Murekkebat* e. Li ser bergê destxetê çend malik bi awayê mesnewiyê hene ku baş nayên xwendin.

Wî jî mîna Ehmedê Xanî, 14 beşên ferhengê wek “qit'e” bi nav kirine. Piştî destpêkê wî dest bi ferhengê kiriye. Girîzga û xatîmeya bi sernavê *Metlebu'l-Murekkebat* ne ji qismê ferhengê ne. Wek pêşgotin û gotina dawî hatine nivîsîn. Beşa dawî, xwedî fonksiyona hîndariyê ye jî. Di hin malikên wê de risteyek bi kurdî, risteyek bi farisî ne ku wergera hevudû

\* Nusxeya destxetê ya Kerbelayî bi xwe ye.

\*\* Nusxeya Mele Zeynelabîdîn.

\*\*\* Nusxeya Zeynelabîdîn Zinar.

ne. Yên din jî bi tamamî bi kurdî hatine nivîsîn. Di rêzkirina bêjeyan de pergaleke birêkûpêk nîne. Bêje geh bi farisî, geh bi kurdî dest pê dikin. Carina jî risteyek bi tamamî farisî, ya din tamamî bi kurdî ye.

Di nusxeya daner de ji bilî girîzgahe û xatîmeyê, di tamamê beşan de piştî malika pêşî di malikên din de, wî li ser her bêjeyeke farisî tîpa (f-ف)yê, li ser yên kurdî tîpa (k-ك)yê daniye. Bi heman awayî, ew bi numare kirine û numareya wan di binê bêjeyan de nivîsandine. Di destpêka beşên qismê ferhengê de li kêleka rastê bi navê “ebyat” yanî malik û li kêleka çepê jî bi navê “luxat” yanî bêje, hejmarên wan ên giştî nivîsandine. Bi vî awayî li gorî hesabê wî di qismê ferhengê de bi giştî 320 malik û 1155 bêje hene. Li gorî lêkolîna me hejmara bêjeyên kurdî li dor 1250 ne, lê belê ji her duyan jî bêjeyên dubarekirî hene. Di serê her beşekê de wekî *Nûbehara Ehmedê Xanî*, bi gotineke wecîz a kurdî destpê kiriye û piştî navê tefileyên wan ên qalibê erûzê nivîsandine. Tenê di beşa 4an de gotina wecîz xwerû bi zimanê farisî ye.

Kerbelayî, di destpêka berhemê de, piştî besmele, hemd û selewatan bi awayekî eşkere nav û sedema amadekirina berhemê diyar dike. Kerbelayî, dûre behsa girîngî û taybetiya zimanê farisî dike. Li gorî wî zarokên ku bi zimanê farisî zanibin dê di warê zanistî û edebiyatê de gelek serkevtî bin:

D/13 Ku da newrestegan û newnihalan  
Melekîb’anê kurdan pur şepalan

D/14 Bikin se’yê di vê mirşadê eqser  
Bigîjin meqşed û rahê di enwer

D/15 Çikû ezmanê fursê pur ‘ecîb e  
Kesê ku zanibe gâyet edîb e

D/21 Nebin bêbehre ez deryayê pur durr  
Ji behrê fursê derxin gewherê pur

Di dawiya destpêkê de hêvî dike ku kesên ku dema li ser vê ferhengê dersê dixebitin, bila jê re dia bikin û wî ji gunehan xelas bikin:

D/23 Di weqtê dewr û ders û se' y û tekrar  
Bibêjin, ey gelî aġayê kubbar

D/24 Eşîmê Kerbelayî hûn rica kin  
Ji bin barê guneh wî wariha kin

Di xatîmeyê de, helbestkar efû û mexfîreta xwe ji Xwedê daxwaz dike û dibêje ji ber şaşî û kêmasiyên vê berhemê bila kes wî şermezar meke, ji ber ku ev ferheng ne ji bo kesên şareza û hunermend, tenê ji bo zarokan hatiye amadekirin:

15/21 Bi hêvî min rica ye şed hezar car  
313 Ku nekne herfêgîrî ser minê jar

15/22 Bi şefqet çav bidin Mirşadê Etfal  
314 Qebûl kin bo tîfalan ba heme hal

15/23 Nebêjin nadurust e naseza ye  
315 Ji bo etfalê re aneq rewya ye

15/24 Ne bo ehlê hunerkanê me' arîf  
316 Heqîqetdan û enwa' ê teşarîf

Ji aliyê rêzkirina bêje, pergala kêş û bikaranîna wecîzeyên di nav qit'eyan de, Kerbelayî rêbaza *Nûbehara Biçûkan* a Ehmedê Xanî şopandiye. Jixwe Kerbelayî, ev yek bi awayekî eşkere di beşa destpêkê de diyar kiriye:

Me her wek "Newbihar" a Şêxê Xanî  
Esasê wê ji bo etfala danî

Ji hin rave û tîbiniyên wî yên li ser nusxeya destxetê jî tê fehmkirin ku di hîlbijartina bêjeyan de, wî bêtir ji *Burhanê Qatî*<sup>108</sup> sûd wergirtiye.

### 2. 3. Di Ferhengnivîsiya Menzûm de Kerbelayî û Cihê Mîrsadu 'l-Etfalê

Li gorî agahiyên li ber dest, di edebiyata kurdî ya klasîk de heta niha çar ferhengên menzûm ên çendzimanî hene. *Nûbehara Biçûkan* û *Luxetnameyî Ehmedî* bi kurdî-erebî ne, *Gulzar* bi kurdî-erebî-farisî ye û *Mîrsadu 'l-Etfal* jî bi kurdî-farisî ye. Yanî sê heb duzimanî ne. Ji van du heb kurdî-erebî, hebeke jê kurdî-farisî, hebeke jî sêzimanî ye. Wekî me li jorê jî got, çêdibe ku ferhengên menzûm ên kurdî yên din jî hebin.

*Nûbehara Biçûkan* wek yekem ferhenga menzûm a kurdî tê qebûlkirin.<sup>109</sup> Li gorî lêkolînên me *Mîrsadu 'l-Etfal* jî di vî warî de ya dawîn e. Ji ber ku me *Gulzara Îsmâîlê Bazîdî* peyde nekir, me nekarî wê bi yên din re bidin ber hev. Li gorî lêkolîna me ya li ser her sê ferhengên din, em gihaştin van tesbîtan.

#### 1) Hejmara Beş, Malik û Bêjeyên wan

*Nûbehara Biçûkan* ji destpêkek û 13 beşan pêk tê. Hejmara malikên wê 220 in û tê de nêzîkî 1000 bêjeyên erebî digel kurdiya wan hene.

*Luxetnameyî Ehmedî* ji destpêkek û du beşên mezin pêk tê. Hejmara malikên wê 370 ne û tê de nêzîkî 1350 bêjeyên erebî digel kurdiya wan hene.

*Mîrsadu 'l-Etfal* ji destpêkek, 14 beşên ferhengê û beşa xatîmeyê pêk tê. Hejmara malikên wê 320 in û tê de 1155 bêjeyên farisî digel kurdiya wan hene.

Li gorî pîvanên tertîbî yên ferhengên menzûm ku di beşa destpêkê de hatibûn diyarkirin, ji aliyê qewareyên xwe ve her sê jî ferhengên navincî ne.<sup>110</sup>

#### 2) Destpêkirina bi Besmeleyê

Xanî û Kerbelayî bi '*Besmele*'yê, dest bi berhemên xwe kirine. Nodeyî bi risteya "Be namî Xudayî heyî layemût" dest pê kiriye. Kerbelayî '*Besmele*' cuda nivîsandiye. Xanî, ew wek risteya yekem a malika pêşî nivîsandiye. Destpêkên wan bi vî awayî ne:

Xanî                      Bismillahirrahmanirrahîm

<sup>108</sup> *Burhan-i Qatî* yek ji girîngtirîn û navdartirîn ferhengeke farisî-farisî ye ku di sedsala 17. de li Hindîstanê ji aliyê Muhammed Huseyin b. Halef et-Tebrizî hatiye amadekirin ku mexlesa wî Burhan e. Tê de ji bîst hezarî zêdetir bêje hene. Bnr. Mütercim Asım Efendi: *Burhan-ı Qatî*, amd. Mürsel Öztürk, Derya Örs. TDK, Ankara, 2008.

<sup>109</sup> Yıldırım, *Nûbehara Biçûkan*, r. 10.

<sup>110</sup> Öz, b.n., vgz. Ahmet Kartal, b.n., r. 24.

Mebdeê her ilmekî navê ‘Elîm

Nodeyî      Be namî Xudayî heyî layemût  
Perwerdigarî mulk û melekût

Kerbelayî      Bismillahirrahmanirrahîm we bihi neste‘în  
Bi ismê padişahê ‘alemaray  
Bi hemdê zî‘l-celal nuţqêbexşay

### 3) Naveroka Destpêkê

Naveroka destpêkên her sê berheman jî pêşî mijarên dînî ne. Piştî sedema nivîsandina berhemê, giringî û mifaya hînbûna ziman hatine nîşan dan. Destpêkên *Nûbehar* û *Mîrsadu‘l-Etfalê* bi hêvî, şîret, daxwazî û diayan diqedin. Lê Nodeyî behsa tertîb û mijarên berhema xwe kiriye. Di her sêyan de jî destpêk, ne ji beşa ferhengê ne.

### 4) Binavkirina Sernavên Beşan

Xanî û Kerbelayî beşên ferhengê wek “qit‘e” bi nav kirine. Wan sernavê “qit‘e”yê di wateya beş û bir de bi kar anîne. Lê Nodeyî sernavê beşan wek “bab” bi kar anîye. Nodeyî ferhenga xwe kiriye du bab: “El-babu‘l-ewwel fî tercemeti‘l-esm”a û “El-babu‘s-sanî fî tercemeti‘l-cem‘î‘l-ef‘al”.

Di qismê ferhengê de *Nûbehar* û *Mîrsadu‘l-Etfal* bi malikên wecîz û kêşê dest pê dikin. Ev awa di *Ehmedî* de nîn e. Qismê ferhengê ya *Nûbehar* û *Ehmedî* heta beşa dawiyê dewam dikin, lê di *Mîrsadu‘l-Etfalê* de beşa dawiyê ya bi sernavê *Metlebu‘l-Murekebat* ne ji qismê ferhengê ye û bi awayekî duzimanî hatiye nivîsîn. Kerbelayî di vê beşê de hin riste xwerû bi farisî û dûre jî wergerên wan ên bi kurdî dane, ku mirov dikare wan wek rahênan bihesibîne. Ev yek jî aliyê wê yê pedagojîk ê xurt nîşan dide.

### 5) Cureyên Behrên Erûzê

Xanî û Kerbelayî di serê her beşê de digel du malikên pêşî cureyên behrên erûzê û raveya tefileyên wan kirine. Ev rêbaz di Nodeyî de nîn e. Wî tenê piştî malika 290an, ji bo diyarkirina kêşa malikan çend sernav nivîsandine. Wek “Qit‘eyê dîger ez behrê remel”,

“Qit‘ eyê dîger ez behrê mensûc”<sup>111</sup> û “Qit‘ eyê dîger ez behrê muteqarib”. Lê belê tefileyên wan nîn in.

Behrên ku her sê nivîskaran bi kar anîne bi vî awayî ne:

Xanî: Recez-Hezec-Remel-Muzari‘ -Besît- Serî‘ -Muteqarib

Nodeyî: Remel-Hezec-Munserih-Muteqarib

Kerbelayî: Hezec-Recez-Munserih- Serî‘ - Remel- Muzari‘ -Wafir- Muteqarib

Behrên “munserîh” û “wafir” di *Nûbeharê* de nehatine bikaranîn, her wiha Kerbelayî jî behra “besît”ê bi kar neaniye.

Der bareyê bikaranîna kêşa erûzê ya *Luxetnameyî Ehmedî* de raman û dîtînen cuda hene. Lê belê hêjayî gotinê ye ku Nodeyî sernavê beşekê, wek “qit‘ eyî der meqamî goranî” bi nav kiriye.

## 6) Nezm û Qafiye

Destpêka *Nûbehara Biçûkan* musecc‘ e yanî pexşanî ye. Xanî, beşên navber bi awayê xezelê, beşa yekem û dawîn bi awayê mesnewiyê hûnandiye.

Nodeyî, di binbeşa bi sernavê “Babekî tir” de, di navbera malikên 296an heta 315an de awayê xezelê bi kar aniye. Her wiha di beşa dawiyê ya bi sernavê “Babu’l- Ef‘al” de ji bilî du malikên dawiyê yên ku bi awayê mesnewiyê ne, awayê xezelê bi kar aniye. Di destpêk û temamê beşên din de wî awayê mesnewiyê bi kar aniye.

Kerbelayî di *Mîrsadu’l-Etfalê* de ji bilî destpêk, beşa çardemîn û beşa dawiyê, di temamê beşên din de awayê xezelê bi kar aniye. Destpêk, beşa çardemîn û beşa dawiyê bi awayê mesnewî hatine hûnandin.

## 7) Zimanê wan

Di *Nûbeharê* de destpêk û beşa yekem ji aliyê vegotinê bi temamî kurdî ne û ne ji qismê ferhengê ne. Her wiha sê malikên dawiyê ya beşa dawîn a qismê ferhengê jî bi erebî ne.

Di *Luxetnameyî Ehmedî* de beşa destpêkê sê malik û nîv jê bi temamî erebî, yên din jî bi farisî ne. Di beşên navber de zimanê vegotinê geh bi kurdî, geh bi farisî ye.

Di *Mîrsadu’l-Etfalê* de vegotina destpêkê bi temamî kurdî ye, beşa dawî piranî bi hevokên kurdî û hinek jî bi farisî ne. Her du beş jî ne ji qismê ferhengê ne.

<sup>111</sup> Herçend “mensûc” nivîsandiye jî, di kêşa erûzê de behreke bi vî navî nîn e. Li gorî Ebdirezaq Bîmarî, bi ihtîmaleke mezin منسرح (munserih) guheriya bûye منسوح (mensûc) û bi vî awayî maye. Bnr. Bîmarî, g.n., r. 68.

## 8) Sedemên Nivîsandina wan

Her sê nivîskar jî, di destpêka berhemên xwe de navên berhemên xwe, sedemên nivîsandina wan û ji bo kê nivîsandine diyar kirine. Xanî, wiha dibêje:

Vêk êxistin Ehmedê Xanî  
Navê Nûbehara Biçûkan danî

Ne ji bo sahibrewacan  
Belkî ji bo biçûkê kurmancan<sup>112</sup>

Nodeyî, ji bo kurê xwe Ehmed nivîsandiye ku wiha diyar kiriye:

Der îna risale be kurdî zuban  
Mîkonem zuban-i ‘ereb ra beyan

Ta ke ferzendam Ehmed bê te‘eb  
Şevê danayî lûgatî ‘ereb<sup>113\*</sup>

Kerbelayî, bi giştî jî ji bo temamê zarokên kurdan û bi taybetî jî, ji bo birayê xwe Muhemmed Eskerî û biraziyê xwe Neqşibendî nivîsandiye.

Me pev xist û di nav hev kirne telfîf  
Ji bo eclê ku da bit sehl û texfîf

Li ser etfal û ewladê di kurdan  
Lîsanê farisî û meqsedê wan

Bi Mîrsadu’l-Tifal min kirye nîşan  
Ji mewla min rica ye nef’ê îşan

Xisûsa ez miyanê wan du şebaz  
Hesîbanê nesîbanê serefrâz

---

<sup>112</sup> Ehmed Hilmî Qoxî, *Gulzara Hemûkan*, Weşanên Sûrê, Diyarbekir, 1991, r. 17.

<sup>113</sup> M. E. Muhemmed, *Kitêbî Ehmedî*, r. 18.

\* Ev malik bi farisî ne, kurdiya wan ev e: *Di vê pirtûka bi zimanê kurdî de/ Zimanê erebî rave dikim/ Ji bo ku kurê min Ehmed bêdijwarî/ Bibe zanayê zimanê erebî.*

Muhemmed Eskerî yû Neqşibendî

Ew in ‘îlet ji vê tertîb û bendî

Yekî nefsê bira ye pur temîz e

Biraderzade ye dîger ‘ezîz e<sup>114</sup>

Xanî, berhema xwe diyarî hemû zarokên kurdan kiriye. Kerbelayî, bi awayekî giştî ji bo zarokên kurdan û bi taybetî jî ji bo du kesan nivîsandiye. Yek jê birayê wî Mihemed Eskerî, yê din jî biraziyê wî Neqşibendî ye. Nodayî, ji bo kurê xwe Ehmed nivîsandiye. Li vir diyar e ku Xanî û Kerbelayî bi asoyeke fireh û bi hestiyariyeke giştî tevgeriyane. Lê belê Xanî navê tu kesan hil nedane, wî berhema xwe ji bo temamê zarokên kurdan amade kiriye.

Xanî û Kerbelayî di destpêkê de li ser mifadarî û girîngiya hînbûna zimên jî sekinîne.

Xanî û Kerbelayî di beşa dawiyê de bi hesabê ebcêdê tarîxa nivîsandina berhemên xwe diyar kirine.

Xanî di dawiya Nûbeharê de tarîxa nivîsandina berhema xwe wiha daye:

Evrengehe dibêjit Xanî: Eger tu bîzani

Bifikire li kitêba sanî di cildê ewwel da

Ji cuz’ê aşir di wereqa çarê da

Ji sehîfa destê rastê, di setra salis da

Ji kelîma sanî bigre tu herfa çarê

Ew e tarîxa Nûbeharê

Ji van îfadeyan tarîxa nivîsandina *Nûbeharê* wiha derdikeve:

Kitêba sanî: 1000, Cildê ewwel: 100, Cuz’ê aşir: 90, Wereqa çarê: 4, yanî sala 1094a koçî.

*Sehîfa destê rastê*: şeş mehên ewil

*Setra salis*: meha sêyem a ji şeş mehên ewil

*Kelîma sanî*: deh rojên ewil ê meha Rebû’l-ewwel

---

<sup>114</sup> Mihemed Kerbelayî, *Mîrsadu’l-Ûfal*, Nusxeya daner, r. 3-4.



*Herfa'çarê*: çar roj, yanî bû 14ê meha Rebû'l-ewwel

Li gorî vê hesabê, tarîxa temamkirina *Nûbeharê*, 14ê Rebulewwela sala 1094an e. Ev jî beramberî tarîxa 1683 zayînî tê.<sup>115</sup>

Kerbelayî di beşa *Metlebu'l-Murekkebatê* de bi hesabê ebcedê di nav malika 317an de, tarîxa temamkirina berhema xwe wiha diyar kiriye:

Me anî qeçî' kir Mirşadê Tîfla

Di salê meş'emet îqbalê "Şegla"

Di vê malikê de di risteya duyem de ji peyvên "Şegla" û "Îqbal"ê bi hesabê ebcedê tarîxa nivîsandina *Mîrsadu'l-Etfalê* derdikeve:

şegla شغلا

ش : 300

غ : 1000

ل : 30

ا : 1

Dema em reqemên li hemberî herfên vê peyvê kom dikin, giş bi hev re dikin 1331, yanî di sala 1331ê koçî de ev berhem hatiye nivîsandin..

iqbal اقبال

ا : 1

ق : 100

ب : 2

ا : 1

ل : 30

Dema em reqemên li hemberî herfên vê peyvê kom dikin, giş bi hev re dikin 134, yanî roja sêzdehê meha çaran.

Bi vî awayî li gorî hesabê ebcedê derdikeve holê ku nivîskar berhema xwe di sala 13.04.1331ê koçî de nivîsandiye. Ev jî beramberî tarîxa 1912-1913a zayînî tê.<sup>116</sup> Yıldırım jî vê tarîxê wek 1912 hesabandiye.<sup>117</sup>

<sup>115</sup> Yıldırım, *Nûbehara Biçûkan*, r. 325.

<sup>116</sup> Z. Zinar, *Mîrsadu'l-Etfal*. r. 8.

Nodeyî tarîxa nivîsandîna *Luxetnameyî Ehmedî* diyar nekiriye. Yanî wî hesabê ebedê bi kar neaniye.

Li gorî van agahî û vekolînan, derdikeve holê ku her sê berhem jî, ji gelek aliyan, xwedî taybetiyên hevpar in. Lê belê *Mîrsadu'l-Etfal* û *Nûbehara Biçûkan* ji aliyê rêbazê ve bêtir nêzî hev in. Lewra Kerbelayî berhema xwe di bin karîgeriya berhema Xanî de nivîsandiye.

## BEŞA DUYEM

### VEKOLÎNA MÎRSADU'L-ETFALÊ JI ALIYÊ TEŞE, NAVEROK Û ZIMAN VE

#### 1. JI ALIYÊ TEŞEYÊ VE

*Mîrsadu'l-Etfal* berhemeke menzûm e. Berhem bi çend awayan ve hatiye hûnandin. Ji ber ku di dawiya beşa yekem de me behsa taybetiyên wê yên tertîbî kir, em dê wan li vir dubare nekin. Li jêr em dê li ser awayên nezmê yên ku di *Mîrsadu'l-Etfalê* de hatine bikaranîn rawestin.

#### 1. 1. Awayên nezmê

*Mîrsadu'l-Etfal* ji destpêkek, 14 beşên ferhengê û beşa dawiyê ya bi sernavê *Metlebu'l-Murekkebatê* pêk tê. Ji destpêkê heta beşa dawiyê awayên nezmê wiha ne:

#### 1. 1. 1. Mesnewî

---

<sup>117</sup> Yıldırım, b.n., r. 77.

Wek têtîneke edebî, mesnewî ew teşeyê nezmê ye ku du risteyên her malikeke wê bi awayê (aa-bb-cc...) di nav xwe de bi qafiye ne.<sup>118</sup> Binyada nezmê ya destpêk, beşa çardemîn û beşa dawiyê ya *Mîrsadu'l-Etfalê* bi awayê mesnewiyê hatine dariştin. Her du beş jî ne ji qismê ferhengê ne. Ji bo awayê mesnewiyê mînak ji beşa çardemîn wiha ne:

14/16 Tebîr û tebîre dohol tebl û kûs

243 Def in ew, hewa û hewes çî ye? Hûs

14/17 Xeberdanê bêhûde tamat û laf

244 We hem qaf û zal û dirûg û gezaf

### 1. 1. 2. Xezel

Xezel, ew teşeyê nezmê ye ku du risteyên malika pêşî di nav xwe de û malikên pişt re jî risteyên pêşî serbest, yên duduyan bi malika pêşî re bi qafiye ne. Awayê nezmê ya xezelê (a-a, x-a, x-a, x-a, x-a ..) ye.<sup>119</sup> Di *Mîrsadu'l-Etfalê* de wekî li jorê jî hat gotin, ji bilî destpêk, beşa çardemîn û beşa dawiyê, di temamê beşên din de qafiye bi awayê xezelê hatine dariştin. Lê di her beşekê de qafiyeya xezelê du caran hatiye cîbicîkirin. Ew jî du kategorî ne:

**1) Malikên wecîze û kêşê:** Malika pêşîn a her beşê (qit'e) ji wecîzeyeke bi pend û şîretê, malika duyem jî, ji cureyê behrê ya ku kêşa beşê nîşan dide pêk tê. Di her beşekê de ev her du malik wek du malikên pêşîn ên xezelekê bin, hatine qafiyekirin. Yanî malika wecîzeyê di nav xwe de bi qafiye ye, lê belê risteya pêşî ya malika kêşê serbest e û risteya duyem bi malika wecîzeyê re bi qafiye ye. Mînak malikên wecîze û kêşê yên beşa yekem bi vî awayî ye:

Malika wecîzeyê: ' Ilim ez behrê insan dewletê dunya û ' uqba ye (a)

Kesê ' alim muheqqeq tacidarê her du dunya ye (a)

Malika kêşê: Mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun (b)

Hezec salim musemmen bit şehîbê durrê yekta ye (a)

<sup>118</sup> İskender Pala, *Ansiklopedik Divan Şîri Sözlüğü*, L&M Yayınları, İstanbul, 2003, r. 321.

<sup>119</sup> h.b., r. 176.

**2)Beşên ferhengê yên di navbera 1 û 14an de:** Di beşên navbera 1 û 14an de piştî her du malikên pêşîn wekî qismê ferhengê dest pê kiriye ku di wan de bêje kurdî-farisî an farisî-kurdî hatine rêzkirin. Ev bi qafiyeya xezeleke nû hatine qafiyekirin. Wekî mînak; malikên sêyem û çarem ên ku piştî malikên wecîze û kêşê yên beşa yekem û pêncem li jêr hatine nîşandan:

*Beşa yekem*

Malika sêyem Bizan navê **Xudê Şebzîr** û *Yezdan Daver* û *Şeyzer* (a)

*Xudavadar* e hem, *peyğember* û *vexşûr* e **peyğember** (a)

Malika çarem *Meh* û *mehtab* û *mah* û *mahitab* in **hîv**, û *mîhr* e **roj** (b)

Û hem *xûrşîd* û *xerşed* *afîtab* û *hûr* û *xûr* û *xuver* (a)

*Beşa pêncem*

Malika sêyem **Nuqîn** *çekîden*, **qulkirn** e *soften* (a)

**Gestin** *gezîden*, **galgal** e *goften* (a)

Malika çarem *Bisyar* û *bes* **pur pûr**, û *poser* **kur** (b)

*Moğ* çî ye? **kafir**, **çûyîn** e *reften* (a)

## 1. 2. Pergala Kêş, Qafiye û Redîfê

Di helbest an nezma klasîk de ew pîvanên ku helbestek an menzûmeyek ji serî heta dawiyê pê tê nivîsandin re pîvanên kêşa erûzê tê gotin. “Kêş” pîvanên ahengê ya erûzê ne ku ji tefileyên pêk tên. “Qafiye” di navbera binemaya du bejeyan de dirûvpêketina dangan e ku divê kêmترین di dawîya du riste an malikekê de hereke û tîpên wan ên dawî li hevûdu bên. Eger piştî qafiyeyê bêje werin dubarekirin, ev dibe “redîf”. Li jêr em ê kêş, qafiye û redîfên ku di *Mîrsadu’l-Etfalê* de hatine bikaranîn vekolin.

### 1. 2. 1. Pergala Kêşê

Kerbelayî di vê berhema xwe ya menzûm de heşt behrên erûzê yên sereke bi kar anîne. Li jêr li gorî beşan em ê cih bidin behr û qalibên kêşê yên erûzê yên ku di *Mîrsadu’l-Etfalê* de hatine bikaranîn:

*Beş(Qit’e)*      *Behr*              *Kêş*

Destpêk	Hezec	Mefa' îlun mefa' îlun fe' ûlun
1	Hezec	Mefa' îlun mefa' îlun mefa' îlun mefa' îlun
2	Recez	Mustef' ilun mustef' ilun mustef' ilun mustef' ilun
3	Munserîh	Mufte' ilun fa' ilun mufte' ilun fa' ilun
4	Hezec	Mef' ûlun mefa' îlun mef' ûlun mefa' îlun
5	Recez	Mustef' ilatun mustef' ilatun
6	Serî'	Mufte' ilun mufte' ilun fa' ilun
7	Recez	Mufte' ilun mufte' ilun mufte' ilun mufte' ilun
8	Remel	Fa' ilatun fa' ilatun fa' ilun
9	Muzari'	Mef' ûlun fa' ilatun mef' ûlun fa' ilatun
10	Remel	Fa' ilatun fa' ilatun fa' ilatun fa' ilatun
11	Hezec	Mefa' îlun fe' ûlun mefa' îlun fe' ûlun
12	Wafir	Mefa' iletun mefa' iletun mefa' iletun mefa' iletun
13	Recez	Mustef' ilatun mustef' ilatun mustef' ilatun mustef' ilatun
14	Muteqarib	Fe' ûlun fe' ûlun fe' ûlun fe' ûlun
Dawî	Hezec	Mefa' îlun mefa' îlun fe' ûlun

Di xebata mastirê ya Helîma Xûrşîd Ebdula de, behrên 'erûzê yên ku di helbesta klasîk a kurdî de hene, her yek li gorî rêjeya xwe ya bikaranînê, wiha hatine rêzkirin; "hezec", "remel", muzari', "recez", xefîf", "muctes", "muteqarib", "besît", "serî'", "kamîl", "medîd" û "tewîl".<sup>120</sup> Her wiha li gorî lêkolîna Kadri Yıldırım, behra ku herî xweş li helbesta kurdî re tê "recez"e. Piştî wê, "hezec" û "remel" tên. Piştî wan jî "muzari'", "besît", "serî'", "muteqarib" tên.<sup>121</sup> Dema em li behrên Kerbelayî dinêrin wî pênc caran "hezec", çar caran "recez" û du caran jî "behra "remel" bi kar anîne. Wî behrên "muzari'", "serî'", "muteqarib", "munserîh" û "wafir" jî carekê bi kar anîne. Ev jî dide xuyakirin ku Kerbelayî di vê berhema xwe de derneketiye derveyê zewqa helbestvanên kurd ên berî xwe.

### 1. 2. 2. Pergala Qafiye û Redîfê

<sup>120</sup> Ebdula, Helîma Xûrşîd, *Berawirdeyeka Kêşenasî Di Navbera Erûza Kurdî û Farisî*, Hewlêr, 2010, r. 242-267.

<sup>121</sup> Yıldırım, *Nûbehara Biçûkan*, r. 125.

Ji aliyê bikaranîna cureyên qafiyeyê, yanî wek qafiyeya nîvîn, tam û zengîn<sup>122</sup> rewşa *Mîrsadu'l-Etfalê* bi vî awayî ye:

1) **Qafiyeya nîvîn:** Tenê dirûvpêketina dengdaran e. Di *Mîrsadu'l-Etfalê* de em qet rastî vê qafiyeyê nehatin.

2) **Qafiyeya tam:** Dirûvpêketina dengdêrek û dengdarekê ye. Di *Mîrsadu'l-Etfalê* gelekî hatiye bikaranîn.

Mînak:

D/3 Şelat û wendîşê xellaqê ‘alem  
Li ser wî seyyidê ewladê Adem

D/14 Bikin se‘yê di vê mirşadê eqser  
14 Bigîjin meqşed û rahê di enwer

D/15 Çikû ezmanê fursê pur ‘ecîb e  
15 Kesê ku zanibe gayet edîb e

14/43 Petik hûrsê heddad e, pasix cewab  
270 Nejend nizm û gëmgîn, û rûpûş niqab

3) **Qafiyeya zengîn:** Dirûvpêketina dengan a ji duduyan zêdetir e. Di *Mîrsadu'l-Etfalê* de bi piranî qafiyeya zengîn hatiye bikaranîn. Mînak:

D/9 Me pev xist û di nav hev kirne telfif  
9 Ji bo eclê ku da bit sehl û texfif

6/3 Axiret û renc, û hilak e dereng  
108 Sertî ye hingar, û giranî ye heng

14/42 Bizan parisa zahid e, enderûn  
269 Çi? Hundur, wuhareng e derve bîrûn

<sup>122</sup> Rojen Barnas ji bo van têngînan, navên wek “nîvbeşavend, beşavenda tam, beşavenda zengîn” bi kar anîne. Bnr. “Termên Edebî”, *Kovara Nûdem*, j.1, 1992, r. 29-36.

4) **Qafiyeya tûnc:** Ji cureyê qafiyeya zengîn eger yek di nav a din de be, ev dibe “qafiyeya tûnc”.

Mînak:

D/11 Bi Mirşadu'l-Ṭifal min kirye **nîşan**  
Ji mewla min rica ye nef'ê **îşan**

D/18 Muḥemmed 'Eskerî yû Neqşibendî  
Ew in 'îlet ji vê tertîb û **bendî**

14/23 Sokaliş te'emmul, şigerf e leṭîf  
Şikifte te'eccub, qirişqal e **tîf**

14/40 Çem û saz û ewlad û hem berx e **rûd**  
Sorûd e ğina, û selam e dirûd

15/26 Ilahî! Mustemendê Kerbelayî  
Riha kî ez ğem û renc û **belayî**

5) **Redîf:** Bêjeyên ku piştî qafiyeyê tên dubarekirin, wek redîf tên binavkirin.

Mînak:

D/20 Sebeb her du nihalê gulşenê **min**  
'Ezîzanê dil û canê tenê **min**

15/18 Refîqa! coz tû kes peyvendê **men nîst**  
Şefî' a! coz tû kes derbendê **men nîst**

### 1. 2. 3. Di *Mîrsadu'l-Eṭfalê* de Cînas

Edebiyata klasîk ji aliyê hunerên gotinê ve gelek dewlemend e. Ji ber ku *Mîrsadu'l-Eṭfal* ferhengeke menzûm e, em dê li vir tenê cih bidin cînasan. Di edebiyata klasîk de cînas,

hunereke gotinê ya girîng e. Bêjeyên ku nivîsandina wan yek, lê wateya wan cuda di nav risteyekê de bin, ew wekî “cînas” tên binavkirin.

Di edebiyata klasîk de gelek cureyên cînasan hene. *Mîrsadu'l-Etfal* ji aliyê bikaranîna cînasan, gelek dewlemend e. Digel cureyên wê hin mînakên cînasê yên ku di *Mîrsadu'l-Etfalê* de hatine bikaranîn ev in:

**Cînasa muheref:** Li gorî tîpên erebî nivîsandina bêjeyan yek, lê xwendina wan cuda be, wê demê cînasa muheref pêk tê.<sup>123</sup>

Mînak:

1/13 **Xom** e kûp, û **xem** û kec xuwar e, enguşt e tilî ey can  
38 Niverden qeç' û pêçan e, sipehsalar e ser' esker  
خم (xom) di wateya “kûp” de / خم (xem) di wateya “xwar” de ye.

7/6 Tûsen simend û rexş û esp û hem nivend hesp in ' eyan!  
129 **Xol** dîn û xuwar, û **xel** were hem hatin e, hem meşk e xîk  
خل (xol) di wateya “dîn” û “dîwane” de /خل (xel) di wateya “were” û “hatin” ê de ye.

**Cînasa muzeyel:** Cînasa zaîd jî tê gotin ku ji du bêjeyan di dawiya bêjeyek jê de tîpeke zêde heye.

Mînak:

1/7 Geda dervîş feqîr e, **pay** e dewletmend, û ling **pa**  
32 Biçûk e kih, mezin mih, hem sehî mewzûn e, da mader  
2/5 Meyxane ye xumxane, **peyman** qedeh, **peyman** e ' eħd  
45 Endam û qedd û ten beden cumle wucûd in, ' eyb e ' ar  
3/7 Îne û **ayîne** çi? ' eyne, û **ayîn** resim  
65 Zînet e hem, gewri ye kam û golûh ey bira

**Cînasa mişeweş:** Ew cînas e ku, ji du bêjeyan di yekê de tîpeke zêde heye.

Mînak:

5/4 Bisyar û bes **por** pûr, û **poser** kur

<sup>123</sup> Cem Dilçin, *Örneklerle Türk Şiir Bilgisi*, TDK, Ankara, 2000, r. 467-480.



97 Moğ çi ye? kafir, çûyîn e reften

14/45 Şerr e rezm û porxaş, û def **gerê nay**

Neberd e şerr, û qeşd û meyl e **geray**

**Cînasa muteqarib:** Cînasa lahik jî tê gotin ku, tenê tîpeke wan ji hev cuda ne. Ev tîp dibe ku di serî de, di nava bêjeyê de û di dawiya bêjeyê de be.

Mînak:

14/14 Dej e dunye û qel' e, megmûm **dejem**

241 Pizişk e tîbîb, we 'ewr e **tejem**

14/47 Mudamşad e xorsend û hem **şakir** e

274 We hem 'ebd û kole bizan **çakir** e

14/36 Godaxten helandin, û fa' il **godaz**

263 Ziman e zofû, weşş e xûk û **goraz**

6/8 **Pavçek** û **paçek** e sergîn bizan

113 **Pahek** e işkince, kemend paleheng

4/10 **Peygale** çi ye? kase, **peygare** bizan te' n e

87 Germabe çi ye? hemmam, cennet tu bizan mînû

9/8 Berna cuwan, û **bernak** gafil, nezan e **bernas**

163 Hêvî teme' teraş e, çengû meneh û çane

**Cînasa mukerer:** Cînasa muzdewîc jî tê gotin. Bêjeyek ji cînasê bi kîteya dawiyê ya bêjeyeke din re xwedî heman dangan e.

Mînak:

14/9 Bi nermî yû ewset birêvçûn e **pûy**

236 Şedîd û bilezçûn e hem **pûyipûy**

14/20 Pere hemres, û huzn hem **sevkovar**

247 Cewahir çi? Xûşab, û ewr e **govar**

**Cînasa xetî:** Tîpên erebî yên ku teşeyê wan yek lê xalên wan cuda nin.

Mînak:

4/5 Tarîk çi ye? tarî, şu' le tu bizan pertev

82 **Genc** xizne, û **konc** xelwet, roxsar çi ye? ew rû  
گنج (genc) / کنج (konc)

14/26 Bizan rûde rêvî, teweqqu' **teraş**

253 Ğulam e perestar, perîşan **peraş**  
تراش (teraş) / پراش (peraş)

14/31 Sişebr e qewî, bêheya ye **sotork**

258 Ne' ame şotor morğ, û mewc e **şotork**  
سترك (sotork) / شترك (şotork)

### 1. 3. Li Gorî Beşan Hejmara Malik û Bêjeyan

Beşa ku malikên wê herî kêr in, ya 7. e ku ji heft malikan pêk tê û beşa ku malikên wê herî zêde ne jî, ya 14. e ku ji 65 malikan pêk tê. Bêje, herî zêde di beşa 14. de ne û herî kêr jî di beşa 7. de ne. Li gorî her beşê, hejmarên malik û bêjeyan wiha ne:

Beş / Qit'e	Hejmara malikan	Hejmara bêjeyên ferhengê
Destpêk	25	-
Yek	15	98
Dudu	18	99
Sisê	19	86
Çar	16	63
Pênc	12	41
Şeş	18	46
Heft	7	30
Heşt	25	94
Neh	13	51
Deh	25	125

Yazdeh	10	33
Diwazdeh	9	55
Sêzdeh	15	103
Çardeh	65	231
Dawî	28	-
<b>Bi temamî</b>	<b>320</b>	<b>1155</b>

#### 1. 4. Di Serê Her Beşê de Destpêkirina bi Wecîzeyekê

Kerbelayî di serê her beşê de bi malikeke wecîz dest pê kiriye ku tê de pend û şîretên dînî, zanayî û qenciye hene. Armanc ew bûye ku zarok ji xûy û helwestên nebaş dûr bikevin û berê xwe bidin başî û rastiye. Malikên wecîz yên her beşê bi vî awayî ne:

<u>Beş</u>	<u>Malika Wecîzeyê</u>
1.	‘Ilim ez behrê insan dewletê dunya û ‘uqba ye Kesê ‘alim muheqqeq tacidarê her du dunya ye
2.	Ger kes bi eşl û ‘eql û heş wî ‘ilmekî qenc xwendiyê Çun der ‘emel se‘yê bike şahibmeqam û şofi ye
3.	‘Edl û sexa û edeb karê kesê mu‘teber Şahibê zulm û fucûr daîme ew bêhuner
4.	Ser qafîle’ê xûban ez alê ‘eba nevwad Ez destê gonahê xûd ber to bekonem feryad

5. Çeşmê di şehla zulfê muselsel  
Ez kirme waleh ey yarê efzel
6. Heşiyet û qedrê çû nîne libas  
Ger ku nebit fezlê kesî der esas
7. İnsan niye ê daîma bit tabi'ê keyf û surûr  
Herçî ku insan be mudam dê bit ji keyfa nefsê dûr
8. Ger dixwazî nête sehya te xelet  
Zerre keslanî meke ender 'emel
9. Ser lewhe'ê şeçîfî kizb û duruğ û laf e  
'Inwanê bêumîdî xûdbînî û gezaf e
10. Talibê 'izz û se'adet lazim e rencûrî bit  
Da ku şubhê afitabê der cihan meşhûrî bit
11. Ku sê ne rahê qencî tu lez ke bê teweqquf  
Yekî rahê şer'et, 'ilim ya dî teşşewuf
12. İnsan ku edeb vê ra nebitin, ew bêneseb e bêşubhe bizan  
'Ilim ku 'emel vê ra nebitin, bêbehre ye ew cahîl e nezan
13. Hicranê dilber zor û bela ye, lê weslê canan bo dil dewa ye  
Cansûz e 'aşiq pê muhtela ye, kilkê ezel wî ev reng kişaye
14. Bi kibr û bi xeyla û nexewt aman  
Meke zulmê ser bêdil û bêkesan

## **2. JI ALIYÊ NAVEROKÊ VE**

### **2. 1. Rêbaza Pedagojîk**

Dema ku em li beşên ferhengê dinêrin, em dibînin ku mijarên wê ne li gorî rasthatiniyê, bi piranî li gorî pergaleke pedagojîk li pey hev hatine rêzkirin. Diyar e ku bêjeyên di ferhengê de li gorî rê û rêbazên wek “ji giştî ber bi taybet”, “ji nêzîk ber bi dûr”, “ji têkiliya parçe û bitûnê” û bi “rêbaza bibîrxistin û mûsikî/rîtmîk” hatine amadekirin.

Îro di derûnnasiya nûjen de bi awayekî giştî tê qebûlkirin ku ji bo hîndekariyeke baş û birêkûpêk rêbaza “ji giştî ber bi taybet” bêtir rast e. Yanî mirov ewil “dar”ê dibîne, dûre “şaxên” wê û dawiyê jî “pelên” wê dibîne. Di *Nûbehara Biçûkan* de jî bi piranî ev rêbaz hatiye şopandin.<sup>124</sup> Kerbelayî di vir de jî li pey şopa Xanî çûye.

#### **2. 1. 1. Ji Giştî ber bi Taybet ve**

Kerbelayî, di malika yekem de bi bêjeyên ku hemwateyên navê Xwedê ne dest pê kiriye. Yanî destpêka kaînatê ji Xwedê ye, dûre navê pêxember, navên rêveber û desthilatdaran hatine rêzkirin. Li vir hiyerarşiyeye kozmogonîk heye.

Mînak:

---

<sup>124</sup> Yıldırım, *Nûbehara Biçûkan*, r. 129.

- 1/3 Bizan navê **Xudê Şebzîr** û *Yezdan Daver* û *Şeyzer*  
 28 *Xudavadar* e hem, *peygember* û *vexşûr* e **peygember**  
 1/15 *Xudavend* û *şehinşeh şehriyar* û *şeh çî?* **Sulţan** in  
 40 *Etabik çî wezîr*, û **nûr** e *tef*, **gustîr** e *enguşter*

Bêjeyên malikên pêşiyê yên beşa duyem jî hemwateya wesfên Xwedê ne:

- 2/3 *Weşfê Xuda* ye *Kirdigar Perverdigar Amorzigar*  
 43 Hem *Aferînde* bizan hem *Mihriban* hem *Payidar*

Pêşî “dê û bav” dûre “xwişk û bira” hatine rêzkirin:

- 32 **Biçûk** e *kih*, **mezin** *mih*, hem *sehî mewzûn* e, **da mader**  
 33 *Peder bav*, û *birader çî?* **bira**, û **xuşk** e hem *xaher*

Têgînên asîmanî berî yên erdê hatine rêzkirin. Yanî ji nêzîk ber bi dûr ve, pêşî “roj û heyv”, piştî “ax û derya”:

- 1/4 *Meh* û *mehtab* û *mah* û *mahitab* in **hîv**, û *mîhr* e **roj**  
 29 **Û** hem *xûrşîd* û *xerşed afîtab* û *hûr* û *xûr* û *xuver*  
 2/4 *Jale xunav*, û *şeb şev* e, *derya ye* **behr**, û *xak* e **ax**  
 44 **Şebr** e *şikîb*, *sûziş şewat*, *gejdom* e ‘**eqreb**, **me’r** e *mar*

### 2. 1. 2. Têkiliya Parçe û Bitûnê

Kerbelayî ev rêbaz gelek car bi kar aniye. Bo nimûne beriya ku hemwateya “rû”yê bêje, beşên wî bi rêz kirine. Yanî “lêv, poz, çav, ziman, diran” û dûre digel “gulî, birû”yê bêjeya “rû” daye nasandin. Yanî parçe û bitûnê digel hev bi kar anîne:

- 1/6 *Kenar* e **kêlek**, û *leb lêv*, û *bînî poz*, û *çeşm* e **çav**  
 31 *Zeban ezman*, **diran dindan**, û *sermil dûş*, **heval yaver**

1/9 *Rox û sîma û çehre rû, gulî gîsû, birû ebrû*

34 *Zen û hemser çi ye? Jin, hem dibên mêrê jinê şevher*

### 2. 1. 3. Rêbaza Bibîrxistinê

Di her zimanî de, komên bêjeyan hene ku bi bejeyên din re têkildar in. Yanî dema yek jê tê bikaranîn, yên din jî tîne mirov. Nemaze, bêjeyên ku bi ramanan ve têkildar in bêtir bi hev ve girêdayî ne. Lewma di sîstema perwerdeyê de perwerdekar hewl didin ku zarokan arasteyî bibîrxistinên qenc bikin.<sup>125</sup>

Rêbaza bibîrxistinê di pedagojîyê de ji bo karê hîndekariyê gelek girîng e. Di vê rêbazê de dema ku mirov bêjeyekê an zanyariyekê hîn dibe bi zanyariyên xwe yên berê re pêwendiyên çêdike. Bêjeyên hemwate, dijwate û nêzwateyên ku bi wê bêjeyê re têkildar in mirov tîne bîra xwe. Yanî eger bêje di nav kontekstekê de werin nîşan dan û bi vî awayî werin hînkirin, ew zû ji bîra mirov naçin.

Kerbelayî bi hostetiyeke mezin bêjeyên ku yên din tînin bîra mirov di nav hevûdu de bi kar anîne. Yanî wî gelek caran rêbaza bibîrxistinê bi kar anîye. Malika li jêr ji bo vê mijarê mînaeke gelek xweş e:

2/7 *Ahû **xezal**, xoşmeş xiram, goncişk e serçe, dem nefes,*

47 *Nexçîr e nêçîr, dav e dam, şimşîr e şûr, û def e bar*

Di vê malikê de bêjeyên kurdî yên “xezal, serçe, nefes (hilmijîn), nêçîr, dav (dafîk/feq), şûr û def e (car)” derbas dibin. “Xezal/ahû” “xweş dimeşe/xiram” û “serçe/goncişk” hilmijînê yanî “nefes/dem”ê tîne bîra mirov û ew ji bo “nêçîr/nexçîr”ê bi dest nakevin. Her wiha “nêçîr” bi “dav/dam”ê, yanî bi “dafîk danîn”ê re têkildar e, dîsa di nêçîrê de mirov gelek “car”an “def e/bar” nêçîrkirinê diceribîne û jixwe “şûr/şimşîr” jî bi hemûyan re têkildar e. Herwekî xuya dibe temamê bêjeyên ku di vê malikê de derbas dibin di nav kontekstekê de ne û li vir rêbaza bibîrxistinê hatiye bikaranîn.

Di vê malika jêrîn de jî nivîskar bêjeyên “rê, rêwî, kanî, gund, bajar, xanî û rehber” di nav hev de rêz kirine:

1/10 *Reh e rê, rahirev rêwî, yû çeşme kanî, û dih gund*

<sup>125</sup> Paul Foulquie, *Pedagoji Sözlüğü*, r. 71.

### 35 *Şehir bajar e, xane xanî, û pîşiva rehber*

Bi riya hînbûna bibîrxistinê (associative learning),<sup>126</sup> mirov dikare di navbera van bêjeyan de pêwendiyên çê bike. Zarok dikare ji van bêjeyan di xeyala xwe de hevokeke bi vî awayî saz bike:

“Rêwi/rahirev”ek dikeve “rê/reh” ew dê here “xani/xane”yê xwe yê li “bajêr/şehir”, di rê de ev rêwî tî dibe, yekî “rehber/pîşva” wî dibe ser “kanî/çeşme”ya “gund/dih”ekî.

Zarok piştî ku hevokek bi vî awayî çê kir, nema farisiya van bêjeyan zû bi zû ji bîr bike.

Di vê malika jêrîn jî de jî nivîskar bêjeyên “Dej-dejem-pizişk-tejem” li ba hev bi kar anîne:

14/14 *Dej e dunye û qel’ e, meğmûm dejem,*

241 *Pizişk e tebîb, we ‘ewr e tejem*

Bi heman rêbazê, mirov dikare di navbera van bêjeyan de pêwendiyêke bi vî awayî çê bike:

“Dej” yanî dunya wek kelhê ye û cihê “dejem”ê yanî qehr û xemê ye, kesê ku bixem be dunya jê re timî “tejem” e yanî biewr e û her wiha jê re “pizişk” yanî tebîb pêwîst e.

#### 2. 1. 4. *Rêbaza Mûsikî/Rîtmîk*

Ji bo pêşdexistin û bikêrhatîkirina perwerde û hîndekariyê her dem xebat û lêkolînên nû tên kirin. Yek ji van jî xebata derûnnasê amerîkî Howard Gardner e. Gardner di sala 1983yan da gihastiyê wê encamê ku her mirovek, xwedî gelek jîrayîyan e ku ev jî, ji hev cuda ne. Ev jîrayî jî li gorî xwe bi awayekî taybet geş dibin û dixebitin. Gardner vê xebatê wek “Çarçoveyên Zîhnî” (Frames of Mind)<sup>127</sup> bi nav kir û “teoriya firejîrayî”yê parast. Vê teoriyê di destpêkê de behsa heşt cure jîrayîyan dikir. Yek ji van jî jîrayiya mûsikî/rîtmîk e. Herçî mirovên xwediyê vê jîrayiyê bin, ew dikarin bi deng, nota û rîtiman bifikirin, dengên cuda binasin û deng û rîtmên nû çê bikin. Her wiha ew têgînên rîtmîk û tonîk jî baş têderdixin û xweş bi kar tînin. Ew li gorî mirovên din ji dengên derdorê û amûrên mûsikî re bêtir hesas in.

Li gorî teoriya firejîrayiyê di hînbûna zimanên biyanî de awayê mûsikî/rîtmîkê gelek rêxweşker e. Nemaze zarokên ku jîrayiya wan a mûsikî û rîtmîk xurt in, ew pêkhatina bûyeran, çawaniya wan bi zimanekî mûsikîyê difikirin, şîrove dikin û vedibêjin.<sup>128</sup> Her wiha ew bi dest û lingên xwe dikarin rîtmê bigrin û bi vî awayî tiştên ku hîn bûne zû bi zû ji bîra

<sup>126</sup> Orhan Hançerlioğlu, *Ruhbilim Sözlüğü*, Remzi Kitabevi, İstanbul, 1997, r. 81.

<sup>127</sup> Howard Gardner, *Zihin Çerçeveleri Çoklu Zeka Kuramı* (Frames of Mind The Theory of Multiple Intelligences 1983), wer. Ebru Kılıç, Alfa Yayınları, İstanbul, 2004.

<sup>128</sup> Tahirhan Aydın, “Çoklu Zeka Kuramı ve Yabancılara Arapça Öğretimi”, (Teza lîsansa bilind a neçapkirî), Gazi Ü, Eğitim Bilimleri Enstitüsü, Ankara, 2005, r.29.



nakin. Behrên erûzê ku li ser bingeha kurtî û dirêjîya dengan ava bûne ji bo vê yekê gelek guncan in. Lewma di helbestê de xweşbikaranîna behrên erûzê ji bo karê hîndekariyê û nemaze jî ji bo hînkirina zimanekî biyanî gelek pedagojîk in. Zarok dema ku helbestekê bi awayê rîtmîk dixwînin, bêzarî li wan peyda nabe û bêtir jê hez dikin.<sup>129</sup> Dema ku em li *Mîrsadu'l-Etfalê* dinihêrin, em dibînin ku çî kurt, çî dirêj gelek behrên erûzê hatine bikaranîn. Ev jî rê dide ku xwendekar bi çend rîtmên cuda malikan ezber bikin û bêjeyên wan jibîr nekin. Bo nimûne malika jêrîn li ser kêşa “Muftê‘ ilun muftê‘ ilun fa‘ ilun” hatiye nivîsîn:

6/3 **Axiret** û *renc*, û **hilak** e *dereng*,  
108 **Sertî** ye *hingar*, û **giranî** ye *heng*,

6/4 *Çapik* û *çalakî sivikbûyin* e,  
109 *Çeste çî?* **Negme**, **keçel** e hem *çeseng*,

Xwendekar bi riya ahenga vê kêşê, pir bi hêsanî dikare bêjeyên vê malikê ezber bike. Mînakek jî ji kêşeke dirêj a “Muftê‘ ilun muftê‘ ilun muftê‘ ilun muftê‘ ilun” ve ev e:

7/3 **Feryad** e *gal* hem **dûr** e hem **mekr** e we hem **wawîk** û **dîk**,  
126 *Gam ling* e hem **dizgîn** e hem **gund** e, we hem *gorbe pisîk*,

7/4 *Gale çewal*, *gan layiq* e, *gave şecî‘*, **miqraž (e)** *gaz*,  
127 *Dend* e **feqîr** û **eħmeq** û **bêturs** û **xûdser**, **dîz** e *dîk*,

Mînakek jî ji kêşeke dirêj a “Muftê‘ ilun muftê‘ ilun muftê‘ ilun muftê‘ ilun” ve ev e :

7/3 **Feryad** e *gal* hem **dûr** e hem **mekr** e we hem **wawîk** û **dîk**,  
126 *Gam ling* e hem **dizgîn** e hem **gund** e, we hem *gorbe pisîk*,

<sup>129</sup> Emîn Ebdulqadir, *Hozan û Şanogeriya Zarokan di Edebî Kurdî da*, Çapxana Hecî Haşim, Hewlêr, 2006, r. 26.

7/4 *Gale çewal, gan layiq e, gave şecîc, miqraž (e) gaz,*

127 *Dend e feqîr û eħmeq û bêturs û xûdser, dîz e dîk,*

## 2. 2. Mijarên Sereke yên di Ferhengê de

### 2. 2. 1. Endamên Malbatê, Mirovên Nêzîk û Têgînên Civakî

Bêjeyên der bareyê endamên malbatê, mirovatî û civakî de, bi piranî di sê beşên pêşî de cih girtine. Ev bêje ev in:

*Dê, bav, bira, xwişk, jin, mêr, keç, zarok, pîrejin, torin, xatûn, jina bêmêr, jinbî, walide, kur, bav, insan, kurik, nesl, cem<sup>c</sup>iyet, cem<sup>c</sup>, eqriba, nêr, mêr, heval, enîs, refîq.*

Mînak:

32 **Biçûk** e *kih*, **mezin** *mih*, hem *sehî mewzûn* e, **da mader**

33 *Peder bav*, û *birader çî?* **bira**, û **xuşk** e hem *xaher*

### 2. 2. 2. Endamên Laşê Mirovan

Bêjeyên der bareyê endamên laşê mirovan de jî wekî yên li jorê bi piranî di sê beşên pêşî de cih girtine. Ew jî ev in:

*Lêv, poz, çav, ezman (ziman), diran, sermil, ling, rû, gulî, birû, bijank, jinû, pehnî, tilî, wucûd, bîra çenê, kêlek, neynûk, gewrî, qirik, rî, mûyê heram, dev, çengû, cusse, hûr, guh, pêsîr, sedî (sîng), rêvî, hûçik, zirav.*

Mînak:

1/6 *Kenar* e **kêlek**, û *leb lêv*, û *binî poz*, û *çeşm* e **çav**,

31 *Zeban ezman, diran dindan*, û *sermil dûş*, **heval yaver**,

Her wiha di malika 10an de bêjeya farisî ya “şeşrevzen” kîneye ye ji şeş menfezên (qulik) di laşê mirovan de ku ev in: guh, poz û yên pêşî û paşî.

10/6 *Şeşderî şeşderfena şeşrevzen û şeşderê teng*

### 2. 2. 3. Fîzyonomî

Kerbelayî der bareyê taybetiyên fîzyonomiyê de jî hin bêje bi kar anîne. Ev bêje di nav beşan de bi awayekî belawela hatine bikaranîn. Yên ku me tesbît kirine ev in:

*Biçûk, mezin, qenbûr, xweşmeş, qelew, ze<sup>c</sup>îf, xweşik, keçel, xwar, kerr, mewzûn, ciwan, sist, devxwar, pîrê rizî.*

#### 2. 2. 4. Xûy, Rewş, Pîşe û Taybetiyên Mirovan

Di ferhengê de ji aliyê kar, pîşe, rewş û taybetiyên mirovan, gelek bêje hene. Yê ku me tesbît kirine ev in;

*Feqîr, dewletmend, aqilmend, rêwî, rehber, nazik, sultan, wezîr, qatî‘terîq, kar, bêqam, bêhiş, qewas, katib, zelîl, padişahê adil, xoşteb‘et, zana, pîsteb‘et, bêşerm û heya, mehbûb, sahir, bêav, puravxwarî, qehpe, sexawet, kafîr, muraî, dellal, mêrî (mêranî), teb‘ê perîşan, ehmeq, pêxwas, bêtirs, xudser, dîn, qasid, nezan, fahişe, mêr, nefse kamil, letîf, şehzade, mal, şeci‘, bêdedeb, şîrîk, tenbel, xafil, qenc, necîb, bayi‘ (firoşkar), abid, xanedan, ebd, bende, palewan, ecûl, bédil, Mecûs, bédîn, efrincî, neyar, dost, teme‘kar, muheyir, zahid, cellad, gozîkor, wefasiz, xadim, hesûd, simsar, xweşhal, perîşan, miftî, jina fehş, pîskar, pîs, tebîb, şivan, xulam, qebîh, pasban, nizm, xemgîn, ba‘eqil, mudamşad, kole, mezin, mezintir, muntexeb, xweşdilî, biçûkî, diz, fizûlmêr, jinbî, qelawuz, birçî, sobeyî, xweygotin.*

#### 2. 2. 5. Kozmoloji: Astronomî (Esmannasî) û Astrolojî (Stêrnasî)

Di *Mîrsadu‘l-Etfalê* de der bareyê kozmolojiyê de gelek bêje hene. Taybetiyeke mala Aqtepiyan ew bû ku li ser astronomî û astrolojiyê eleqeyê wan a mezin hebû. Di vî warî de bi navê *Kîfayetu‘l-Ewqat* berhemê Şêx Evdirehmanê Aqtepeyî heye. Wî ji qaşila dara gûzê, kureyê dunyayê çêkiriye û navê hemû gerstêrkan li serî bi cih kirine.<sup>130</sup>

Kerbelayî jî wekî bavê xwe di vî ferhengê de gelek têgînên wiha bi kar anîne. Em dê bêjeyên vî mijarê di binbeşên wek “felek”, “stêr”, “gerstêrk” û “birc”an de vekolînin:

##### 2. 2. 5. 1. Felek (Esman)

Li gorî astronomiya Batlamiyûs a klasîk, dunya ji aliyê neh felekan ve hatiye dorpeçkirin ku wek tovila pîvazê di nav hev de ne<sup>131</sup>. Kerbelayî jî li gorî vî, navên felekan rêz kirine. Navên felekan di ferhengê de digel farisiya wan bi awayê ku derbas dibin ev in:

<b>hîv</b>	: meh, mehtab
<b>‘etarid</b>	: zavoş, tîr (merkur),
<b>zehre</b>	: zaver (venus),

<sup>130</sup> Özeydîn, b.n., r. 99.

<sup>131</sup> Pala, *Ansiklopedik Divan Şiiri Sözlüğü*, r. 159.

<b>roj</b>	: <i>mîhr, xûrşîd, afitab</i>
<b>merîx</b>	: <i>behram, bexûn (mars),</i>
<b>zuhel</b>	: <i>keş, keyvan (saturn),</i>
<b>muşterî</b>	: <i>hormozd, berev, raveş, xospî, bircis (jupiter),</i>

Mînak:

1/4 *Meh û mehtab û mah û mahitab in hîv, û mîhr e roj*

29 *Û hem xûrşîd û xerşed afitab û hûr û xûr û xuver,*

6/7 **Muşterî** *hormozd û berev raveş e*

112 *Xospî û bircîs e, weqî pareseng,*

9/10 *Zavoş ‘etarîd e, hem ba muşterî û ermozd,*

165 *Deyhîm e tac, û hem xûdrabûnê hesp e şane,*

10/9 *Heftiaba heftieyvan heftiporgar heftibam*

177 *Heftipeyker heftixatûn cumle esman, hûr gorûş,*

10/10 *Heftixezra heftiseqf û heftiçarom heftigah*

178 *Heftikuhlî heftigonbed asiman, neğme sorûş,*

## 2. 2. 5. 2. Stêr

Kerbelayî hem wek kome nav û hem jî wek serena navên hin stêrkan rêz kirine. Lê belê li gorî yê din hejmara wan hindik e. Her wiha wek mînaka “benatu’n-ne‘ş û debbu’l-ekber” hin bêje bi awayên wan ên kurdî nedane. Bêjeyên ku wek navên stêran derbas dibin digel farisiya wan bi vî awayî ne:

<b>benatu’n-ne‘ş</b>	: <i>heft evreng heft daver heft birader</i>
<b>debbu’l-ekber</b>	: <i>heft evreng heft daver heft birader</i>
<b>sureyya</b>	: <i>pervîn</i>
<b>zehre</b>	: <i>nahîd</i>
<b>zuhel</b>	: <i>keş, keyvan</i>

Mînak:

10/15 *Heftievreng heftidaver heft birader cumle çi?*

183 Ew **benatu'n-ne'ş û debbu'l-ekber** e...

### 2. 2. 5. 3. Gerstêrk (Seyare)

Li gorî stêrknasiya berê, heft gerstêrk wek tovila pîvazê ji hundir ber bi derve hatine rêzkirin.<sup>132</sup> Kerbelayî gerstêrkan di bin navê “seb‘ eyê seyare” de kom kirine ku navên wan ev in:

*Zuhel, muşterî, merîx, roj, zuhre, ‘etarîd, hîv.*

Mînak:

10/12 *Heftioxtan heftiban û heftiçeşmê çerx hem*

180 *Heftireşan seb‘ eyê seyare, û gazî xorûş,*

10/13 *Heftisulţan heftişem ‘û heftiţîflê canşeker*

181 *Heftinuqte heftibanû ew jî ew, uskut xemûş,*

### 2. 2. 5. 4. Birc (Çerx)

Li gorî senifandina klasik 12 birc hene.<sup>133</sup> Navên bircan ên ku di ferhengê de derbas dibin digel farisiya wan ev in:

<b>humul</b>	: <i>bere</i>
<b>beran</b>	: <i>negel</i>
<b>seretan</b>	: <i>xerçeng, keşef</i>
<b>sunbul</b>	: <i>xûşe</i>
<b>mîzan</b>	: <i>terazû</i>
<b>‘eqreb</b>	: <i>kejdom</i>
<b>qews</b>	: <i>keman</i>
<b>hût</b>	: <i>mahî</i>

<sup>132</sup> Pala, b.n., r. 243.

<sup>133</sup> Levend, *Divan Edebiyatı*, r. 14.; Pala, *Ansiklopedik Divan Şiiri Sözlüğü*, r. 86.

Mînak:

14/11 *Keman burcê qews e, ‘eṭarid çî? Tîr*

238 *Xûşe sunbul e, torin e hem nebîr*

14/12 *Çi ye zehre? Nahîd, û keyvan zuḥel*

239 *We xerçeng e serṭan, beran e negel*

### 2. 2. 6. Ayet û Sûre

Di destpêka berhemê de navên du sûre û ayet “Taha, Yasîn” û du ayet “Hamîm, Tasîn” ên Qur’anê derbas dibin. “Hamîm” bêjeya destpêkê ya sûreya “Şûra”yê û “Tasîn” jî bêjeya destpêkê ya sûreya “Neml”ê ye. “Kun” jî wek bêjeyeke ji ayeta 82. a sûreya Yasînê derbas dibe ku di wateya “Bibe!” de ye.

Mînak:

D/3 *Bi emrê kun du ‘alem aferandin*

3 *Bi kewkeb asiman wî zeyyinandin*

D/6 *Sezayê xelmetê Ṭaha û Yasîn*

6 *Guwahê şe’nê û Ḥamîm û Ṭasîn*

### 2. 2. 7. Cih û Kesayetên Mêjûyî

Di *Mîrsadu’l-Etfalê* de ji aliyê dîrokî ve navên hin cih û kesayetên girîng derbas dibin. Li jêr em ê navên cih û kesayetên ku derbas dibin, digel malikên wan bidin.

“Eshabu’l-Kehf” yanî “heft heval”<sup>134</sup> û “Her heft Qurra” yanî “heft xwendevanên navdar ên Qur’anê”:<sup>135</sup>

10/16 *Heft tenan û heftimerdan heftimerd Eşḥabê Kehf,*

184 *Heftipîr her heftê Qurra’, hem lepik çî? destipûş,*

“Bavê Adem” yanî mirovê pêşî Hz.Adem:

<sup>134</sup> Navên heft hevalan ev in: *Yemliha, Mekselîna, Meslîna, Mernûş, Debrenûş, Şazenûş, Mertûneş*. Bnr. BQ, r. 330.

<sup>135</sup> Navên heft xwendevanan ev in: *Nafî’ê Medenî, Îbnî Kesîrê Mekkî, Ebû ‘Amrê Basrî, Îbnî ‘Amrê Şamî, ‘Asimê Kûfî, Hemzeyê Kûfî, Kîsaiyê Kûfî*. Bnr. BQ, r. 329.

14/30 Bizan **bavê Adem cehanê kehîn,**  
257 We hem **masiwallah cehanê mehîn,**

Hz. Muhemmed:

8/19 **Seyyidê ‘alem Muḥemmed Muştefa**  
149 *Xosrevê heştê bohoşt nûrê pesîn,*

“Gave” yanî “Kawayê hesinker”:

7/4 *Gale çewal, gan layiq e, gave şecî‘, miqraž gaz,*  
127 *Dend e feqîr û eḥmeq û bêturs û xûdser, dîz e dîk,*

“Tehemten” leqebekî Ristemê Zal e:

14/5 We hem *eşser e tac, û bexşiş dihiş,*  
232 *Tehemten şecî‘, û tebî‘ et cehiş,*

“Newbuhar” yanî “Nûbehara Biçûkan”, “Şêxê Xanî” yanî “Ehmedê Xanî”

D/12 Me her wek Newbuharê Şêxê Xanî  
12 Esasê wê ji bo eḥfalê danî

“Muhemmed Eskerî” û “Neqşibendî”:<sup>136</sup>

D/18 Muḥemmed ‘Eskerî yû Neqşibendî  
18 Ew in ‘îlet ji vê tertîb û bendî

Navê bajarê “Quds”ê:

8/22 **Berger e labe** û hem **ixlaş** û **xap,**  
152 *Hûx û hûxt e Quds, û şehzade nûyîn,*

“Mecûs”:<sup>137</sup>

6/13 **Bulbul** û **qumrî** yû **Mecûs zendibaf,**  
118 ‘**Eyb** û **neşîb miḥnet** û **quwwet çî? Reng,**

<sup>136</sup> “Mihemed Eskerî” birayê Kerbelayî ye, “Neqşibendî” jî biraziyê wî ye.

<sup>137</sup> Di wateya “zendbaf”ê de ew kes in ku, kitêba pîroz a Zerdüştiyê *Zend-Avestayê* dixwînin. Bnr. BQ, r. 837.

“Kord”:<sup>138</sup>

8/17 Çûk e ya heq, bûm e çûkek, çûl e xuwar,

147 Kord e mêt, û nefsê kamil abitîn,

“Ahrîmen”:<sup>139</sup>

10/7 Ahiramen ahirîmen ahirîme ehremen

175 Ahiren ehrîme ehren cumle şeytan, do ye dûş,

“Heft muhît”:<sup>140</sup>

10/11 Heftimecmer heftimendel heftiçerxê abigûn

179 Heftmoîhî û heftinîmxane keza!, nişter dorûş,

### 2. 2. 8. Cih û Erdnîgarî

Di ferhengê de gelek bêjeyên cih û erdnîgariyê derbas dibin. Gelek ji van bêjeyan îro jî pir tîn bikaranîn. Yê ku me tesbît kirine ev in:

*Rê, kanî, gund, bajar, xanî, xunav, behr, ax, nehir, cûyik, çiya, deşt, kevir, ba, dunya, ‘erş, iqlîm, erdê pir ber, kort, bilindi, kûrî, qûm, Qudûs, esman, hêlîn, hewzê biçûk, tilm, meydan, çol, xerabe, cadde, xan, koşk, hesar, qel‘e, hemam, roj, hîv, cewahir, purav, ewr, qûm, daîmî çandin, holik, cisr, çem, çolê pur seyde û suba‘, çolê xeyrî suba‘, mekanê gulkûnî, sazlix, herî, mêrg, bexçe.*

### 2. 2. 9. Bergeh û Alî

Di ferhengê de hin bêjeyên ku bergeh û aliyan nîşan didin ev in:

*Kêlek, berjêre, efrax, canib, dûv, nav, hundur, derve.*

### 2. 2. 10. Flora

Bêjeyên ku di vê mijarê de derbas dibin, di heman demê de floraya Kurdistanê jî bi me didin nasîn. Ji aliyê florayê ve bêjeyên ku me tesbît kirine ev in;

<sup>138</sup> Kesên ji neteweya “kurd”in.

<sup>139</sup> Di baweriya Zerduştî de hêza ku nebaşî û xerabiyê temsîl dike, wekî dijwateya “Yezdan” jî tê bikaranîn.

<sup>140</sup> Îşaretî heft deryayan dike ku navên wan ên îroyîn bi vî awayî ne: “Deryaya Çînê, Deryaya Maxribê, Deryaya Sipî, Deryaya Reş, Deryaya Sor, Deryaya Hazarê, Deryaya Xelîcê”. Bnr. BQ, r. 329.



*Sév, dar, ber, fikî, tirî, dirrî, bişkojê gul, hirî, ka, neyşeker, penbû, nîsk, hunguv, muşkê xalis, bi'îv (behîv), gulsipî, sergîn, felîsîl, qirşê qalin, xwê, serwî, efyûn, ziqûm, bîber, leymûn, be'can (bacan), sunbul, qirişqal, kettan, henzel (cureyê zebeşeke tehl e), reh, biyok, çîmen, ney, pîvaz, rûn.*

Mînak:

2/6 **Dar** e dirixt, û meyve **ber fikî** ye, engûr e **tirî**,  
46 **Çahê zenex bîra çenê, dirrî** xes û xaşak û xar,

### 2. 2. 11. Faûna

Di ferhengê de, têgînên der bareyê faûnayê de bi du awayan hatine bikaranîn. Hin jê wek “rêvî, mişk, moz” rasterast navên ajelan in:

Mînak:

2/16 **Rûbah rêvî, mûş mişk, pidram muzeyyen, nîş e moz,**  
56 **Şenkaş hesed, pasix cewab, mektûb e name, pîşe kar,**

Hin jê jî wek “dewarê mûtî, heywanê mestir” bi awayê komenav hatine bikaranîn.

Mînak:

14/7 **Bizan qenc e nîk, û kerr e kondigûş,**  
234 **Dewarê mûtî' û sukût e xemûş,**  
  
14/10 **Deve w hesp û heywanê mestir heyûn,**  
237 **Şer û fitne şûr, nal e efgan şeyûn,**

Di ferhengê de bêjeyên ku der bareyê faûnayê de me tesbît kirine ev in:

*‘Eqreb, mar, xezal, serçe, nêçîr, kihêl, kew, rêvî, mişk, moz, kertenkele (gumgumok), hesp, bakir, zîro, bizüz, baz, sîxur, bulbul, tûtî, dengê hezar (bulbul)qumrî, bask, nukul, wawîk, dîk, pisîk, hudhud, kund, xenzîr, çûk, bûm, zefde' (beq), dûv, kerî, şamî, kulî, gakûvî, teyar, şebşebk, legleg, hût, meshî (masî), dewarê mûtî, deve, heywanê mestir, sertan (kevjal), beran, humul (berxik), ne'ame (hêştirme), weş, berx, piling, hêç, suba', xeyrî suba'.*

### 2. 2. 12. Keş û Hewa

Di ferhengê de der bareyê keş û hewayê de hin têngînên bingehî hene. Di vê mijarê de bêjeyên ku me tesbît kirine ev in:

*Xunav, sar, bizot, tîfik, ba, baran, germbûn, roj, ewr, agir, av.*

### 2. 2. 13. Dem

Di ferhengê de bi demê re eleqedar hin têngînên bingehî hene. Di vê mijarê de bêjeyên ku me tesbît kirine ev in:

*Weqtê seher, roj, şev, do, ewwel, anha, nuha, daîm, ev zeman, ev saet, temmûz, kanûn, peyîz, kanûna sanî, buhar.*

Mînak:

8/24 Îder û îdûn **nuha** û a **li vir**,

154 **Ev zeman** û **ev se'et, mal îtigîn**,

### 2. 2. 14. Çek û Aletên Kevnare

Di ferhengê de der bareyê çek û aletên kevnare de gelek bêje hene. Ev bêje ji bo zarokan gelek balkêş in. Lewra ew bi vî awayî rewşa jiyana berê baştir nas dikin. Bêjeyên ku di vê mijarê de me tesbît kirine ev in:

*Dizgîn, şûr, çadir, çira, ke'nî, kemend, dar, tîr, werîs, lox, çewal, miqraz, zirx, xencer, tac, mehmel, mertal, rim, çengel, weqî', def, hawin, hursê heddad (sindan), gopal,*

### 2. 2. 15. Kelûpel

Kerbelayî di *Mîrsadu'l-Etfalê* de kelûpelên pêwîst ên ji bo jiyana rojanî rêz kirine da ku zarok fêrî wan bibin. Heta cih daye kelûpeleke wekî “perikê nav qelem”ê jî. Bêjeyên di vê mijarê de derbas dibin, ev in:

*Çira, tizbî, şe, şûjin, sîwak, kase, şûşe, sabûn, gulokê ben, werîs, şonik, dar, lox, çewal, miqraz, dîz, xatem, meşk, manqel, nerdiban, çirrik, kûp, kûz, be'lîf, doşek, ta, serrad, hubre, şerbik, mehmel, keşkûl, qedeh, dergûş, çengel, fûtîl, kibrît, çadir, qefes, gopal, perrê nav qelem.*

Mînak:

6/9 *Penbe* 'ê *mehlûc* û **gulokê ben** in

114 *Bencek* û *bendek*, çi ye **şûnik**? *Kodeng*,

### 2. 2. 16. Madenên Bingehîn

Di ferhengê de hin madenên bingehîn ên wek “zêr, elmas, mircan” jî derbas dibin.

Mînak:

14/41 Çi ye **şûr**? Elmas, wuhareng e *tîg*,

268 *Zerr e zêr, û yazuğ fisûs û dirîg*,

### 2. 2. 17. Zînet û Cilûberg

Bêjeyên der bareyê zînet û cilûbergan de yê ku di ferhengê de derbas dibin ev in;

*Gustîr, dav, mircan, zînet, xatem, tung, sol, lepik, bazin, kurk, kiras, guhar, gore, tac, qumaş, qumaşê meqbûl, niqab, hûçik, paç, pere, tacê muresê* ‘.

### 2. 2. 18. Zayend

Di ferhengê de hin têngên der bareyê zayendê de wek “nêr, mê, kîr” jî hene. Mînak:

8/23 *Nerre nêr û pîs û mewcê av û kîr*,

153 *Mad mê, û ‘aqilî barîkbîn*,

### 2. 2. 19. Têngên Leşkerî

Di ferhengê de gelek têngên leşkerî derbas dibin. Kerbelayî di warê têngên leşkerî de heta “dengê şûr û gurzan” teferûatên herî biçûk jî dane.

Mînak:

11/6 Çi ye **dengê di şûran**? *Çekaçak û çekçak*,

199 *Çiringîden çi? Yê gurz, we hem sukranî mestî*,

Têngên der bareyê leşkerî de ne, ev in:

*Seresker, çawîş, nefer, esker, çadir, menzel, sulh, qewxe, qirîn, zirx, çekê şerê, helqeyê zirx, kulîne, rim, sîle, hesar, tac, beyreq, şecî ‘, qel ‘e, fexul (efser), rimê kin, şûr, şer, def, qelawuz, jî, kevan, gurz, tîrê hewayî*

### 2. 2. 20. Reng

Di ferhengê de navên rengan kê mî in. Navên rengan ên ku di ferhengê de derbas dibin ev in:

*Sipî, zer, rengê qule, reş, heşîn.*

### **2. 2. 21. Têgînên Mêjer û Pîvanê**

Ji bo hînbûna zimanekî biyanî, bêjeyên mêjer û pîvandinê gelek girîng in. Di ferhengê de me ev bêje tesbît kirin:

*Heb, weqî, def'e, ewwel, pur, ling, nêz, dûr, dereng, zû, perçe, tarî, teng, biçûk, mezintî, sertî, giranî, bilindî, sermil, bihust, kûrî, mîzan.*

### **2. 2. 22. Bêjeyên din**

Kerbelayî nemaze di beşa dawî de ji bo hêsankirina axaftinê hin bêjeyên têkel jî xistine nav ferhengê. Mînak ev in:

*Belê, na, çewa, şûnde, a li vir, wuhareng, goya, şubh-manend, temennî, hawûn, eyza, ji nişkê ve, misl-şubhe.*

## **3. JI ALIYÊ ZIMAN VE**

*Mîrsadu'l-Etfal* ji aliyê bikaranîna ziman ve, xwedî naverokeke dewlemend e. Bêjeyên hemwate, diywate, nêzwate û hevdeng tê de gelek in. Her wiha gelek mînakên ji lêkerên bingehîn, rader, hevalnav û hokeran jî hene. Li jêr em dê li ser van mijaran rawestin.

### 3. 1. Bêjeyên Hemwate

Zarokên ku nû dest bi perwerde û hîndekariyê dikin, ji bo ku bikarin hevokan saz bikin û ji vegotinên hunerî sûd werbigirin, pêwîst e bêjeyên hemwate û diywate ezber bikin. Di ferhengê de gelek mînakên bêjeyên wiha hene.

Hemwateyên navê “Xwedê û pêxember” di farisî de wiha hatine rêzkirin:

- 1/3 Bizan navê **Xudê** *Şebzîr* û *Yezdan Daver* û *Şeyzer*  
28 *Xudavadar* e hem, *peyğember* û *vexşûr* e **peyğember**

Hemwateyên “hîv û roj”ê di farisî de wiha hatine rêzkirin:

- 1/4 *Meh* û *mehtab* û *mah* û *mahitab* in **hîv**, û *mîhr* e **roj**  
29 *Û* hem *xûrşîd* û *xerşed afîtab* û *hûr* û *xûr* û *xuver*

Hemwateyên “wucûd”ê di farisî de wek “endam, qed, ten û beden” dane:

- 2/5 **Meyxane** ye *xumxane*, *peymane qedeħ*, *peyman* e ‘**eħd**,  
45 *Endam* û *qedd* û *ten beden* cumle **wucûd** in, ‘**eyb** e ‘*ar*,

Hemwateyên “kund”ê di farisî de wek “kûken, kûke, kûkûve” dane:

- 7/5 **Bêhûş** e *deng*, *xengel zirix*, **hudhud** bizane *kevkel* e,  
128 *Kûken* û *kûke kûkûve* hersê çi? **kund** in, **qûm** e *rîk*,

Hemwateyên “xwar”ê di farisî de wek “kaj, lûç, kaç” dane:

- 8/3 *Faxite* **qumrî**, yû **hunguv engebîn**,  
133 *Kaj* û *lûç* û *kaç xuwar* in, **pîs** e *çîn*,

Hemwateyên “bûtperest”ê di farisî de wek “berhemend, berhemen, behrem” dane:

- 8/16 *Berhemend* û *berhemen* hem *berheme*  
146 **Butperest** in, **çirrik** e hem *çûbegîn*,

Hemwateyên “esman”ê di farisî de wiha dane:

10/9 *Heftiaba heftieyvan heftiporgar heftibam*

177 *Heftipeyker heftixatûn cumle **esman**, **hûr gorûş**,*

Hemwateyên “meydan û çol”ê di farisî de wiha dane:

10/20 *Isperes ispersef û isperz û isfersef heme*

188 *Isperesp û isperîs **meydan û çol** e, **hifz** e **gûş**,*

Hemwateyên “saman”ê di kurdî de wek “qesr, qerar, nizam, qudret, iffet û teref” dane:

3/17 **Qeşr** û **qerar** û **nizam** **qudret** û ‘**iffet teref**

75 *Cumle çî? *saman* bizan, **vekkirin** û **şûnde va***

Hemwateyên “dend”ê di kurdî de wek “feqîr, ehmeq, bêtirs, xudser” dane:

7/4 *Gale **çewal**, *gan* **layiq** e, *gave* **şecî**, **miqraž gaz**,*

127 *Dend e **feqîr** û **ehmeq** û **bêturs** û **xûdser**, **dîz** e *dîk**

### 3. 2. Bêjeyên Dijwate

Ji bo hînbûna ziman, bêjeyên dijwate gelek girîng in, lewra ezberkirina wan gelek hêsan e û zû di hişê mirov de dimînin. Zarokên 10-12 salî bi hêsanî dikarin bêjeyên dijwate di nav hevokan de bi kar bînin.<sup>141</sup> Di vî warî de *Mîrsadu’l-Ëfal* gelek xurt e. Di ferhengê de wek “feqîr-dewlemend, biçûk-mezin, jin-mêr, qelew-ze’îf, girî-ken, wucûd-‘edem, berjêre-evraz, nêr-mê, qenc-pelîd, belê-na, sulh-qewxe, zalim-edalet, hundur-derve, tarî-ruhnî, çiya-deşt, zû-dereng, qenc-xerab, xoşteb‘et-pîsteb‘et, tarî-şûle, bêav-puravxwarî” gelek bêjeyên dijwate hene. Di vî warî de digel malikên wan hin mînak ev in:

1/7 *Geda dervîş **feqîr** e, *pay* e **dewletmend**, û **ling pa***

32 ***Biçûk** e *kih*, **mezin mih**, hem *sehî* **mewzûn** e, **da mader***

1/9 *Rox û **sîma** û **çehre rû**, **gulî gîsû**, **birû ebrû**,*

34 *Zen û **hemser** çî ye? **Jin**, hem dibên **mêrê jinê şevher**,*

<sup>141</sup> Sedat Sever, *Çocuk ve Edebiyat*, Kök Yayıncılık, Ankara, 2003, r.37.

2/12 *Hestî wucûd, nîstî ‘ edem, bizdag e meşqel, doxt e keç,*

52 **Berjêre** ye şîb û nişîb, **efraz** e jor, û **muhtac** e zar,

3/15 *Dîr e dereng, zûd e zû, qenc e nîk, û bed xerab,*

73 **Te‘ imkirin** çaşînî, *daden* û *bexşîş ‘ eça,*

4/8 *Teşne* çî ye? **ê bêav, sîrab puravxuwarî,**

85 **Marê mezin** *ejderha,* **xatûn** çî ye? ew *banû,*

14/9 **Bi nermî** yû ewset **birêvçûn** e *pûy,*

236 **Şedîd û bilezçûn** e hem *pûyipûy,*

14/59 Hemî **çolê pur şeyd** û **suba‘** e *ded,*

286 We hem **ğeyrê subba‘** e *dam,* **mêr** e *red,*

### 3. 3. Bêjeyên Hevdeng û Nêzdeng

Di karê hîndekariyê de bêjeyên hevdeng û nêzdeng gelek bi kêr tên. Di ferhengê de gelek bêjeyên hevdeng û nêzdeng ên farisî hene. Digel malikên ku tê de derbas dibin hin mînak li jêr hatine rêzkirin:

“Xom” û “xem”:

1/13 *Xum* e **kûp,** û *xem* û *kec xuwar* e

“Peymane” û “peyman”:

2/5 **Meyxane** ye *xumxane,* *peyman* **qedeh,** *peyman* e ‘ **ehd,**

“Pehlû-pehlev-pehlewan”:

2/17 Pehlû çî? **kêlek, faîde** *pehlev,* behadur **pehlewan**

“Îne-ayîne-‘eyne-ayîn”:

3/7 *Îne* û *ayîne* çî? ‘ **eyne,** û *ayîn* **resim,**

“Genc” û “konc”:

82 *Genc xizne, û konc xelwet, roxsar çi ye? ew rû,*

“Peygale” û “peygare”:

4/10 *Peygale çi ye? kase, peygare bizan te‘n e,*

“Gale, gan, gave”:

7/4 *Gale çewal, gan layiq e, gave şecf’ ...*

“Kaxer, kaxe, kax”:

8/4 *Kaxer û kaxe çi? baran, kax qeşr,*

“Berna, bernak, bernas”:

9/8 *Berna cuwan, û bernak gafil, nezan e bernas,*

### 3. 4. Têgînnasî (Termînolojî)

Di ferhengê de ji aliyê termînolojiya giştî ve gelek bêjeyên balkêş hene. Mînaka “tîrê hewayî” gelek balkêş e ku bi tirkî “havaî fişek” tê gotin. Bêjeya “jimar”ê di wateya “parçe”ya farisî de û “tung” jî di wateya “muhir” de ye. Digel malikên ku tê de derbas dibin hîn mînak ev in:

4/3 *Key padişehê ‘adil, xoşteb’et e hem xoşxû*

80 *Dana çi ye? ê zana, pîşteb’et e hem bedxû*

4/8 *Teşne çi ye? ê bêav, sîrab puravxuarî*

85 *Marê mezin ejderha, xatûn çi ye? ew banû*

14/19 *Rimê kin çi? Jobîn û balûk e zûx*

246 *Ġem e dûd, û tîrê hewa’î çi? Dûx*

14/30 *Bizan bavê Adem cehanê kehîn*

257 *We hem masiwallah cehanê mehîn*



Ji aliyê termînolojiya giştî ve bêjeyên balkêş ên ku me tesbît kirine, digel farisiya wan ev in:

*Çahê zenex bîra çenê/ xiram xweşmeş/ pûpek bakir/ xoşxû xoşteb'et/ bedxû pîsteb'et/ teşne ê bêav/ sîrab puravxwarî/ bîxab xewlêbuhurî/ ejderha marê mezin/ san jimar/ eng tung/ moğak kort/ mişkû barîca menzîla sultan/ dend xûdser/ şane xudrabûna hesp/ xorsend mudamşad/ nesîrem mudamtarî/ şadab purav/ şadan xweşhal/ nûş ava heyatê-penzêhar-guwara/ letîn efrincî/ abitîn xweyigotin/ dûx tîrê hewai/ golbang dengêhezar*

### 3. 5. Bêjeyên Farisî yên ku bi Raveya wan ên Kurdî Hatine Dayin

Di ferhengê de hin bêjeyên farisî, ne bi bêjeyêke kurdî lê bi raveyên wan ên kurdî hatine dayin. Bêjeyên farisî yên ku bi raveyên kurdî derbas dibin, ev in:

6/15 'Erdê ku pir ber be çi ye? *senkolax*

11/6 Çi ye dengê di şûran? *Çekaçak û çekçak*

199 Çiringîden çi? *Yê gurz, we hem sukranî mestî*

14/8 *Nevende siviçûn, û qaşid nevend*

235 *Jina feş û pîskar û tenbel levend*

14/9 *Bi nermî yû ewset birêvçûn e pûy*

236 *Şedîd û bilezçûn e hem pûyipûy*

14/10 *Deve w hesp û heywanê mestir heyûn*

14/17 *Xeberdanê bêhûde tamat û laf*

244 *We hem qaf û zal û dirûg û gezaf*

14/59 *Hemî çolê pur şeyd û suba' e ded*

286 *We hem geyrê subba' e dam, mêt e red*

Ev jî bi heman awayî ne:

Farisî

dîba û dîbe perniyan

peyam

sonder û senderûs

xonokcan

xemûş

verz

tamat û laf

jaj

petik

gev

şane

nal

bezm

nefir

Kurdî

**qumaşê meqbûl**

**tenbîhatê qasid**

**bi şûret xweşik**

**kesê bêdil**

**dewarê mûtî<sup>c</sup>**

**daîmî çandin**

**xeberdanê bêhûde**

**bêhûde gotin**

**hursê hedad**

**sewtê gelek ‘alî**

**xûdrabûnê hesp**

**perrê nav qelem**

**cihê ‘işret û mêhvanî**

**sedayê def û gerrê nay**

### 3. 6. Lêkerên Bingehî

Kerbelayî di ferhengê de bêtir awayê fermanî yên hin lêkerên bingehî yên wek “danîn, anîn, bihîstin, hisabkirin, hatin, rabûn, çûn, meşîn, helandin, firîn, revîn” bi kar anîne. Her wiha li hin deran lêkerên erebî yên “uskut, te’eyyûn û wd.” jî bi kar anîne. Digel farisiya wan ev lêker ev in:

<b>deyne</b>	nih
<b>bîne</b>	biyaver
<b>bibîz</b>	bişnev û binyûş
<b>hisab ke</b>	pindar
<b>were</b>	xel
<b>uskut</b>	xemûş
<b>rabe here</b>	berxîz û berew
<b>bimeşe</b>	çem, çel

### 3. 7. Rader

Di ferhengê de hejmareke mezin ji mînakên raderan hene. Rader, bêtir di beşa 14an de hatine rêzkirin. Her wiha hin malik bi temamî ji raderan pêk hatine.

Mînak:

5/3 **Nuqîn** çekîden, **qulkirin** e *soften*

96 **Gestin** gezîden, **galgal** e *goften*

14/28 Bizan **muxtelitkîrin** e *amîxiten*,

255 **Kişandin** çi? *Berhexten ahîxiten*,

Em dê raderên ku di *Mîrsadu'l-Etfalê* de derbas dibin li gorî qaydeyên rêzimanî ya kurmancî bisenîfin.

### 3. 7. 1. Raderên Xwerû

Raderên xwerû ji bêjeyekê tenê pêk tên û wekî parçeyên watedar nayên parçekirin; mînak: hatin, pirsîn, gotin. Hin malikên ku raderên xwerû tê de derbas dibin, bi vî awayî ne:

13/4 **Tezwîr** e *terfend*, *terhende tezyen*, **kêşan** *terîden*, **lerzîn** *tepîden*,

14/22 **Te' eyyûn** *gomaştên*, we **emr** e *gomar*,

14/23 *Sokaliş* **te'emmul**, *şigerf* e **leţif**,

250 *Şikifte* **te' eccub**, **qirişqal** e *tif*,

14/26 Bizan *rûde* **rêvî**, **teweqqu'** *teraş*,

14/28 Bizan **muxtelitkîrin** e *amîxiten*,

255 **Kişandin** çi? *Berhexten ahîxiten*,

14/33 *Veriz* **da'imî çandin** e hem *çesem*,

260 *Vezîden* çi? **Rabûn** e, **eyza** ye *hem*,

Raderên xwerû yên ku me tesbît kirine digel farisiya wan ev in:

<b>şemitandin</b>	: leğz
<b>qet‘ û pêçan</b>	: niverden
<b>girîn</b>	: girye
<b>ken</b>	: xend
<b>qet‘</b>	: gusil
<b>gotin</b>	: sigal
<b>nuhrandin</b>	: zemzeme
<b>çandin</b>	: kaştên
<b>‘eta</b>	: daden û bexşîş
<b>tecesus</b>	: rû
<b>borîn</b>	: gozeştên
<b>qirîn</b>	: gevga
<b>şûştin</b>	: şist û şû
<b>nuqtîn</b>	: çekîden
<b>gestin</b>	: gezîden
<b>çûyîn</b>	: reften
<b>honan</b>	: baften
<b>razan</b>	: xoftên
<b>bîstin</b>	: şonoften
<b>qelşîn</b>	: koşoften
<b>hatin</b>	: xel
<b>revîn</b>	: cesten
<b>xap(în)</b>	: labe
<b>kelîn</b>	: cûş
<b>se‘y</b>	: kûş
<b>borîn</b>	: isperî
<b>bihîstin</b>	: nûş
<b>pirsîn</b>	: yûş
<b>zarîn</b>	: efgan, enîn
<b>leqandin</b>	: conban
<b>sekin</b>	: sîtaden
<b>tezwîr</b>	: terfend
<b>tezyîn</b>	: terhend

<b>kêşan</b>	: terîden
<b>lerzîn</b>	: tepîden
<b>te‘eyyûn</b>	: gomaştên
<b>te‘emmul</b>	: şokalîş
<b>te‘eccub</b>	: şokîfte
<b>teweqqu‘</b>	: teraş
<b>kişandin</b>	: berhexten, ahîxten
<b>avêtin</b>	: endaxten
<b>helandin</b>	: godaxten
<b>mirin</b>	: morden
<b>lef(în)</b>	: jûl
<b>fir(în)</b>	: pervaz
<b>hek</b>	: sotorden
<b>rev(în)</b>	: gorîz
<b>qelşîn</b>	: çak

### 3. 7. 2. Raderên Nexwerû

#### 3. 7. 2. 1. Raderên Darijtî

Raderên ku pêşgir girtine ew raderên darijtî ne. Di kurmancî de pêşgirên wekî “ve, da, ra, wer, hil” tên pêşiya raderan û raderên nû çê dikin. Raderên darijtî yên ku me tesbît kirine digel farisiya wan ev in:

<b>vekirin</b>	: va
<b>rakirin</b>	: engîxten
<b>lêgerandin</b>	: costen
<b>rabûn</b>	: cesten
<b>bergerîn</b>	: labe
<b>rabûn</b>	: vezîden
<b>berhevdan</b>	: elfexten-elfaxten-elfîden-enduxten

#### 3. 7. 2. 2. Raderên Hevedudanî

Raderên hevedudanî ji bêjeyeke watedar û radereke xwerû pêk tînin. Raderên hevedudanî yên ku me tesbît kirine digel farisiya wan ev in:

<b>bawerkirin</b>	: ostovar
-------------------	-----------

<b>te<sup>ç</sup> mkirin</b>	: çasnî
<b>zehmetîkêşan</b>	: renc
<b>naskirin</b>	: şinaxten
<b>qulkirin</b>	: soften
<b>galgal(kirin)</b>	: goften
<b>birînkirin</b>	: şiften
<b>cudakirin</b>	: keften
<b>te<sup>ç</sup> mkirin</b>	: nûş
<b>gazîkirin</b>	: bang-nîda
<b>muxtelîtkirin</b>	: amîxten
<b>bilindkirin</b>	: efraxten
<b>rohnkirin</b>	: efrûxten
<b>te<sup>ç</sup> zîmkirin</b>	: nevaxten-nevazîş
<b>hisabkirin</b>	: engaştên
<b>tijîkirin</b>	: enbaştên
<b>guman(kirin)</b>	: engaştên
<b>sobeyî(kirin)</b>	: şinav, şinaver, şitar, şinah
<b>xeftbûn</b>	: nihoftên
<b>germbûn</b>	: teften
<b>xelasbûn</b>	: cesten
<b>xelasbûn</b>	: isperî
<b>zûhedimbûn</b>	: govvara
<b>nizimbûn</b>	: xûpestî
<b>rehetbûn</b>	: tendorostî
<b>tijîbûn</b>	: lemalem
<b>purbûn</b>	: dergîş
<b>sivikbûn</b>	: celd
<b>mutî<sup>ç</sup> bûn</b>	: taras
<b>mutî<sup>ç</sup> bûn</b>	: ram
<b>xerabûn-<sup>ç</sup> edembûn</b>	: payimal
<b>girêdan</b>	: bendî
<b>deyndan</b>	: endûxten
<b>dujîndan</b>	: doşnam

<b>rêvçûn</b>	: deman
<b>sivikçûn</b>	: nevende
<b>bi nermî û ewset birêvçûn</b>	: pûy
<b>şedîd û bilezçûn</b>	: pûyîpûy
<b>xweşmeş(în)</b>	: xiram
<b>wida' xwestin</b>	: pedrûd
<b>binermîxwarin</b>	: govara
<b>daîmîçandin</b>	: verz
<b>bêhûdexeberdan</b>	: laf û gezaf
<b>bêhûdegotin</b>	: jaj

### 3. 8. Bêje, Qertaf û Vegotinên ku Hatine Bikaranîn

Nivîskar di vegotin û rêzkirina bêjeyan de awayekî têkel bi kar aniye. Carina hevokên pirsê, carina hevokên quliptî û carina jî hevokên birist saz kirine. Nivîskar gelek caran hem ji bo rewankirina vegotinê, hem ji bo lihevanîna kêşê hin bêje û vegotinên ku ne ji ferhengê ne, bi kar anîne. Ev bi piranî kurdî ne, lê belê carina yê erêbî û farisî jî hatine bikaranîn. Bêje û vegotinên ku nivîskar bi kar anîne li gorî rêza alfabetîk ev in:

*Bê riya, bêşik, bêşik bizane, bi, binase, bira, bizan, bizane, binas, cumle, cumle çi, çi, çi ne, çi ye, di, dibên, dibêne, e, ê, emr e, ew, ew jî, ew jî ew, ey, ey can, eyan, fa'îl, heft, hem, heme, hemî, hemîn, her, her heft, her çar, her du, her sê, in, jî, keza, kezalik, kezalike, ku, mislê wê, ne, nêr û mêr, pirsî, tu, tu bizan, tu ew baş bizan, û, û hem, wê, we hem, wesfê, wî, wuhareng, wusan, xû, xuwe, ya, ye, yê yê, yeqîn*

## BEŞA SÊYEM

### TRANSKRÎPSIYONA MÎRSADU'L-ETFALÊ

#### 1. 1. Taybetiyên Nusxeya Daner a Mîrsadu'l-Etfalê

Berhem wek nusxeya daner a bi destê Kerbelayî hatiye nivîsîn, di pirtûkxaneyê Şêx Şafî ya şexsî de ye. Taybetiyên vê destxetê bi vî awayî ne:

Berg û pelên wê ji muqaweyê ne. Nivîs, bi hubra reş, bi xetên nesîx digel herekeyan, bi awayekî ku bê xwendin hatiye nivîsîn. Hin têbinî bi hubra sor hatine nivîsîn. Hejmara pelên (wereq) wê 21 in û di her rûpelekê de hejmara ristên wê 9 in. Ebatên berg û nivîsê di dirêjahiya 17x24 cm de ye. Bêjeya wê ya taqîbê û qeyda wê ya ketebeyê heye.

Di zehriyeyê de derbarê pirtûkê de tu nav û nîşan nîn in, tenê çend malik bi awayê mesnewiyê hene. Lê belê ji ber ku ew bi qelemzirîçê hatine nivîsîn baş nayên xwendin. Yê ku tîn xwendin ev in:

Bihar hat û dilê Leyla birîndar

Ji xewfa serkeşê kul eskerê xar

Dibarin li her xuryan bikiret

Neqşkirin rûyê zerê nameê bixet...

Serlewheya destxetê bi şax û pelên kulîlkan hatine neqîşandin.

Hevoka destpêkê ya berhemê ev e:

*“Bismillahirrehmanirrehîm we bihi neste ‘în”.*

Hevoka dawî ya berhemê ev e:

*“We ene ‘l-feqîru ‘l-ħeqîr, el-mu ‘terîfu bî ‘l- ‘eczi we ‘t-teqşîr Muħemmed Kербelaî Bedruddîn el-mużnib îbnî Şeyx ‘Ebdîrrehman îbnî Şeyx Ĥesen en-Nûranî, qeddese ‘l-lahu te ‘ala esrarehuma ‘l- ‘eliyyete, amîn. We efađe ‘eleyna kema efađe ‘ele ‘l- ‘alemî enwarehuma, amîn.”*

Qeyda wê ya ketebeyê ev e:

*“we be ‘d: Qed etmemtu hazîhî ‘r-rîsalete ‘l-musemmate bî Mîrşadî ‘l-Effalî fî senetî şegla ew eşğel fî şehri Şe ‘bane ‘l- ‘ezîmî yewme ‘l-Cumu ‘etî qubeyle ‘l- ‘eşrî fî Medresetî Aqtepe şanehe ‘l-lahu ‘enîl-afatî we ‘l-belîyyat.”*

## **1. 2. Sazkirina Metna Mîrsadu ‘l-Etfalê**

Di vekolîn û transkrîbekirina metnê de, me ev rê şopand.

1) Me pêşî li gorî rûpelên nusxeya daner a li ber dest, hemû rûpelên berhemê bi numare kirin. Me ew numare di nav kevaneka çargoşe “[ ]” de nîşan dan.

Mînak: rûpela pêşî bi **[1b]** yê dest pê dîke û heta rûpela dawî ya **[21a]** yê dewam dîke.

2) Numarekirina malikan me bi du kategoriyan nîşan dan.



Kategoriya yekem, numarekirina ji bo malikên nav beşê ye. Numareya pêşî, rêza beşê ya di nav temamê beşên din de, numareya piştî xêzexwarê jî rêza malikê ya bes di nav wê beşê de nîşan dide.

Kategoriya duyem numarekirina bi giştî ye. Numareya di binê wan de jî, rêza malikê ya di nav temamê malikan de nîşan dide.

Mînak:

4/8 *Teşne* çî ye? **ê bêav**, *sîrab* **puravxuwarî**,  
85 **Marê mezin** *ejderha*, **xatûn** çî ye? ew *banû*,

Di malika jorîn de sê numare hene. Numareya “4”ê rêza beşê nîşan dide. Numareya “8”ê ya ku piştî xêzexwarê ye, nîşan dide ku di nav wê beşê de malika 8. e. Numareya “85” jî tê wateya ku ew di nav hemû malikan de ya 85. e. Eger em cihê vê malikê bi kurtasî bêjin: ev malika 8. a beşa çarem e û di nav temamê malikan de jî ya 85. e.

Me tenê ji bo beşa destpêkê (girîzguh) di wateya “destpêk”ê de “D” bi kar anî. Mînak:

D/1 Bi ismê padişahê ‘alemaray  
1 Bi hemdê zî’l-celalê nuqîbexşay

Cihê vê malikê ev e: ev malika yekem a beşa destpêkê ye û di nav temamê malikan da ya yekem e.

3) Me bêjeyên kurdî bi fontên **stûr**, ên farisî jî bi fontên *italîk* nîşan dan. Di navbera bêjeyên beramberî hev û yên din de bi nîşandeka bêhnokê hat diyarkirin ku êdî bêjeyeke din dest pê dike. Yanî çî cara ku bêhnok hebe divê bê zanîn ku bêjeyeke nû dest pê dike.

4) Têbiniyên ku di destxetê de hatibûn nîşandan, me ew hemû di metna transkrîpsiyonê de wek jêrenot nîşan dan. Her wiha me têbiniyên ku daner bi zimanê farisî nivîsandibûn jî wergerandin kurdî.

5) Di transkrîpsiyonê de metna orijînal wekî xwe ma, lê belê di amadekirina ferhengê de me awayên wan ên rast nivîsandin. Lewra gelek car ji bo lihevanîna kêşê nivîskar ew dirêj an kurt kirine.

Mînak:

Rasita: *rasta*, badipa: *badpa*, beften: *baften*, ahing: *aheng*, ahiste: *aheste*  
Bi heman awayî me bejeyên kurdî jî rast kirin.

Mînak:

Birînkirin: *birînkirin*, rakirin: *rakirin* qulkirin: *qulkirin* naskirin: *naskirin*, bîstin: *bihîstin*,  
cudakirin: *cudakirin*, jinê bêmêr: *jina bêmêr*, turs: *tirs*, muxtelitkirin: *muxtelitkirin*

Nêritî û mêritiya bêjeyên kurdî yên di ferhengê de hatin rast kirin.

Mînak:

jinê bêmêr: *jina bêmêr*

xudrabûnê hespê: *xudrabûna hespê*

#### 6) Alfabe ya transkrîpsiyonê

ء	: ʾ	ظ	: Zz
ث	: Ss	ع	: ʿ
ح	: Hh	غ	: Ğğ
خ	: Xx	ق	: Qq
ذ	: Zz		
ص	: Şş		
ض	: Dd		
ض	: Żż		
ط	: Tt		

Herçend di sîstema latînzekirina tîpên erebî de خ wek “H, h” û ق wek “K, k” tên nîşandan jî, ji ber ku di alfabe ya latînî ya kurdî de ev her du tîp jixwe wek “X, x” û “Q, q” hene, me jî di transkrîpsiyonê de ev her du tîp bi kar anîn.

#### 1. 4. Mîrsadu’l-Etfal (Şahrahê Kûdekan)

[1b] Bismillahirreḥmanirreḥîm we bihî neste‘în

D/1 Bi ismê padişahê ʿalemaray

1 Bi hemdê zî’l-celalê nuṭqibexşay

D/2 Şehinşahê cihan û kewn û ezman

2 Xudawendê sema û xuld û nîran

- D/3 Bi emrê kun du ‘ alem aferandin  
3 Bi kewkeb asiman wî zeyyinandin
- D/4 Şelat û wendîşê xellaqê ‘ alem  
4 Li ser wî seyyidê ewladê Adem
- D/5 Şehê mesnedgehê lewlake lewlak  
5 Emînê Heq kelîmê Tûrê Eflak
- [2a] Sezayê xelmetê Taha û Yasîn  
6 Guwahê şe`nê û Hamîm û Tasîn
- D/7 We hem ser al û eşhabê di kubbar  
7 Qeder zerrat û dar û reml û ezhar
- D/8 Ji piştî besmele w hemd û şelatan  
8 Du sê lefzê di şîrîn ez luğatan
- D/9 Me pev xist û di nav hev kirne telfif  
9 Ji bo eclê ku da bit sehl û texfif
- D/10 Li ser eţfal û ewladê di kurdan  
10 Lisanê farisî yû meqsedê wan
- D/11 Bi Mirşadu’l-Tîfal min kirye nîşan  
11 Ji mewla min rica ye nef‘ ê îşan
- D/12 Me her wek Newbuharê Şêxê Xanî  
12 Esasê wê ji bo eţfalê danî
- D/13 Ku da newrestegan û newnihalan  
13 Melekteb‘anê kurdan pur şepalan

- D/14 Bikin se‘ yê di vê mirşadê eqser  
14 Bigîjin meqşed û rahê di enwer
- [2b] Çikû ezmanê fursê pur ‘ ecîb e  
15 Kesê ku zanibe gâyet edîb e
- D/16 Xişûşen ez miyanê wan du şehbaz  
16 Hêsîbanê nesîbanê serefraz
- D/17 Bi şubhê şems û bedrê şaf û rewşen  
17 Di nav necmê tîfalan de mu‘ eyyen
- D/18 Muhemmed ‘ Eskerî yû Neqşibendî  
18 Ew in ‘ illet ji vê tertîb û bendî
- D/19 Yekî nefsê bira ye pur temîz e  
19 Biraderzade ye dîger ‘ ezîz e
- D/20 Sebeb her du nihâlê gulşenê min  
20 ‘ Ezîzanê dil û canê tenê min
- D/21 Nebin bêbehre ez deryayê pur durr  
21 Ji behrê fursê derxin gewherê pur
- D/22 Umîda min ev e der şa‘ et û dem  
22 Ji her du newciwananê di bêgem
- D/23 Di weqtê dewr û ders û se‘ y û tekrar  
23 Bibêjin, ey gelî agayê kubbar

- [3a] Eşîmê Kerbelayî hûn rica kin  
24 Ji bin barê guneh wî wariha kin
- D/25 Feqîr e dilkul e ğayet neçar e  
25 Ji ğeyrê we nehin ummîd û çare

## 1

### el-Qiṭ'etu fî Behri'l-Hezec es-Salim el-Muşemmen

- 1/1 'Ilim ez behrê insan dewletê dunya û 'uqba ye  
26 Kesê 'alim muheqqeq tacidarê her du dunya ye
- 1/2 Mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun mefa'îlun  
27 Hezec salim muşemmen bit şebîhê durrê yekta ye
- 1/3 Bizan navê **Xudê Şebzîr** û *Yezdan Daver* û *Şeyzer*  
28 *Xudavadar* e hem, *peyğember* û *vexşûr* e **peyğember**,

- 1/4 *Meh û mehtab û mah û mahitab in hîv, û mihr e roj*  
29 *Û hem xûrşîd û xerşed afitab hûr û xûr û xover,*
- 1/5 **Enîs** e *gemkosar û hemnişîn û hemdem û hemgem,*  
30 **Şerab** e *bade, û şûşe şura hî, yû qedeḥ saġer,*
- 1/6 *Kenar e kêlek, û leb lêv, û bînî poz, û çeşm e çav,*  
31 *Zeban ezman, diran dindan, û sermil dûş, heval yaver,*
- [3b] *Geda dervîş feqîr e, pay e dewletmend, û ling pa,*  
32 **Biçûk** e *kih, mezin mih, hem sehî mewzûn e, da mader,*
- 1/8 **Refîq** e *hemreh, û dana û danişmend e ‘aqilmend,*  
33 *Peder bav, û birader çi? bira, û xuşk e hem xaher,*
- 1/9 *Rox û sîma û çehre rû, gulî gîsû, birû ebrû,*  
34 *Zen û hemser çi ye? Jin, hem dibên mêrê jinê şevher,*
- 1/10 *Reh e rê, rahirev rêwî, yû çeşme kanî, û dih gund,*  
35 *Şehir bajar e, xane û xanî, û pîşiva rehber,*
- 1/11 *Moje mojgan bijank in, neġz e nazik, leġz e şemţandin,*  
36 **Meḥebbet** *mihr, û ḥeb dane, sifîd û zerd sipî yû zer,*
- 1/12 *Noxostîn ewwel, can e ruḥ, ligam dizgîn, û bak e tirs,*  
37 **Jinû zanû,** *û pe‘nî paşine, hem cewher e gevher,*
- 1/13 *Xum e kûp, û xem û kec xwar e, enguşt e tilî ey can,*  
38 *Niverden qeṭ‘ û pêçan e, sipehsalar e ser‘esker,*
- 1/14 *Xonok fexende meqbûl in, girîn girye û xend e ken,*

39 Novî **Qur'an**, *nevîn nû*, *sîb* e *sêv*, û *sayis* e *mehter*,

1/15 *Xudavend* û *şehinşeh şehriyar* û *şeh* çi? **Sulţan** in,

40 *Etabik* çi **wezîr**, û **nûr** e *tef*, **gustîr** e *enguşter*,

2

[4a] **el-Qiţ' etu fi Behri'r-Recez es-Salim el-Muşemmen**

2/1 Ger kes bi eşl û 'eql û heş wî 'ilmekî qenc xwendiyê

41 Çun der 'emel se' yê bike şahibmeqam û şofi ye

2/2 Mustef' ilun mustef' ilun mustef' ilun mustef' ilun

42 Salim muşemmen bit recez, mişlê muhîta Hindî ye

2/3 Weşfê **Xuda** ye *Kirdigar Perverdigar Amorzigar*

43 Hem *Aferînde* bizan hem *Mihriban* hem *Payidar*,

- 2/4 *Jale xunav, û şeb şev e, derya ye behr, û xak e ax,*  
44 **Şebr** e şikîb, sûziş şewat, gejdome e ‘eqreb, me’ r e mar
- 2/5 **Meyxane** ye xumxane, peymane qedeḥ, peyman e ‘eḥd,  
45 *Endam û qedd û ten beden cumle wucûd in, ‘eyb e ‘ar,*
- 2/6 **Dar** e dirixt, û meyve ber fikî ye, engûr e tirî,  
46 *Çahê zenex bîra çenê, dirrî xes û xaşak û xar,*
- 2/7 **Ahû gēzal, xoşmeş xiram, goncişk e serçe, dem nefes,**  
47 *Nexçîr e nêçîr, dav e dam, şimşîr e şûr, û def e bar,*
- 2/8 *Ferbih qelew, laġer ze’îf, tazî kihêl, ranîn zirix,*  
48 **Şeker** teberzed, kebk e kew, cû nehr, û cûyik cûyibar,
- [4b] *Golzar û golşen golistan hersê mekanê gulkûnî,*  
49 **Sazlig** çi? Bişe, gil herî, mērg e çîman û merġozar,
- 2/10 *Aşifte sewda, dîde çav, meḥbûb e şûx û dilroba*  
50 *Dilbend dilaram dilferîb dilber dilavîz dûst û yar,*
- 2/11 *Kûh e çiya, hamûn e deşt, qaḥ e terîq e rahizen,*  
51 *Xûb e xuweşik, seng e kevir, yar rayika, û serd e sar,*
- 2/12 *Hestî wucûd, nîstî ‘edem, bizdaġ e meşqel, doxt e keç,*  
52 **Berjêre** ye şîb û nişîb, efraz e jor, muḥtac e zar,
- 2/13 *Arê belê, ne na, û nih deyne, biyaver bîne tu,*  
53 *Serhing û serdar çawîş e, leşker nefer, bêqam neçar,*



- 2/14 *Xergah û xîme çadir e, menzel oşaq û barigah,*  
 54 *Şeyda ye dîn, û aşitî sulh e, û qewge karizar,*
- 2/15 *‘Esker sopah, zalim sitemkar, û ‘edalet dad e hem,*  
 55 *Ferzane ferheng hûşimend cumle zekî yû hûşiyar,*
- 2/16 *Rûbah rêvî, mûş mişk, pidram muzeyyen, nîş e moz,*  
 56 *Şenkaş hesed, pasix cewab, mektûb e name, pîşe kar,*
- 2/17 *Pehlû çi? kêlek, faîde pehlev, behadur pehlewan,*  
 57 **Bawerkirin** hem mu‘ temed mezbûte hersê *istivar,*
- [5a] *Nevbaş e daîm, nevdere lawê ‘ezîz e, nû ye nev,*  
 58 *‘Erş e berîn û gerzeman<sup>142</sup>, kertenkele<sup>143</sup> çi? sûsimar,*

### 3

#### el-Qiṭ‘etu fî Behri’l-Munserix el-Meṭwî el-Mekşûf

- 3/1 *‘Edl û sexa û edeb karê kesê mu‘ teber*  
 59 *Şaḥîbê zulm û fucûr daîme ew bêhuner*
- 3/2 *Mufte‘ ilun fa‘ ilun mufte‘ ilun fa‘ ilun*  
 60 *Meṭwî û mekşûf e ev munserixa baxeber*
- 3/3 **Şofi** ye *şafîderûn, rêber e hem rehnoma,*

<sup>142</sup> Di destxetê de di jimareya vê bêjeyê de şaşiyek çêbûye, li ser “sûsmar” hatiye hesabandin.

<sup>143</sup> Di destxetê de li ser vê bejeyê di wateya tirkî de ‘(ت) t’ heye û li jora wê nivîsandiye “weya bi kurdî gumgumok”

- 61 **Qaşid** e *peyk*, û *kosel qeṭ*<sup>c</sup>, û *çisan* e **çewa**,
- 3/4 *Kilk* e **qelem**, *lewn* e *fam*, *kûdek zarok* e hem,
- 62 *Bendî girêdan* e hem, **medḥ** e *yeqîn rasita*,
- 3/5 *Cam* û *peyale qedeḥ*, *encomen* e **cem'iyet**,
- 63 **Mêrg** e *bizan sebzezar*, **bêxwedî** ye *bîneva*,
- 3/6 *Bîxûd* û *mest* û *xerab bêhiş* e, *veşt* e **xweşik**,
- 64 *Naxon* e **neynûk**, *gorûh cem'* e, *sipas* e **şena**,
- 3/7 *Îne* û *ayîne çî?* **'eyne**, û *ayîn resim*,
- 65 **Zînet** e hem, **gewrî** ye *kam* û *golûh ey bira*,
- [5b] *Sazizen* û *saznevaz mitrib* e û *sazibend*,
- 66 *Şahide meḥbûb* e, hem *şem'* û *çirağ* e **çira**,
- 3/9 **Ke' nî felaxen kolûx**, **duşmenî gotin sigal**,
- 67 **Tizbî** ye *şed dane*, hem **xan** çî ye? *kervansera*,
- 3/10 **Şuhret** û *mekr demdeme*, *meymenedar* e **qewas**,
- 68 *Zemzeme nuhrandin* e, **babet** û **layiq seza**,
- 3/11 *Peyğem* û *peyğam peyam tenbihatê qaşid* in,
- 69 *Exger bizot 'aşiqî*, *kanûn tifik*, *bad* e **ba**,
- 3/12 **Katib pinag** û *debîr*, **mexfi** ye *ponhan penam*,
- 70 **Weqtê seher bamidad**, **hesp** e çî ye? *badipa*<sup>144</sup>,

<sup>144</sup> Li kêlekê bi zimanê farisî nivîsandiye ku “*în nîz kinaye ez esp ve her çîzî be sor 'et ve(...)mîbaşed*”, “yanî ev jî kîna ye ji hesp û her tiştê ku bilez be”.

- 3/13 *Xar û perîşan zelîl, gônçe çi? Bişkojê gul,*  
 71 **Bakir** e *pûpek bizan, dunya sipencîsera,*
- 3/14 *Şane şe, û şûjin e sûzen, û buryan kebab,*  
 72 **Çandin** e hem *kaşiten, peşm e hirî, kah e ka,*
- 3/15 *Dîr e dereng, zûd e zû, qenc e nîk, û bed xerab,*  
 73 **Te' imkirin** *çaşinî, daden û bexşîş 'eşa,*
- 3/16 *Bişnev û binyûş bibîz, zehmetîkêşan e renc,*  
 74 *San e jimar û misil, 'eql e xired bê riya,*
- [6a] **Qeşr** û **qerar** û **nîzam** **qudret** û **'iffet** **teref**  
 75 *Cumle çi? saman bizan, vekkirin û şûnde va*
- 3/18 **Qa'ide** û **terz** e *tevr, û tûq çi ye? pîrêjin,*  
 76 **Torin** û *neğme mezin 'esker û qût e neva,*
- 3/19 *Dîvçe zîro bizûz, xûz çi ye? neyşeker,*  
 77 **Baz** we **saħibmeqam** *sencer, sîwak sena*

#### 4

#### el-Qiř'etu fî Behri'l-Hezec el-Eħzeb

- 4/1 Ser qafîleê xûban ez alê 'eba nevzad  
 78 Ez destê gonahê xod ber to bekonem feryad
- 4/2 Mef' ûlun mefa' ilun mef' ûlun mefa' ilun  
 79 Behrê hezecê eħzeb xalî buved ez ezdad

- 4/3 *Key padişehê ‘adil, xoşteb’ et e hem xoşxû,*  
80 *Dana çi ye? ê zana, pîşteb’ et e hem bedxû,*
- 4/4 *Şeşreng çi ye? Setrinc e, vajûne û vajûn nehs,*  
81 **Bêşerm û heya xîr e, û mehbûb çi ye? dilcû,**
- 4/5 *Tarîk çi ye? Tarî ye, şu’ le tu bizan pertev,*  
82 *Genc xizne, û konc xelwet, roxsari çi ye? ew rû,*
- [6b] *Kalibod û hem peyker kalib çi ne? Ew qalib,*  
83 *Kala çi? meta’ e, û jav xaliş, tecesus rû,*
- 4/7 *Efsane û dasitan çîrok in û destan hem,*  
84 **Sahîr çi ye? efsûnsaz efsûnger û hem cadû,**
- 4/8 *Teşne çi ye? ê bêav, sîrab puravxuarî,*  
85 **Marê mezin ejderha, xatûn çi ye? ew banû,**
- 4/9 *Sersem kî ye? ê mexmûr, xewlêbuhurî bîxab,*  
86 *Revkeş çi ye? ew dunya, dem kibr e, û canib sû,*
- 4/10 *Peygale çi ye? kase, peygare bizan te’ n e,*  
87 *Germabe çi ye? hëmmam, cennet tu bizan mînu,*
- 4/11 *Bîvend e jinê bêmêr, bîhen çi ye? ew sîxur,*  
88 **Borîn e gozeştên, hem bîna genî ye bedbû,**
- 4/12 **Qehpe tu bizan rûspî, ‘aqîbet e hem encam,**  
89 *Pindar e hisab ke tu, bulbul çi ye? ew narû,*

4/13 **Naskirn** e *şinaxten*, hem *sûrax* e **qulik**, ey can,

90 **Rakirn** e *çi? engîxten*, hem **walide** ye *marû*,

4/14 *Donbal* e *çi ye? dûv* e, *dervaze* bizan **dergeh**,

91 *Kûj qews*, û **qirîn** *gevga*, **ţûţî** *çi ye? ew sarû*,

[7a] *Ahing* *çi ye? qeşd* e, hem **dengêhez**ar e *golbang*<sup>145</sup>,

92 *Ġev şewtê gelek* ‘**alî**, **şûştin** *çi ye? şist û şû*,

4/16 *Ahiste* bizan **hêdî**, *daşab* **sexawet** e hem,

93 *Hemvare* *çi ye? daîm*, **derman** *çi ye? ew darû*,

## 5

### el-Qiţ‘etu fî Behri’r-Recez el-Meşţûrî el-Mureffel

5/1 Çeşmê di şehla zulfê muselsel

94 Ez kirme waleh ey yarê efzel

5/2 Mustef‘ ilatun mustef‘ ilatun

95 Behra recez bû şeţr û mureffel

5/3 **Nuqţîn** *çekîden*, **qulkirn** e *soften*,

---

<sup>145</sup> Di destxetê de di binê bejêyê de nivîsandiye “ye ‘nî bolbol”, “yanî bilbil”.

- 96 **Gestin** *gezîden*, **galgal** e *goften*,
- 5/4 *Bisyar* û *bes pur pûr*, û *poser kur*,
- 97 *Mog* çi ye? **kafir**, **çûyîn** e *reften*,
- 5/5 *Salûs* û *xûdbîn* her du **muraî**,
- 98 *Varûn* çi ye? **şûm**<sup>146</sup>, **honan** e *beften*,
- 5/6 ‘**Edl** û **heya** ye *azerm* û **taqet**,
- 99 *Barîk* e **riqqet**, **razan** e *xoften*,
- [7b] *Fertût* û *hirrat pîrê rizi*<sup>147</sup> ne,
- 100 *Eknûn* e **anha**, **xefbûn** *nehiften*,
- 5/8 **Penbû** ye *penbe*, **dûv** e *xû donbe*,
- 101 *Bûstan* e **beğçe**, **germbûn** e *teften*,
- 5/9 *Bare heq* û **hesp**, **ga’ib** çi ye? *şesp*,
- 102 *Ağaz ewwel*, **birînkirn** e *şiften*,
- 5/10 *Kişver* û *koşxer* her du ne **iqlîm**,
- 103 *Şengerk* e **nazik**, **bîstin**<sup>148</sup> *şonoften*,
- 5/11 **Mircan** e *bistam*, **weqt** e *xuwe hingam*,
- 104 *Berhûn* e **zînet**, **cudakirn** e *keften*,
- 5/12 **Şabûn** e *berhûh*, **nîsk** e çi? *enjoh*,
- 105 *Sipsar* e **dellal**<sup>149</sup>, **qelşîn** *koşoften*,

<sup>146</sup> Di destxetê de ‘*varûn*’ bi kurdî, ‘*şûm*’ bi farisî nîşan dane, lê divê berovajî bin.

<sup>147</sup> Di destxetê de li ser nivîsandiye “*ye ‘nî pîremerdê salxorde ve ez kar oftade*”, “yanî mirovê pîr ê ku salên wî zêde û ji karketî”.

<sup>148</sup> Di destxetê de li ser nivîsandiye “*mexfûfê bihîstin*” yanî “kurtkirina bihîstin”ê.

<sup>149</sup> Di destxetê de li ser vê bêjeyê (bi xeletî) nîşana farisî daniye.

**6**

**el-Qiṭ'etu fî Beḥri's-Serî' el-Meṭwî el-Mekṣûf**

6/1 Ḥeṣṣiyet û qedrê çû nîne libas

106 Ger ku nebit fezlê kesî der esas

6/2 Muṭfe' ilun muṭfe' ilun fa' ilun

107 Meṭwî û mekṣûf serî' ê binas

- [8a] **Axiret** û *renc*, û **hilak** e *dereng*<sup>150</sup>,  
 108 **Sertî** ye *hingar*, û **giranî** ye *heng*,
- 6/4 *Çapik* û *çalakî sivikbûyin* e,  
 109 *Çeste çî?* **Negme**, **keçel** e hem *çeseng*,
- 6/5 **Hîz** û **muxenneş** tu *bizan poştîpa*,  
 110 **Tekne** û hem **zûlm** û **cefa** ye *peşeng*,
- 6/6 *Evs* e **umîd**, **mêrî**<sup>151</sup> ye hem *ûsitax*,  
 111 **Rengê qule** çî ye? *Gorend* û *goreng*,
- 6/7 **Muşterî** *hormozd* û *berev raveş* e  
 112 *Xospî* û *bircîs* e, **weqî** *pareseng*,
- 6/8 *Pavçek* û *paçek* e **sergîn** *bizan*,  
 113 *Pahek* e **işkince**, **kemend** *paleheng*,
- 6/9 *Penbe* ‘ê *mehlûc* û **gulokê ben** in  
 114 *Bencek* û *bendek*, çî ye **şûnik?** *Kodeng*,
- 6/10 **Fed** yû **hesed** **teb’ê** **perîşan** *xodûk*,  
 115 **Nan** e *çirûk*, **dar** e û **tîr** e *xedeng*<sup>152</sup>,
- 6/11 *Ven veş* û *feş* *hersê çî ne?* **Şubh** û **mişl**,  
 116 **Minnet** e *hen*, ‘**eyb** û **şer** in her du *neng*,

<sup>150</sup> Di destxetê de jimaredana vê risteyê bi temamî şaş e, diviya ku “axiret” û “hilak” kurdî bûna û yên din jî farisî.

<sup>151</sup> Di destxetê de li ser nivîsandiye “şeca ‘el” yanî “mêrxasî”.

<sup>152</sup> Di destxetê de nivîsandiye “ye ‘nî xedeng nev’ê ez derext est kî ez an tîr ve nîz ve zîn ve geyre sazened ve bed in monasebet tîr ra goyend”, “yanî xedeng cureyekî dar e ku pê tîr û tiştên wekî din çê dîkin, lewma ji tîrê re dibêjin”.



- [8b]** *Kaşîkî û endî temennî bizan,*  
 117 **Xewn** e çi? *Goşasb*, û we hem **tûng** e *eng*,
- 6/13 **Bulbul** û **qumrî** yû **Mecûs zendibaf**,  
 118 ‘**Eyb** û **neşîb miñnet** û **quwwet** çi? *Reng*,
- 6/14 **Buxl** û **werîs e kenek** û **gozi kor**,  
 119 **Meşwere kengaş**, û we hem **bask**<sup>153</sup> e *keng*,
- 6/15 ‘**Erdê ku pir ber be** çi ye? *senkolax*,  
 120 **Fitne** ye *aşûb*, û we **qenbûr** e *geng*,
- 6/16 **Mesxere gengel**, çi ye **loğ**? *Ġelteban*,  
 121 *Şend* e **nukul**, **nazik** e hem *şox* û *şeng*,
- 6/17 **Eñmeq** û **pêxwas tu ewan baş bizan**<sup>154</sup>,  
 122 **Qa’ide** û **mişl** û **giranî** ye *yeng*,
- 6/18 **Kort** e *moğak*, û **qedeh** e hem *teğar*,  
 123 **Nêz** û **melûl lewhe** û **bêmisl teng**

7

### el-Qiṭ‘etu fî Behri’r-Recez el-Meṭwî

- 7/1 **Insan niye ê daîma bit tabi’ ê keyf** û **surûr**  
 124 **Herçî ku insan be mudam dê bit ji keyfa nefsê dûr**
- [9a]** **Mufte’ ilun mufte’ ilun mufte’ ilun mufte’ ilun**  
 125 **Behra recez meṭwî bibit xûş xûş dikit cer yû murûr**

<sup>153</sup> Di destxete de nivîsandiye: “*ye ‘ni cenahi her çîzî...*”, “yanî aliyê her tiştî”.

<sup>154</sup> Kerbelayî li vir digel ku li ser “*tu baş bizan*” tîpa “f”yê danîbe jî bêjeya farisî ya miqabilî wê nedaye. Çêdibe mebesta wî ew be ku ev bêje di her du zimanan de yek in.

- 7/3 **Feryad** e *gal* hem **dûr** e hem **mekr** e we hem **wawîk** û **dîk**,  
 126 *Gam ling* e hem **dizgîn** e hem **gund** e, we hem *gorbe pisîk*,
- 7/4 *Gale çewal*, *gan layiq* e, *gave şecî*<sup>c</sup>, *miqraž gaz*,  
 127 *Dend* e **feqîr** û **eħmeq** û **bêturs** û **xûdser**, **dîz** e *dîk*,
- 7/5 **Bêhûş** e *deng*, *xengel zirix*, **hudhud** bizane *kevkêl* e,  
 128 *Kûken* û *kûke kûkûve* hersê çi? **kund** in, **qûm** e *rîk*,
- 7/6 *Tûsen simend* û *rexş* û *esp* û hem *nivend hesp* in <sup>c</sup> *eyan!*,  
 129 *Xol dîn* û **xuwar**, û *xel were* hem **hatin** e, hem **meşk** e *xîk*,
- 7/7 *Elfexten* û *elfaxiten elfîden* û *endûxiten*  
 130 Herçar **berhevdan** e, hem **qaşid** e *olag*, **insan** e *kîk*

## 8

### el-Qiř'etu fî Beħri'r-Remel el-Meczûw el-Meħzûf

- 8/1 Ger dixwazî nête sehya te xeled  
 131 Zerre keslanî meke ender <sup>c</sup> emel
- 8/2 Fa<sup>c</sup> ilatun fa<sup>c</sup> ilatun fa<sup>c</sup> ilun  
 132 Meczûw û meħzûf e ev beħra remel
- [9b] *Faxite qumrî*, yû **hunguv engebîn**,

- 133 *Kaj û lûç û kaç xuwar in, pîs e çîn,*
- 8/4 *Kaxer û kaxe çi? baran, kax qeşr,*
- 134 **Hîrş** e kad, û çem **guneh**, **xatem nigîn**,
- 8/5 *Ceşn û zaç û şadî û zaçe çi? keyf,*
- 135 *Rahivare hediye*, û hem *kîş* e **dîn**,
- 8/6 **Aşikara faş**, û *ravek* çi? **şerab**,
- 136 **Muşterî zaveş** bizan, hem **buğz** e *kîn*,
- 8/7 **‘Edl** û **muhlet hesret** û **te‘ cîl** û **tirs**
- 137 *Zînihar* e, *zîver* e **zînet** yeqîn!
- 8/8 **Lêgerandin** *costen*, û **gufran** *cesad*,
- 138 *Cesten* e **rabûn xelaşbûn** û **revîn**,
- 8/9 **Menzila sulţan** çi? *mişkû barica*,
- 139 *Baregî av* e, we **sarinc** *bargîn*,
- 8/10 *Abidestan abidendan* her du **roj**,
- 140 *Abitelx* e **mey**, û **şûşe** *abigîn*,
- 8/11 **Ehmeq** e *gerdeng* û *gerdengel* bizan,
- 141 *Gerden* e **mêr** û **qirik**, *efkar* **birîn**,
- [10a] *Mîg‘ ewr*, û *kohbele w kohbel* **nezan**,
- 142 **Manqel** e *kûlex*, **mezin** hem *kûhekîn*,
- 8/13 **Qişset** e *endar*, û *latû* **nerdiban**,
- 143 *Xûk* e **xenzîr**, û **liqûtî** *xûşeçîn*,

- 8/14 **Fahîse şelf, sert e tond** û oştolom,  
144 *Bab bav*, e û **şev** çî ye? *Zillê zemîn*,
- 8/15 *Corre baz nêr* û **mêr**, û *cerre kûz*,  
145 **Naz** e *şîve*, **fi' lê qenc feyrûzinîn**,
- 8/16 *Berhemend* û *berhemen* hem *berheme*  
146 **Butperest** in, **çirrik** e hem *çûbegîn*,
- 8/17 *Çûk* e **ya heq**<sup>155</sup>, **bûm** e *çûkek*, *çûl* e **xuwar**,  
147 *Kord* e **mêr**, û **nefsê kamil abitîn**,
- 8/18 *Xomkede meyxane*, û *rişk* e **hesed**,  
148 *Çîr* û *çîre mêr* e<sup>156</sup>, û **baz** e *xeşîn*,
- 8/19 **Seyyidê 'alem Muhammed Muştefa**  
149 *Xosrevê heştê bohoşt nûrê pesîn*,
- 8/20 **Agir** e *teş*, **çav** e *çeş*, *lûlî leîf*,  
150 *Xosrevê zerrîn 'eşa roj* e *hemîn*,
- [10b] *Deşnegî dunya* û **zeman**, *rîş* e **rî**,  
151 *Deşne xencer*, **çirrik** e hem *lûhenîn*,
- 8/22 **Berger** e *labe* û hem **ixlaş** û **xap**,  
152 *Hûx* û *hûxt* e **Quds**, û **şehzade nûyîn**,
- 8/23 *Nerre nêr* û **pîs** û **mewcê av** û **kîr**<sup>157</sup>,

<sup>155</sup> Di destxetê de li ser nivîsandiye “*ye 'nî morgê ba heggû*”, “yanî çûka heq”.

<sup>156</sup> Di destxetê de li binî nivîsandiye “*şeci 'î*” yanî “mêrxas”.

<sup>157</sup> Di destxetê de li ser nivîsandiye “*aletê tenasul*”.

- 153 *Mad mē, û ‘aqlî barîkbîn,*
- 8/24 *Îder û îdûn nuha û a li vir<sup>158</sup>,*
- 154 *Ev zeman û ev se‘et, mal îtigîn,*
- 8/25 *Gonbedê afetpezîr û cansitan*
- 155 *Ṭaqdîs esman, wuhareng înçonîn,*

## 9

### **el-Qiṭ‘etu fî Beḥri’l-Muḍar‘i el-Eḥzeb**

- 9/1 *Ser lewḥe ‘ê ṣeqîṭî kizb û duruḡ û laf e*
- 156 *‘Inwanê bêumîdî xûdbînî û gezaf e*
- 9/2 *Mef‘ ûlun fa‘ilatun mef‘ ûlun fa‘ilatun*
- 157 *Çûn ḥizbê bit muḍar‘i beḥrek zulal û saf e*
- 9/3 *Kostax ṣecf‘, û bostax hem bēdedeb bizane,*

---

<sup>158</sup> Di destxetê de li ser nivîsandiye “*ke be farisî inca gûyend*”.

- 158 *Tekrek xunav*, û **saz** û **şî‘r** e bizan *çegane*,
- [11a] *Tinab xewn*, û *merdad temmûz*, û *ab qedr* e,
- 159 *Pedrûd wida‘ xuwestin*, **mûyê heram** e *bane*,
- 9/5 *Edreng* e **zor** û **zehmet**, *edmen çî?* **Miškê xaliş**,
- 160 *Hembaz şîrîk* û *enbaz*, **dunya** ye *gûlixane*,
- 9/6 *Zendiş selam*, û **perçe jend** e we hem **muhîb** e,
- 161 *Fergûr* û *gûk* e **zefde‘**, **dev** hem *dibênê tane*,
- 9/7 *Hencam* e **tenbel**, û *tah ferd* û **zeng** û **xaliş**,
- 162 **Goya** yeqîn *hemana*, **çekê şerê** ne *cane*,
- 9/8 *Berna cuwan*, û *bernak gafil*, **nezan** e *bernas*,
- 163 **Hêvî teme‘** *teras* e, **çengû meneh** û *çane*,
- 9/9 **Qudret sutûr** û **zehre**, **sağî yû xadim** e hem
- 164 **Rengê reş** û **bexîlî zaver**<sup>159</sup>, **hêlîn** e *lane*,
- 9/10 *Zavoş ‘eçarîd* e, hem ba **muşterî** û *ermozd*,
- 165 *Deyhîm* e **tac**, û hem **xûdrabûnê hesp** e *şane*,
- 9/11 *Aşûb* û *gak* e **fitne**, *badam bi‘îv* û *facam*,
- 166 **Qenc** û **necîb** e *kavos*, **hewzê biçûk** e *fane*,
- 9/12 *Korte kiras*, û *dom dûv*, *bistar sist*, û *des şubh* e,
- 167 *Vîje xusûs* û **xaliş**, **hawun** bizane *han* e,

<sup>159</sup> Di destxetê de jimareyên vê malikê bi tamamî şaş in, ji ber ku heta bêjeya “*xadim*”ê, bê ku farisiya wê bide, bi jimareya 8ê ew rêz kirine û derbasî jimareya 9ê bûye. Lê belê bêjeyên ji “*qudret*”ê heta “*bexîlî*”yê giş hemwateya “*zaver*”ê ne.

[11b] **Be' lif** bizane *balîn*, **doşek** çi ye? *Nihalîn*,  
168 **Bayi'** çi ye? *Firûxtar*, **kêlek** çi ye? *Keran e*

**10**

**el-Qiţ'etu fî Behri'r-Remel el-Meqşûr**

10/1 ıalibê 'izz û se'adet laz(im)e rencûrî bit

169 Da ku şubhê afitabê der cihan meşhûrî bit

10/2 Fa'ilatun fa'ilatun fa'ilatun fa'ilat

170 Xoş dibit carî remel, hîna remel meqşûrî bit

10/3 *Tûde tilm* û hem *girîve*, **cuşse** û **qût** e çi? *Tûş*,

- 171 *Cevse koşk, û helqe'ê zirx û kelîn e her du cûş,*
- 10/4 *Nester û nesteren û nesterden û nesteriven*
- 172 **Gulsipî**, yû neqş û ferman *destikar*, û zirx e pûş,
- 10/5 **Nef** û neşret qudret û qa'ide şin'et mertebe
- 173 Hem **cihê jor** û wezîrî *dest e*, 'abid *xerqepûş*,
- 10/6 *Şeşderî şeşderfena şeşrevzen û şeşderê teng*
- 174 Cumle **dunya**, **eqriba** û **qenc** û **hişk** e hersê xûş,
- 10/7 *Ahramen ahirîmen ahirîme ehremen*
- 175 *Ahiren ehrîme ehren* cumle **şeytan**, **do** ye dûş,
- [12a] *Dûzman û durzeman û dijeman û rişte ta,*
- 176 *Dûdman û dûde* her du **xanedan**, û **sert** e zûş,
- 10/9 *Heftiaba heftieyvvan heftiporgar heftiban*
- 177 *Heftipeyker heftixatûn* cumle **esman**, **hûr** gorûş,
- 10/10 *Heftixezra heftiseqf û hefti tarom heftigah*
- 178 *Heftikuhlî heftigonbed* **asiman**, **neğme** sorûş,
- 10/11 *Heftimecmer heftimendel heftiçerxê abigûn*
- 179 *Heftmoħîţ û heftinîmxane* **keza!**, **nişter** dorûş,
- 10/12 *Heftioxtan heftiban û heftiçeşmê çerx hem*
- 180 *Heftireşan* **seb'** **eyê** **seyare**, û **gazî** xorûş,
- 10/13 *Heftisulţan heftişem'û hefti tişlê canşeker*
- 181 *Heftinuqte heftibanû ew jî ew*, **uskut** xemûş,



- 10/14 *Heftieşl û heftireq'e heftişadirvan heme*  
182 *Heftinet' û heftiferş e dunye, û sol payipûş,*
- 10/15 *Heftievreng heftidaver heft birader cumle çi?*  
183 *Ew benatu'n-ne'ş û debbu'l-ekber e, sergîn e gûş,*
- 10/16 *Heft tenan û heftimerdan heftimerd Eşhabê Kehf,*  
184 *Heftipîr her heftê Qurra', hem lepik çi? destipûş,*
- [12b] *Neğme û meşgûl û fariğ xalî ye perdaxiten*  
185 *Zînet û tertîb tamamî şeyqel e, guh e çi? Gûş,*
- 10/18 *Hişşe û kanûn û qehr û tarî û teng û peyîz*  
186 *Şa'iqe tofan û taqet tîr û rutbe, se'y e kûş,*
- 10/19 *Permer û permûr û permû permûze permûz umîd,*  
187 *Zînet e permûn, û ruhnî pîştêb'e her du rûş,*
- 10/20 *Isperes ispersef û isperz û isfersef heme*  
188 *Isperesp û isperîs meydan û çol e, hifz e gûş,*
- 10/21 *Isperî borîn û me' dûm û xelaşbûn e yeqîn!,*  
189 *Şem'e ispendar, û bêhûş pare û devxwar e lûş,*
- 10/22 *Nîl û nîle hem kebûd û nîlec e rengê heşîn,*  
190 *Paye qedr û dûn û taqet mertebe, hem girye mûş,*
- 10/23 *Zûhedimbûn e govara hem binermîxuwarin e,*  
191 *Hûs umîd û jehrê qatîl, 'eql û ruh û mewt e hûş,*
- 10/24 *Hunguv û ava heyatê 'aqîbet hem te' mkirin*

192 Hem **bihîstin penzêhar** û hem **guwara** cumle *nûş*,

10/25 ‘**Ebd** û **bende** çî? *girevgan*, **palewan**<sup>160</sup> **serbest** e *yel*,

193 Hem **kerî gelle** bizane hem *reme*, **pirsîn** e *yûş*

## 11

### [13a] el-Qiṭ‘etu fî Beḥri’l-Hezec el-Mekfûf el-Meḥzûf

11/1 Ku sê ne rahê qencî tu lez ke bê teweqquf

194 Yekî rahê şerî‘et, ‘ilim ya dî teşşewuf

11/2 Mefa‘îlun fe‘ûlun mefa‘îlun fe‘ûlun

195 Hezec bit hezf û mekfûf çî wezn e bêtekelluf

11/3 **Felîsîl** e *ḥesîbek*, **nizimbûn** e *xûpestî*,

196 *Hesek* çêç çî? **Serrad** in, **reḥetbûn** *tendorostî*,

---

<sup>160</sup> Di destxetê de li binê vê bêjeyê nivîsandiye “şeci” yanî “mêrxas, egîd”.

11/4 *Zekab e **hubr** e ey can!, ‘Ecûl e hem zekare,*  
197 *Bezek **fergûl** e, **nazî** û hem **qencî** çi? *Çostî,**

11/5 *Çi ye **destîne**? **Bazin**, we hem **ke‘nî** çi? *Destseng,*  
198 *Çi ye **gorgîne**? **Kurk** e, çi **kafir**? *Butperistî,***

11/6 *Çi ye **dengê di şûran**? **Çekaçak** û **çekçak**,*  
199 *Çiringîden çi? **Yê gurz**, we hem **sukranî** mestî,*

11/7 *Pevazî **purşewat** e, **kesê bêdil** *xonokcan,*  
200 ***Tijîbûn** e **lemalem**, **tekebbur** *xodperistî,***

11/8 *Şenî‘ û **şer** ‘elala, **qelew** **şelbûn** binase!,*  
201 ***Qirişqal** in **kirişte**, çi ye **şerbik**? *Xodestî,**

[13b] ***Xerabe** çi? **Xûbîran**, bizane **keşf** e **bî nab**,*  
202 *Çi ye **meħmel**? **Kecave**, bizane **rizq** e **rostî**,*

11/10 *Çi ye **pîlmorğ**? **Şamî**, we hem **rîgal** e **keşkûl**,*  
203 *Bizane **tac** e **dîhûl**, û hem **gulaş** e **kos***

**12**

**el-Qiţ‘etu fî Behri’l-Wafir el-Salim el-Muğemmen**

12/1 *Insan ku edeb vê ra nebitin, ew bêneseb e bêşubhe bizan*  
204 *‘Ilim ku ‘emel vê ra nebitin, bêbehre ye ew cahîl e nezan*

12/2 *Mefa‘ iletun mefa‘ iletun mefa‘ iletun mefa‘ iletun*  
205 *Wafir ku selîm carî bibitin, wek beħrê kebîr dê bibite rewan*

12/3 *Tersa ye **Mecûs**, û **xwê** ye **nemek**, **zexm** e çi? **Birîn**, **nadan** e **nezan**,*

- 206 *Zindan e hebis, merṭal e siper, hawin çî? Hevaz, bohoşt e cinan,*
- 12/4 *Azerm e heya, sufle çî? Geda, rim nîze, û hem cevşen çî? Zirix,*
- 207 *Endaze qedeh, bêdîn e gebir, heç e çî? Jeyan mislê wê deman,*
- 12/5 **Kullî** çî? *Melex, pertad e çî? Ğeyb, berxîz ve birev rabe tu here,*
- 208 *Keştî çî? Gemî, dunya ye gîtî, gakûvî ye gûr, rêvçûn e deman,*
- 12/6 *Efğan û enîn zarîn e bira!, Gazîkirin e hem bang û nida,*
- 209 *Ferzende kurik, efrincî letîn, hingam e weqit, rûzgar e zeman,*
- [14a] *Kaşane û gulbe hucre binas!, Pîrahen e çî? Pêşîr û kiras,*
- 210 *Postan e sedî, evreng e serîr, conban e leqandin, nav e miyan,*
- 12/8 *Doşmen çî? Neyar, perrende tayar, ‘er‘er çî? Serwû, kar e çî? Feyar,*
- 211 *Feylek çî? ‘etarid, gund e kede, xercel çî? Kulî, dunya ye cihan,*
- 12/9 *Çeng pençe û saz û xuwar e, we hem pîramen û girdagird e teref,*
- 212 *Çem çel bimeşe, tîre çî? Reş e, ğenc zehmetî ye, cakerd e sukan*

### 13

#### el-Qiṭ‘etu fî Behri’r-Recez el-Muşemmen el-Mureffel

- 13/1 *Hicranê dilber zor û bela ye, lê weslê canan bo dil dewa ye*
- 213 *Cansûz e ‘aşîq pê muftela ye, kilkê ez el wî ev reng kişaye*
- 13/2 *Mustef ilatun mustef ilatun mustef ilatun mustef ilatun*
- 214 *Behra recez çûn bîtin mureffel, wek behrê etles durr bê buha ye*
- 13/3 *Sekn e sitaden, medh e sitayîş, mekr e sitave, hîrs û teme‘ az,*

- 215 **Ehmeq tème‘kar** her du *letenban*, **şubhe secaher**, **sermil teref baz**,
- [14b] **Tezwîr** e *terfend*, *terhende tezyen*, **kêşan terîden**, **lerzîn tepîden**,
- 216 **Sîle tepançe**, **efyûn** e *hepyûn*, **hamî muheyir**, **şebşebk** e *pîvaz*,
- 13/5 *Deyrê sipencî deyrê mukafat* her du ne **dunya** bêşik bizane,
- 217 *Xanîçe kanî*, *daçek guhar* e, *keyhan* e **dunya**, **qirrêj** çi ye? *Xaz*,
- 13/6 *Zaxil ziqûm* e, **xaliş** çi? *Sara*, **mexşûş** û **xaliş** ‘ehd e çi? *Same*,
- 218 *Şahrah* e **cadde**, *katûzî zahid*, **cellad** e *dijxîm*, **bêmisl** e *yektaz*,
- 13/7 **Legleg belarec**, *folfol* çi? **Bîber**, ‘uzr e çi? *Pûzîş*, **taqet** çi ye? *Ťav*,
- 219 *Dûbel wefasiz*, **te‘n** e *kevaje*, **dergûş** e *kihvar*, **nazik** çi ye? *Paz*,
- 13/8 **Xadim semaker nevker** kezalik, **torin nevendûl**, **buhist** e *evdes*,
- [15a] *Nişpîl* e **çengel**, *reşgen hesûd* e, *pervîn şureyya*, **teyran** e *pervaz*,
- 13/9 *Gerd afşîd roj* hem *morğ* e ey cane! *Behram bexûn* çi? Her du<sup>161</sup> **merîx** in,
- 221 ‘Efw e *dereste derse dereşte*, **purbûn** e *dergîş*<sup>162</sup>, **sirr** e *bizan raz!*,
- 13/10 *Mac mang* e çi? **Hîv**, û hem **zuhel keş**, **mîzan terazû**, *mahî* çi ye? **hût**,
- 222 **Fittîl pelîte**, *celd* e **sivikbûn**, **gore** çi? *Gevreb*, **nef** û **mekir saz**,
- 13/11 **Serţan keşef gerg** e, *perv* e **şureyya**, **kanûn** e *xurrem*, **ya şanî** ye *ab*,
- 223 *Padaşt* û *padaş* her du **mukafat**, **devxwar** e *tatûl*, **mehbûb** çi ye? *Taz*,
- 13/12 *Tasa* û *tase gemm* û **melalet**, *tarîn* û *tarî* her du ne **tarî**,
- 224 *Taras muţî‘ bûn*, *barû heşar* e, *badber mura’î*, **muhtacî** ye *ğaz*,

<sup>161</sup> Di destxetê de li ser nivîsandiye “*sitareyê me’lûm*” yanî “stêrka diyar”.

<sup>162</sup> Di destxetê de li ser nivîsandiye “*kesret*” yanî “pîrbûn, zêdebûn”.

- [15b] **Layiq** *sezavar*, **mehbûb** e *ikdiş*, **leymûn**<sup>163</sup> e *gelgel*, *gelvend* e **hedye**,  
 225 *Girzîn û gorzen tacê murese*<sup>c</sup>, **çare** *gorezden*, **muhibb** e *demsaz*,
- 13/14 *Gûgerd* e **kibrît**, **be**<sup>c</sup> **can** e *kehlem*, **simsar** û **abid** her du ne *kohbod*,  
 226 **Qummaşê meqbûl** *diba* û *dibe* hem *perniyan* e, **deng** e *xwe avaz*,
- 13/15 *Cafcaf* e **qehpe**, **purav** e *şadab*, *şadan* e **xoşhal**, *tarom* çi? **Qubbe**,  
 227 **Pursê perîşan** ew jî *xerafat*, *çorger* çi? **Miftî**, **sîle** çi ye *kaz*,

## 14

### el-Qiţ'etu fî Beħri'l-Muteqarib el-Meqşûr

- 14/1 *Bi kibr* û *bi xeyla* û *nexewt aman*  
 228 *Meke zûlmê ser bêdil* û *bêkesan*
- 14/2 *Fe*<sup>c</sup> *ûlun* *fe*<sup>c</sup> *ûlun* *fe*<sup>c</sup> *ûlun* *fe*<sup>c</sup> *ûl*  
 229 *Teqarib zuhûr bû muqeşşer heman*

[16a] *Pejeng* e **kilîd**, û **birîn** e *figar*,

230 *Pejûliş* **perîşan**, û **şeyd** e *şikar*,

<sup>163</sup> Di destxetê de li ser nivîsandiye “*ye’ni nev’i ez limûn*”, “yanî cureyek ji leymûnê”.

- 14/4 *Pejûhiş tecessus*, we hem **sol** e *kefş*,  
231 Bizan **tac** e *deyhîm*, û **beyreq** *direfş*,
- 14/5 We hem *efser* e **tac**, û **bexşiş** *dihîş*,  
232 *Tehemten şeci*ˆ, û **tebî**ˆ et *cehiş*,
- 14/6 *Jerif kûrî*, yû **mehsî** ye *abinûs*,  
233 **Bi şûret xweşik** *sonder* û *senderûs*,
- 14/7 Bizan **qenc** e *nîk*, û **kerr** e *kondigûş*,  
234 **Dewarê mûti**ˆ û **sukût** e *xemûş*,
- 14/8 *Nevende sivikçûn*, û **qaşid** *nevend*,  
235 **Jina fehş** û **pîskar** û *tenbel levend*,
- 14/9 **Bi nermî** yû *ewset birêvçûn* e *pûy*,  
236 **Şedîd** û **bilezçûn** e hem *pûyipûy*,
- 14/10 **Deve w hesp** û **heywanê mestir** *heyûn*,  
237 **Şer** û **fitne şûr**, **nal** e *efgan şeyûn*,
- 14/11 *Keman burcê qews* e, ˆ **etarid** çi? *Tîr*,  
238 *Xûşe sunbul* e, **torin** e hem *nebîr*,
- [16b] Çi ye **zehre**? *Nahîd*, û **keyvan zuhel**,  
239 We *xerçeng* e **serçan**, **beran** e *negel*,
- 14/13 Bizan *xerdil* e **tirsek**, û hem *bereh*  
240 **Humul**, **hucra** û **zeng** e her du *kereh*,
- 14/14 *Dej* e **dunye** û **qel**ˆ e, **meğmûm** *dejem*,

- 241 *Pizişk e tebîb, we ‘ewr e tejem,*
- 14/15 *Şebahing e bulbul, şebistan herem,*  
242 *Nesîrem mudamţarî ye, gem gerem,*
- 14/16 *Tebîr û tebîre dohol tebl û kûs*  
243 **Def** in ew, **hewa û hewes** çi ye? *Hûs,*
- 14/17 **Xeberdanê bêhûde** *ţamat û laf*  
244 *We hem qaf û zal û dirûg û gezaf,*
- 14/18 *Seraperde çadir, seraçe qefes,*  
245 *Serahing e ferfûl, û manend e des,*
- 14/19 **Rimê kin** çi? *Jobîn û balûk e zûx,*  
246 **Ġem** e *dûd, û tîrê hewa ’î* çi? *Dûx,*
- 14/20 **Pere hemres,** û **huzn** hem *sevkovar,*  
247 **Cewahir** çi? *Xûşab, û ‘ewr e govar,*
- [17a] *Çegame qeşîde, çegame wusan,*  
248 *Pesavend qafiye, gûpan e şivan,*
- 14/22 **Te‘eyyûn** *gomaştên, we emr e gomar,*  
249 *Temiş mekr û hîle, mehebbet şomar,*
- 14/23 *Sokaliş te’emmul, şigerf e leţîf,*  
250 *Şikifte te‘eccub, qirişqal e tîf,*
- 14/24 *Sipencî* çi? **Kadîn,** û **kettan** *sipend,*  
251 **Sebeb ba‘îş** û **madde** *hersê şevend,*



14/25 **Qiyamet** *setenxîz* û hem *restexîz*,  
252 **Murad** û **qedeh** ni' met û **qurt** e *rîz*,

14/26 Bizan *rûde rêvî*, **teweqqu'** *teraş*,  
253 **Ġulam** e *perestar*, **perîşan** *peraş*,

14/27 Çi ye *mojde*? **Mizgînî** ye hem *nevîd*,  
254 *Perarîn* e **qenc**, û *evarîn* **pelîd**,

14/28 Bizan **muxtelîtkirn** e *amîxiten*,  
255 **Kişandin** çi? *Berhexten* *ahîxiten*,

14/29 *Behamîn* **buhar**, û **henzel** e *pehî*,  
256 **Zirav** *zehre*, hem **barekallah** *xehî*,

[17b] Bizan **bavê Adem** *cehanê kehîn*,  
257 We hem **masiwallah** *cehanê mehîn*,

14/31 *Sişebr* e **qewî**, **bêheya** ye *sotork*,  
258 **Ne'ame** *şotor morg'*, û **mewc** e *şotork*,

14/32 *Nezim* *mağ'ewr* in, **qebîh** e *hezek*,  
259 *Ûzorg* e **mezin**, **pasiban** e *yezek*,

14/33 *Veriz* **da'imî çandin** e hem *çesem*,  
260 *Vezîden*<sup>164</sup> çi? **Rabûn** e, **eyza** ye *hem*,

14/34 **Ġem** û **hifz** e *tîmar*, û *tîma* ye **çûl**,

<sup>164</sup> Di destxetê de li binî nivîsandiye “*meselen vezîdenî badê şîmalî*”, yanî “bo nimûne rabûna bayê bakurê”.

- 261 *Tevare* çi ye? **Holik**, û **cisr** e *pûl*,
- 14/35 **Reh** e *bîx*, **bilindkîrn** e *efraxiten*,
- 262 **Pur** *enbûh*, û **avêtin** *endaxiten*,
- 14/36 *Godaxten* **helandin**, û **fa' il**<sup>165</sup> *godaz*,
- 263 **Ziman** e *zofû*, **weşş** e *xûk* û *goraz*,
- 14/37 **Xerac** û **sukût** e *bizan sav* û *baj*,
- 264 **Xew** e *sat*, û **bêhûde** *gotin* çi? *Jaj*,
- 14/38 **Gem** e *mûj*, û **deyndan** e *endûxiten*,
- 265 *Firûg şu' le*, **rohnkîrn** e *efrûxiten*,
- [18a] *Nevaxten* **teğennî** û **te' zîmkîrn**
- 266 *Nevaziş* **kezalike**, *morden* **mirin**,
- 14/40 **Çem**<sup>166</sup> û **saz** û **ewlad**<sup>167</sup> û hem **berx** e *rûd*,
- 267 *Sorûd* e **gina**, û **selam** e *dirûd*,
- 14/41 Çi ye **şûr**? *Elmas*<sup>168</sup>, û *wuhareng* e *tîg*,
- 268 *Zerr* e **zêr**, û **yazuğ** *fisûs* û *dirîg*,
- 14/42 *Bizan paris a* **zahid** e, *enderûn*
- 269 Çi? **Hundur**, *wuhareng* e **derve** *birûn*,

<sup>165</sup> Di destxetê de di binê vê bêjeyê de nivîsandiye “*ye'nî ismê fa'il ez godaxten godaz miayed*”, “yanî ji lêkera ‘godaxten’ê lêkernav ‘godaz’ dibe”.

<sup>166</sup> Di destxetê de li binî nivîsandiye “*nehir*” yanî çem.

<sup>167</sup> Di destxetê de li binî nivîsandiye “*ye'nî awazê ji kûr*”

<sup>168</sup> Di destxetê de li binî nivîsandiye “*kînaye ez şîmşîr û qelemteraşî û geyre başed*”, yanî kînaye ye ji şûr û pênûstraş û wekî din.

- 14/43 *Petik hûrsê heddad e, pasix cewab,*  
270 *Nejend nizm û gemgîn, û rûpûş niqab,*
- 14/44 *Kejağend e zirx, û nejad e nesil,*  
271 *Çetir çadir e, zîrek e ba' eqil,*
- 14/45 *Şerr e rezm û porxaş, û def gerrê nay,*  
272 *Neberd e şerr, û qeşd û meyl e geray,*
- 14/46 *Guman û hesabkîrn e engaşiten,*  
273 *Tijîkîrn e enbar û enbaşiten,*
- 14/47 *Mudamşad e xorsend û hem şakîr e,*  
274 *We hem 'ebd û kole bizan çakîr e,*
- [18b] *Mezintîr binase mohîne w mohîn,*  
275 *Mezin muntexeb hem bohîne w bohîn,*
- 14/49 *Biyok qencî û xoşdilî çî? Bihî,*  
276 *Biçûkî kihî, û mezintîr mihî,*
- 14/50 *Şerr e erdeb, û hedye ye ermoğan,*  
277 *Ji nişkê ve nagah û hem nagihan,*
- 14/51 *Tebend e hîyel, çîmen<sup>169</sup> e hem kezim,*  
278 *Cihê 'işret û mêhivanî bezim,*
- 14/52 *Diz û bêheya û fizûl mêr e şûx,*

---

<sup>169</sup> Di destxetê de li binî nivîsandiye, “*kurdiya wê çîmenê ku li ber devê çemê ye*”.

279 **Perîşan lef**<sup>170</sup> e *jûl*, û **pîvaz** e *sûx*,

14/53 *Tol* û *bîvezan jinbî*, û *dîdeban*

280 **Qelawuz**, **ji** ye *zih*, **kevan** e *keman*,

14/54 **Te'essuf temennî** û **yazuğ** çi? *Kaş*,

281 **Dujîndan** e *doşnam*, û **'arif** *belaş*,

14/55 **Temennî rev** û **sîle** û **serw** e *kac*,

282 **Qumaş** û **misil şubhe sa** û **xerac**,

14/56 **Firr** û **tirs** û **aram** û **meyl** û **şebir**

283 We hem **qeşd** e *perva*, **piling** e *bebir*,

[19a] **Firr** û **nûr** e *pervaz*, û *gûpal* e **gurz**,

284 **Bilindiyê insan** û **qamet** çi? *Burz*,

14/58 *Sotorden* **hek**, û hem **muftî** **bûn** e *ram*,

285 Çi ye *isgirek*? **Qirbik**, û **reng** e *fam*,

14/59 Hemî **çolê pur şeyd** û **suba'** e<sup>171</sup> *ded*,

286 We hem **ğeyrê subba'** e *dam*, **mêr** e *red*,

14/60 *Şinav* û *şinaver şitar* û *şinah*

287 Hemî **şobeyî**, **zayî'** e hem *tebah*,

14/15\* *Şebahing* e **bulbul**, *şebistan* **herem**,

242 *Nesîrem* **mudamtarî** ye, **gem** *gerem*,

<sup>170</sup> Di destxetê de li binî nivîsandiye “*badan*”.

<sup>171</sup> Di destxetê de li binê wê nivîsandiye “*heywanê muferes*”, yanî “*heywanê kovî yê dirinde*”.

\* Kerbelayî piştî vê malika 287an, malika 242. a vê beşê ji nû ve nivîsandiye. Lê belê wek hejmar li ser beşê zêde nekiriye. Yanî diviya digel wê bûbûya 66 malik, lê wî ev nejmartiye.

14/61 **Perrê nav qelem ney**<sup>172</sup> yû **efğan** e *nal*,

288 **Xerabûn** ‘**edembûn** e hem *payimal*,

14/62 *Gorîz* e **rev**, û **çare** ye hem *gozîr*,

289 **Şedayê def** û **gerrê nay** e *nefir*,

14/63 **Biçûk xord**, û **rûn revgen**, û **qenc** e *pak*,

290 Çi ye *goresne*? **Birçî**, **qelşîn** e *çak*,

14/64 *Golû gewrî*, û **hûçik** e *asitîn*,

291 *Qeba paç*, û **xweygotin** e *abitîn*,

[19b] *Per* û *pay* e **taqet**, **derew terrehat**,

292 *Tekapûy tereddud*<sup>173</sup>, *riha* ye **necat**

### **Meşlebu’l-Murekkebat**

15/1 *Biyaîd ta revîm ba hem be şehrâ*

293 *Werin em biçne çolê giş bi hev ra*

15/2 *Be yadi yekdigêr meynûşî başîm*

294 *Zi rûyê yekdigêr medhûşî başîm*

15/3 *Bi xiyala hevdunê keyfxuweş bibin em*

295 *Ji rûyê hevdunê serxuweş bibin em*

15/4 *Ki ba hem şohbetê imrûzî darîm*

<sup>172</sup> Di destxetê de li binê vê bêjeyê nivîsandiye “*neyşeker ve geyr*” yanî “şewender û wekî din”.

<sup>173</sup> Li binê vê bêjeyê nivîsandiye “*tereddud der amed şoden*” yanî “dudiliya di hatin-çûyinê de”.

- 296 *Ġemê ferda be ferda mîsiparîm*
- 15/5 Ku pev re şahiya îro bidêrin
- 297 *Ġema şubhê bi şubhê em sipêrin*
- 15/6 *Ki ferda her kî ra abişxûrê wey*
- 298 *Biyendazed be cayê dîgerê wey*
- 15/7 Ku şubhê herkesî yû qismetê wî
- 299 Dibe davêje cîkî dîtirê wî
- [20a]** Ecel çun der resed xahed be yekbar
- 300 Coda dared zi hem yarê vefadar
- 15/9 Mirin ger bê muheqqeq ew bi yekcar
- 301 Ji hev başqe dike dostê emekdar
- 15/10 *Çu تنها ten be zîrê xaki başîm*
- 302 *Zi hem oftade û dilçaki başîm*
- 15/11 Ku تنها em di bin axê bimînin
- 303 Jihevket yû dilê şeq dê bimînin
- 15/12 *Hezar heşret xûrî ber yar û bendet*<sup>174</sup>
- 304 *Peşîmanî nebaşed sûdimendet*
- 15/13 Hezar heşret dixuwî ser dost û hem yar
- 305 Dibî poşman û nabe fa'îdedar
- 15/14 Ilahî! **Bedriyê** bêtab û taqet

<sup>174</sup> Di destxetê de li ser vê bêjeyê nivîsandiye “yanî peywend û mu‘elleqat”, “yanî pêwendî û têkilî”.

- 306 Nekî bê yarê der dunya û axret
- 15/15 Enîs in yar der dunya bi hev ra
- 307 Şefî' in dostê der 'uqba ji hev ra
- 15/16 Heval in rehberê dunya û 'uqba
- 308 Şefî' in serwerê dunya û 'uqba
- [20b]** Li dunya û li 'uqba cuz hevalî
- 309 Nehin miftahê ebwabê kemalî
- 15/18 Refîqa! coz tu kes peyvendê men nîst
- 310 Şefî' a! coz tu kes derbendê men nîst
- 15/19 Xudaya! Kerbelayî dilkebîb e
- 311 Ji vê yarê nekî wî bêneşîbe
- 15/20 Ela ey şahibanê fezl û himet
- 312 Re'îsê mesned û şedrê fesaşet
- 15/21 Bi hêvî min rica ye şed hezar car
- 313 Ku nekne herfêgîrî ser minê jar
- 15/22 Bi şefqet çav bidin Mirşadê Eţfal
- 314 Qebûl kin bo tîfalan ba heme hal
- 15/23 Nebêjin nadurust e naseza ye
- 315 Ji bo eţfalê re anceq rewa ye
- 15/24 Ne bo ehlê hunerkanê me' arîf
- 316 Heqîqetdan û enwa'ê teşarîf

15/25 Me anî qeṭî<sup>ç</sup> kir Mirşadê Tîfla  
317 Di salê meş<sup>ç</sup>emet iqbalê “Şeğla”

[21a] Ilahî! Mustemendê Kerbelayî  
318 Riha kî ez gem û renc û belayî

15/27 We be<sup>ç</sup> du şed selamê pak ê Yezdan  
319 Li ser şahê<sup>ç</sup> ereb mewlayê kurdan

15/28 Li ser al û şehab û zewcê eşref  
320 Heta dewrê zemîn bit qa<sup>ç</sup> i şef şef

el-Ĥemdu lî'l-lahî rebbîl-'alemîn, we şella'l-lahu we selleme 'ela seyyîdî'l-ewwelîne we'l-axîrîn, we 'ela alîhî we şehbîhî't-ṭeyyîbîne't-ṭahîrîn, îla ebedî'l-abîdîn, we'd-dehrî'd-dahîrîne we be<sup>ç</sup>: Qed etmemtu hazîhî'r-rîsalete'l-musemmate bî Mirşadî'l-Eṭfalî fî senetî şeğla ew eşgel fî şehîrî Şe'bane'l-'ezîmî yewme'l-Cumu'etî qubeyle'l-'eşîrî fî Medresetî Aqtepe şanehe'l-lahu 'enîl-afatî we'l-belîyyat. We ene'l-feqîru'l-ḥeqîr, el-mu'terîfu bî'l-'eczî we't-teqşîr<sup>175</sup> Muḥammed Kerbelai Bedruddîn el-muznib îbnî Şeyx 'Ebdîrrehman îbnî Şeyx Ḥesen en-Nûranî, qeddese'l-lahu te'ala esrarehuma'l-'elîyyete, amîn. We efaḍe 'eleyna kema efaḍe 'ele'l-'alemî enwarehuma, amîn. <sup>176</sup>

Neviştêm men nedanem kî bexaned

Kî axer men bemîrem û bemaned

Her an<sup>ç</sup> aqîl în xet re bexaned

<sup>175</sup> Di destxetê de bêjeyên ji vê şûnde nedihat xwendin. Me dûmayîka wê, li gorî nusxeya Mela Zeynelabidîn temam kir.

<sup>176</sup> Wergera wê ya kurdî bi vî awayî ye “Hemd ji Xwedayê xwediyê alemê re be. Selat û silavên Xwedê li ser mezinê pêşyan û paşyan be û li ser al û hevalên wî yên qenc û paqij bin, heta dawiya dawî û dema herî dawîn. Piştî vê yekê, me ev nivîsar sala ‘Şeğla’, di meha Şe‘bana pîroz de, roja îne, danê êvarê, di medreseya Aqtepeyê de kuta kir û bi Mîrsadu'l-Eṭfal bi nav kir. Xwedê ji afatan û bobelatan biparêze. Ê ezê gedayê jar ê naskiroxê bi kêmbirîtiyê, bi eyb û ar Mihemed Kerbelayî Bedruddînê kurê Şêx Ebdurrehmanê kurê Şêx Hesênê Nûranî. Xweda sîrrê wan ê bilind çak bidêre, amîn. Ê Xwedê nûr û xweşiya xwe birêje ser me, çawa ku dirêje ser alemê, amîn!” Me ev werger ji xebata Zeynelabidîn Zinar girt. Bnr. Zinar, “Mîrsadu'l-Eṭfal (Amadegaha Zarokan)” r. 54.



## ENCAM

Ferhengnivîsiya menzûm di edebiyatên zimanên rojhilatî yên erebî, farisî, tirkî, kurdî, peştûyî, hîndûyî, keşmîrî û wd. de tradisyoneke gelek kevn û berbelav e. Ferhengên menzûm hem cureyek ji edebiyata klasîk in, hem jî cureyek ji edebiyata zarokan tên hesabandin.

Ji sedsala XII. vir de em rastî xebatên wiha dibin. Ferhengên menzûm ên pêşî bi erebî bûn. Piştê ji ber ku farisî jî wek zimanê edebiyatê di medreseyan de hate hînkirin, bi vî zimanî jî berhemên wiha hatin nivîsîn. Yekem ji mînakên ferhengên menzûm ên duzimanî ku tê zanîn *Dustûru'l-Luğaya Edîb Natanazzî* (m. 1106) ye ku bi erebî-farisî hatiye amadekirin. Her wiha di nivê sedsala XII. de nivîskarê Îranî, Reşiduddîn Watwatî (m. 1182) jî xebateke bi vî rengî amade kiriye. Di edebiyata Islamî de *Nisâbu's-Sibyân* a Ebû Nesr Ferâhanî (m. 618/1221) yek ji girîngtirîn ferhengên menzûm ên erebî-farisî ye.

---

<sup>177</sup> Ev du malik jî li her du aliyên rûpela dawiyê bi awayekî paldayî hatine nivîsîn. Wergera wê ya kurdî bi vî awayî ye:

Min nivîsî lê nizanîm dê kî bixwîne  
Ku talî ez ê bimrim ew dê bimîne  
Herçî xwedî aqilê ku vê xezikê bixwîne  
Bizane ku ev dinya ji kesekî re namîne

Di nivê sedsala XIII. de bi navê *Zuhretu'l-Edeb* ferhenga menzûm a erebî-farisî ya Şükrullah, ev adet li Anatoliyê dest pê kiriye. Di sala 1392yan de Îbnu Melek bi navê “*Luğat-i Ferišteoğlu*” ferhengeke menzûm a erebî-tirkî amade kiriye.

Yekem ferhenga menzûm a farisî-tirkî ya bi navê *Tuhfe-i Husamî* di sala 1400an de ji aliyê Husam bîn Hesen hatiye nivîsîn. Her wiha ferhenga farisî-tirkî ya bi navê *Tuhfe-i Şahidî* an jî *Luğat-i Şahidî* ji aliyê Şahidî Îbrahîm Dede (m. 1550) ve hatiye nivîsîn ku pir binavûdeng e. Di vî warî de berhema ku herî tê naskirin *Tuhfe-i Vehbî* ya Sünbülzade Vehbî (m. 1809-10) ye. Ev berhem di navbera salên 1798-1909an de 58 caran hatiye çapkirin.

Piştî vêkolîna me ya li ser *Mîrsadu'l-Etfalê* em gihîştin van encaman:

1. Di edebiyata kurdî ya klasîk de tradîsyona ferhengnivîsiya manzum ji aliyê Ehmedê Xanî, di sala 1683yan de bi *Nûbehara Biçûkan* dest pê kiriye. *Gulzar* ji aliyê Îsmailê Bazîdî (1655-1710) hatiye nivîsîn ku bi kurdî-farisî-erebî, ferhengeke sêzimanî ye. *Luxetnameyî Ehmedî* ya Şêx Marûf Nodeyî, kurdî-erebî ye û di sala 1790an de hatiye nivîsîn û *Mîrsadu'l-Etfal* a kurdî-farisî ji aliyê Şêx Mihemed Kerbelayî, di sala 1912an de hatiye nivîsîn. Ev berhem di edebiyata kurdî ya klasîk de tradîsyoneke xurt nîşanî me didin.

2. Diyar dibe ku ji sedsala XVII. vir de, di her sedsalê de ferhengeke menzûm a bi kurdî hatiye nivîsîn. Di vî warî de *Mîrsadu'l-Etfal* berhema dawîn e. Yanî xelesa dawiyê ya ferhengnivîsiya menzûm a kurdî ye.

3. *Nûbehar*, *Gulzar*, *Ehmedî* di medreseyên kurdan de wek pirtûkên dersê hatine xwendin. Lê belê ji ber şert û mercên taybetî yên heyama Kerbelayî, ev ferhenga wî ya hêja di medreseyên kurdî de belav nebûye. Tenê li medresa Aqtepeyê û li derûdora wê hatiye xwendin.

4. Şêx Mihemed Kerbelayî di berhemên xwe de mexlesên wekî Kerbelayî, Kerbûbelayî û Bedrî bi kar anîne. Mexlesa Bedrî di dîwana xwe de bi kar ne aniye, tenê di *Mîrsadu'l-Etfalê* de hew carekê bi kar aniye.

5. Kerbelayî di amadekirina *Mîrsadu'l-Etfalê* de gelek di bin tesîra *Nûbehara Biçûkan* de maye. Wî bi giranî rêbaza Xanî şopandiye ku jixwe ev yek di beşa destpêkê de bi awayekî eşkere diyar kiriye. Ji hin rave û têbiniyên wî yên li ser nusxeya daner jî tê fehmkirin ku di hîlbijartina bêjeyan de, wî bêtir ji *Burhanê Qati* sûd wergirtiye.

6. *Mîrsadu'l-Etfal* di edebiyata zarokan a kurdî de berhemeke bêhempa ye. Li gorî tesbîtên me, di *Mîrsadu'l-Etfalê* de rêbazeke pedagojîk a xurt hatiye bikaranîn. Di hîlbijartina bêjeyan de pergaleke birêkûpêk heye. Di beşa dawî de wî malîkek bi farisî, malîkek bi kurdî, an risteyek bi farisî, risteyek bi kurdî ku wergerên hevokên farisî ne bi kar anîne. Yanî piştî

fêrkirina bêjeyên farisî, awayên bikaranîna wan ên di nav hevokan de jî nîşan dane. Ev rêbaz îro jî di gelek pirtûkên rêzimanî de tê bikaranîn.

7. *Mîrsadu'l-Etfal* ji beşa pêşî heta beşa dawiyê, bi malikeke wecîz a bi pend û şîretê dest pê dike. Bi vî awayî Kerbelayî xwestiya ku bi van malikên wecîz, mifa û girîngiya xwendin û zanistê, xerabiya nezaniyê, şertên serfiraziyê, exlaqê baş, jiyanêke biwate nîşanî zarokan bide û bi vî awayî berê wan bide başî û qencyê.

8. Ji bo hînkirina erûzê, *Mîrsadu'l-Etfal* gelek guncan e. Lewra wî di serê her beşê de hem cureyê behran, hem jî tefîleyên wan bi awayê risteyekê nivîsandine, da ku zarok bi hêsanî hîn bibin.

9. Bêje û qertafên ne ji ferhengê ne wek “çi, çi ne, çi ye, dibên, ey can, ey bira, her, her du, her sê, binas, bizan, tu bizan, wusan, ev jî, ew jî, yê, ya, ye, e” bi piranî kurdî ne. Lê belê raveyên di kêlek û binê bêjeyan de bi piranî farisî ne. Yanî herçend ferhengeke kurdî-farisî be jî, ji ber vî aliyê xwe kesên farisîziman jî dikarin sûd jê wergirin.

10. Di ferhengê de ji bo pêwîstiyên zarokan gelek têgînên bingehî yên pratîk hene. Mînak, ji aliyê têgînên malbatî, mirovatî, endamên laşê mirov, riwek, ajel, cilûberg û erdnîgariyê ve gelek dewlemend e.

11. Ji aliyê termînolojîya giştî ve, *Mîrsadu'l-Etfal* gencîneyeke têr û tijî ye. Hin awayên bikaranîna bêjeyên kurdî yên ku zêde nayên zanîn, di ferhengê de hatine rêzkirin. Mînaka “tîrê hewayî” gelek balkêş e ku bi tirkî “havaî fîşek” tê gotin. Bêjeya “jimar” di wateya “parçe”ya farisî de, “tung” di wateya “muhir” de, “bîra çenê” di wateya “çahê zenex” de, “ê bêav” di wateya “teşne” de, “puravxwarî” di wateya “sîrab” de, “xewlêbuhurî” di wateya “bîxab” de hatine bikaranîn. Her wiha bêjeyên “xudser, xudrabûna hesp, mudamşad, mudamtarî, ava heyatê, penzêhar, efrincî, xweyigotin” û wd. jî di heman hêjahiyê de ne. Ev hemû, ji bo zimanzan, edebiyatzan û lêkolîneran çavkanî û referansên girîng in.

12. Ferheng ji aliyê rêzimanê ve, gelek bi rêkûpêk e. Bêjeyên hemwate, nêzwate û dijwate, her wiha bêjeyên hevdeng û nêzdeng, lêkerên bingehî, raweya fermanî û bi dehan raderên bingehî û cureyên wan hatine bikaranîn.

## ÇAVKANÎ

Adak, Abdurrahman: “Malbata Zebariyan û Basreta Paytexta Neqşebendiyan”, *Kovara Nûbihar*, j.107, 2009.

Aqtepî, Şêx Ebdurehman: *Rewdi'n-Neîm*, amd. Zeynelabîdîn Amedî, Diyarbekir, 1984.

.....: *Dîwana Ruhî*, amd. Zeynelabîdîn Amedî, Diyarbekir, 1982.

Akyüz, Yahya: *Türk Eğitim Tarihi*, Kültür Koleji Yayınları, İstanbul, 1994.

Amedî, Zeynelabîdîn: *Mîrsadu'l-Etfal weyaxud Şahrahê Kûdekan*, Diyarbekir, 1980.

Aydın, Tahirhan: “Çoklu Zeka Kuramı ve Yabancılara Arapça Öğretimi”, (Teza lîsansa bilind a neçapkirî), Gazi Ü, Eğitim Bilimleri Enstitüsü, Ankara, 2005.

Barnas, Rojen: “Termên Edebî” *Kovara Nûdem*, j.1, Stockholm, 1992.

*Bernameya Ziman û Wêje*, amd. Kadri Yıldırım, Abdurrahman Adak, 28.11.2010, saet: 22.30, TRT 6.

Bîmar, Ebdurrezaq: “Serincek le Ferhengokî Honrawey Ehmedî”, *Govarî Korî Zanyarî Îraq Destey Kurd*, j.18-19, Bexda, 1988.

